

XWENDINGEHA NAVÎN  
PIRTÛKA POLA 5.

Kurdî

# KURMANCÎ

NIVÎSKAR

Gülbeddin GÜLMEZ

Hasan GÜMÜŞ

Ahmet SEYARÎ

Ramazan YAMAN

Lokman KALAN

Abdurrahman ÖZHAN

Abdurrahman KARDAŞ



DEVLET KİTAPLARI

....., 2021

MİLLÎ EĞİTİM BAKANLIĞI YAYINLARI .....: 6574  
YARDIMCI VE KAYNAK KİTAPLAR DİZİSİ.....: 921

Her hakkı saklıdır ve Millî Eğitim Bakanlığına aittir. Kitabın metin, soru ve şekilleri kısmen de olsa hiçbir surette alınıp yayımlanamaz.

**Görsel Tasarım Uzmanı**  
**İlyas DEMİRHAN**

Her hakkı saklıdır ve Millî Eğitim Bakanlığına aittir.  
Kitabın metni, soru ve şekilleri kısmen de olsa hiçbir surette alınıp yayımlanamaz.

ISBN 978-975-11-4477-5

Millî Eğitim Bakanlığı, Talim ve Terbiye Kurulu Başkanlığının 06.04.2022 gün ve 47338523 sayılı yazısı ile eğitim aracı olarak kabul edilmiştir.



## İSTİKLÂL MARŞI

Korkma, sönmez bu şafaklarda yüzen al sancak;  
Sönmeden yurdumun üstünde tüten en son ocak.  
O benim milletimin yıldızıdır, parlayacak;  
O benimdir, o benim milletimindir ancak.

Çatma, kurban olayım, çehreni ey nazlı hilâl!  
Kahraman ırkıma bir gül! Ne bu şiddet, bu celâl?  
Sana olmaz dökülen kanlarımız sonra helâl.  
Hakkıdır Hakk'a tapan milletimin istiklâl.

Ben ezelden beridir hür yaşadım, hür yaşarım.  
Hangi çılgın bana zincir vuracakmış? Şaşarım!  
Kükremiş sel gibiyim, bendimi çiğner, aşarım.  
Yırtarım dağları, enginlere sığmam, taşarım.

Garbın âfâkını sarmışsa çelik zırhlı duvar,  
Benim iman dolu göğsüm gibi serhaddim var.  
Ulusun, korkma! Nasıl böyle bir imanı boğar,  
Medeniyet dediğin tek dişi kalmış canavar?

Arkadaş, yurduma alçakları uğratma sakın;  
Siper et gövdeni, dursun bu hayâsızca akın.  
Doğacaktır sana va'dettiği günler Hakk'ın;  
Kim bilir, belki yarın, belki yarından da yakın.

Bastığın yerleri toprak diyerek geçme, tanı:  
Düşün altındaki binlerce kefensiz yatanı.  
Sen şehit oğlusun, incitme, yazıktır, atanı:  
Verme, dünyaları alsan da bu cennet vatanı.

Kim bu cennet vatanın uğruna olmaz ki feda?  
Şüheda fışkıracak toprağı sıksan, şüheda!  
Cânı, cânânı, bütün varımı alsın da Huda,  
Etmesin tek vatanımdan beni dünyada cüda.

Ruhumun senden İlahî, şudur ancak emeli:  
Değmesin mabedimin göğsüne nâmahrem eli.  
Bu ezanlar -ki şehadetleri dinin temeli-  
Ebedî yurdumun üstünde benim inlemeli.

O zaman vecd ile bin secde eder -varsa- taşım,  
Her cerîhamdan İlahî, boşanıp kanlı yaşım,  
Fışkırır ruh-ı mücerret gibi yerden na'sım;  
O zaman yükselerek arşa değer belki başım.

Dalgalar sen de şafaklar gibi ey şanlı hilâl!  
Olsun artık dökülen kanlarımın hepsi helâl.  
Ebediyyen sana yok, ırkıma yok izmihlâl;  
Hakkıdır hür yaşamış bayrağımın hürriyyet;  
Hakkıdır Hakk'a tapan milletimin istiklâl!

**Mehmet Âkif Ersoy**

## GENÇLİĞE HİTABE


Ey Türk gençliği! Birinci vazifen, Türk istiklâlini, Türk Cumhuriyetini, ilelebet muhafaza ve müdafaa etmektir.

Mevcudiyetinin ve istikbalinin yegâne temeli budur. Bu temel, senin en kıymetli hazinendir. İstikbalde dahi, seni bu hazineden mahrum etmek isteyecek dâhilî ve hâricî bedhahların olacaktır. Bir gün, istiklâl ve cumhuriyeti müdafaa mecburiyetine düşersen, vazifeye atılmak için, içinde bulunacağın vaziyetin imkân ve şeraitini düşünmeyeceksin! Bu imkân ve şerait, çok namüsaît bir mahiyette tezahür edebilir. İstiklâl ve cumhuriyetine kastedecek düşmanlar, bütün dünyada emsali görülmemiş bir galibiyetin mümessili olabilirler. Cebren ve hile ile aziz vatanın bütün kaleleri zapt edilmiş, bütün tersanelerine girilmiş, bütün orduları dağıtılmış ve memleketin her köşesi bilfiil işgal edilmiş olabilir. Bütün bu şeraitten daha elîm ve daha vahim olmak üzere, memleketin dâhilinde iktidara sahip olanlar gaflet ve dalâlet ve hattâ hıyanet içinde bulunabilirler. Hattâ bu iktidar sahipleri şahsî menfaatlerini, müstevlîlerin siyasî emelleriyle tevhit edebilirler. Millet, fakr u zaruret içinde harap ve bîtap düşmüş olabilir.

Ey Türk istikbalinin evlâdı! İşte, bu ahval ve şerait içinde dahi vazifen, Türk istiklâl ve cumhuriyetini kurtarmaktır. Muhtaç olduğun kudret, damarlarındaki asil kanda mevcuttur.

Mustafa Kemal Atatürk





MUSTAFA KEMAL ATATÜRK




# NAV E R O K

UNÎTEYA 1.  
EM ZIMANÊ  
XWE NAS BIKIN  
**09-26**



UNÎTEYA 2.  
EZ Û  
MALBATA XWE  
**27-50**



UNÎTEYA 3.  
XWENDINGEH  
Û JÎNGEHA MIN  
**51-70**



UNÎTEYA 4.  
LAŞ Û  
TENDURISTÎ  
**71-88**



# N A V E R O K


UNÎTEYA 5.  
XUREK Û  
VEXUREKÊN ME  
89-108



UNÎTEYA 6.  
SALNAME Û  
DEMSAL  
109-128



UNÎTEYA 7.  
GEŞTÛGER Û  
HATÛÇÛ  
129-144



UNÎTEYA 8.  
LÎSTIK Û ÇÎROK  
145-160



UNÎTEYA 9.  
ÇALAKÎYÊN  
SERBEST  
161-176



# LÎSTEYA ÎKONAN

Amadehîya  
Unîteyê




Nêçîra  
Peyvan



Çîrok



Hevpeyvîn



Zargotin



Nirxandin



Xaçepirs



Helbest







Dinleme



Konuşma



Okuma



Yazma

# UNÎTEYA 1.

## EM ZIMANÊ XWE NAS BIKIN



### AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Dema hûn li van wêneyên jorîn dinêrin çi tê bîra we?
- 2) Hûn dikarin ji serî heta dawî alfabeyê bixwînin?
- 3) Hûn dikarin heta çendan bijimêrin?

## BEŞA 1. ALFABEYA ME

## Tîpên Girdek

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N  
O P Q R S Ş T U û V W X Y Z

## Tîpên Hûrdek

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n  
o p q r s ş t u û v w x y z

## Tîpên Dengdêr

a e ê i î o u û

## Tîpên Bêdeng

b c ç d f g h j k l m n p  
q r s ş t u v w x y z

## Pevdeng

XW xw

## Çalakîya 1.

Hûn jî li pey mamoste tîpên jorîn  
dubare bikin û bixwînin.

## Çalakîya 2.

Tîpên alfabeyê li valahîyên jêrîn bi rêzê binivîsin.

A.....Z

a.....z

## TÎPÊN GIRDEK / Tîpên Hûrdek

**A / a**

AGIR / agir

**B / b**

BEQ / beq

**C / c**

CÊR / cêr

**Ç / ç**

ÇAV / çav

**D / d**

DAR / dar

**E / e**

ELOK / elok

**Ê / ê**

ÊZING / êzing

**F / f**

FIND / find

**G / g**

GORE / gore

**H / h**

HESP / hesp

**I / i**

INCAS / incas

**Î / î**

ÎSOT / îsot

**J / j**

JÎJO / jîjo

**K / k**

KARIK / karik

**L / l**

LEPIK / lepiK

**M / m**

MIŞK / mişk

**N / n**

NAN / nan

**O / o**

OTOBÛS / otobûs

**P / p**

PÎVAZ / pîvaz

**Q / q**

QIJIK / qijik

**R / r**

ROJ / roj

**S / s**

SÊV / sêv

**Ş / ş**

ŞEKIR / şekir

**T / t**

TIRÎ / tirî

**U / u**

GUL / gul

**Û / û**

ÛTÎ / ûtî

**V / v**

VAPÛR / vapûr

**W / w**

WERDEK / werdek

**X / x**

XANÎ / xanî

**Y / y**

YEK / yek

**Z / z**

ZEYTÛN / zeytûn

- A a:** Agir berda **kayê**, xwe **da** ber **bayê**.
- B b:** Berf û **baran** di**barin**.
- C c:** Cêwîyên **ciwan** li **cem** dêya xwe **ne**.
- C ç:** Çar **çûk** û çar **çêlek** çûn dora **çem**.
- D d:** Dêya **Deryayê** li **dora** **darê** digere.
- E e:** Ev bar **e**, **ev** jî serbar **e**.
- Ê ê:** Adarê, berfê da gulîyên darê, nema danê **êvarê**.
- F f:** Ferat fêkîyan di**firoşe**.
- G g:** Gavan **ga** û golik ajotin nav **garanê**.
- H h:** Hêlîn **helbesteke** **hunerî** ji ber kir.
- I i:** Min **kirî**, min **firo**t û min **kar** kir.
- Î î:** Îro min ji fêkî**firoş** fêkî **kirîn**.
- J j:** Qijik **ji** jêr firîya **jorê**.
- K k:** Ker **kete** ser **kaya** **kadînê**.
- L l:** Bila bilbil li **bal** gulê bixwîne.
- M m:** Min **mast** li ser **maseyê** **meyand**.
- N n:** Navê **nevîyê** **Nûrê** **Nûhat** e.
- O o:** Hoste **Osman**, **goşt** **sor** kir.
- P p:** Pelên daran **payîzan** **pir** diweşin.
- Q q:** Qama **qulingê** ji **qama** **qazê** bilindtir e.
- R r:** Mirrovê derewîn carek dixwe **firavîn**.
- S s:** Sênîyek **sêvên** **sor** li **ser** maseyê **ye**.
- Ş ş:** Şîr û **şekir** **şîrîn** in.
- T t:** Tajdîn **tû**, tûreşk û **tirî** xwarin.
- U u:** Kurm **qurm** **qul** kir.
- Û û:** Çûkê piçûk ji ser dara **tûyê** firî **û** **çû**.
- V v:** Ava **vê** kanîyê **devê** mirov **digerisîne**.
- W w:** Wextê te li **hewayê** **ewr** dîtî **were** malê.
- X x:** Xanîyên **xalê** min û **xaltîya** min **xweşik** in.
- Y y:** Kanîya bexçeyê me **geş** **bûye**.
- Z z:** Zozan **zaro**keke **kezîzer** e.

## Çalakîya 4.

Hûn jî li pey mamoste hevokên jorîn dubare bikin û bixwînin.



## Nêçîra Peyvan



berf



ga



derya



qurm



baran



çiya



kezîzer



çûk



quling



ewr



gur

## Çalakîya 5.

Hûn jî bi van tîpên jêrîn peyvan çêbikin.

A.....

L.....

F.....

A.....

B.....

E.....

## Tîpên Nêzdeng

**E-Ê**

zer-zêr

der-dêr

per-pêr

**I-Î**

pir-pîr

jin-jîn

bir-bîr

**U-Û**

tu-tû

du-dû

kur-kûr

**V-W**

ev-ew

dev-dew

vir-wir

**H-X**

hêz-xêz

hal-xal

hew-xew

**K-Q**

kelandin-qelandin

kalik-qalik

kelem-qelem

## Çalakîya 6.

Bi tîpên jêrîn peyvan çêbikin.



nîxa



rda



r g i a



sêpnû

## Çalakîya 7.

Di peyvên jêrîn de li cihê vala tîpên guncan binivîsin.

E / Ê



k.....r



k.....r

U / Û



k.....r



k.....r

I / Î




p.....r



p.....r

V / W



de.....




de.....

H / X



...êz



...êz

Q / K



...elem



...elem

## Helbest



## Sirûda Alfabeyê

Em bi helbest û stran  
Alfabeyê nas bikin  
Tîpan xweşik rêz bikin  
Hîn bibin alfabeyê

Agir û **av** bi **Ayê**  
Ba û **b**aran bi **Byê**  
Can û **c**eger bi **Cyê**  
Hîn dibim alfabeyê

**H** wek **hevîr** û **heval**  
**I** wek **incas** û **jinxal**  
**Î** wek **îşev** û **îsal**  
Hîn dibim alfabeyê

Bi **Çyê** ne **çav** û **çem**  
Bi **Dyê** ne **dev** û **dem**  
Bi **Eyê** ne **ew** û **em**  
Hîn dibim alfabeyê

**Jîjo** bi tîpa **Jyê**  
**Kîso** bi tîpa **Kyê**  
**Legleg** bi tîpa **Lyê**  
Hîn dibim alfabeyê

**Êvar**, **êzing** ji **Êyê**  
**Firaq**, **fanos** ji **Fyê**  
**Gul** û **guldank** ji **Gyê**  
Hîn dibim alfabeyê

**Masî** va hat bi **Myê**  
**Nêrî** va hat bi **Nyê**  
**Olan** va hat bi **Oyê**  
Hîn dibim alfabeyê





Di penîr de **P** heye  
 Di qijik de **Q** heye  
 Di rovî de **R** heye  
 Hîn dibim alfabeyê

Wisa, wilo û wanî  
 Xezal, xeyal û xanî  
 Yek, yarî û yaranî  
 Hîn dibim alfabeyê

Ji Syê ne sir û sar  
 Ji Şyê ne şîr û şar  
 Ji Tyê ne tîr û tar  
 Hîn dibim alfabeyê

Zengil çêbû bi Zyê  
 Zergul çêbû bi Zyê  
 Ziman çêbû bi Zyê  
 Hîn dibim alfabeyê

Kur û gur bi Uyê ne  
 Kûr û dûr bi Ūyê ne  
 Vî û vê bi Vyê ne  
 Hîn dibim alfabeyê

Min jimartin yek bi yek  
 Bi tevahî sih û yek  
 Heşt dengdêr, ên din bédeng  
 Ez hîn bûm alfabeyê


(Komîsyon)




### Nêçîra Peyvan




tîp



êzing



incas



rovî

## Hevpeyvîn



## HEVNASÎN

**Zeyneb:** Merheba.

**Hêlîn:** Merheba.

**Zeyneb:** Navê min Zeyneb e. Navê te çi ye?

**Hêlîn:** Navê min Hêlîn e.

**Zeyneb:** Tu çawa yî Hêlîn?

**Hêlîn:** Ez baş im. Spas dikim. Tu çawa yî Zeyneb?

**Zeyneb:** Ez jî baş im. Gelek spas.

**Hêlîn:** Tu diçî kîjan xwendingehê?

**Zeyneb:** Ez diçim Xwendingeha Navîn a Feqîyê Teyran. Tu?

**Hêlîn:** Ez jî diçim wê xwendingehê.

**Zeyneb:** Baş e. Naxwe em bi hev re biçin?

**Hêlîn:** Dibe. De ka em biçin.

## Çalakîya 8.

Valahîyên hevpeyvîna jêrîn dagirin.

**Fatîme:** Bihar, te dersa kurdî baş guhdarî kir?

**Bihar:** Erê Fatîme, min baş guhdarî kir.

**Fatîme:** Ez çend pirsan ji te bipirsim?

**Bihar:** Dibe. Ez amade me.

**Fatîme:** Di alfabeya me de çend tîp hene?

**Bihar:** .....

**Fatîme:** Ji van tîpan çend dengdêr û çend bêdeng in?


**Bihar:** ..... dengdêr in û ..... bêdeng in.

**Fatîme:** Pevdenga kurdî kîjan e?

**Bihar:** .....ye.

**Fatîme:** Tu dikarî pevdenga me di nav çend peyvên de bi kar bînî?

**Bihar:** Belê. ....



## Çalakîya 9.

Hûn jî hevpeyvîneke wekî ya jorîn bi hevaleke/ hevalekî xwe re çêbikin.

## BEŞA 2. HEJMAR



0

sifir

1

yek

2

du

3

sê

4

çar

5

pênc

6

şeş

7

heft

8

heşt

9

neh

10

deh

11

yazdeh

12

duwazdeh

13

sêzdeh

14

çardeh

15

pazdeh

16

şazdeh

17

hevdeh

18

hejdeh

19

nozdeh

20

bîst

21

bîst û yek

22

bîst û du

23

bîst û sê

24

bîst û çar

25

bîst û pênc

30

sih

40

çil

50

pêncî

60

şêst

70

heftê

80

heştê

90

nod

100

sed



**Çalakîya 1.**

Navên hejmarên jêrîn bibêjin û binivîsin.

6: ..... 12: ..... 5: ..... 16: .....  
 8: ..... 18: ..... 9: ..... 11: .....  
 13: ..... 15: ..... 7: ..... 17: .....  
 3: ..... 14: ..... 4: ..... 19: .....  
 0: ..... 1: ..... 20: ..... 10: .....  
 2: .....

**Çalakîya 2.**

Ji 0ê heta 100ê bijimêrin û navên hejmarên jêrîn ji hevalên xwe bipirsin.

21, 27, 34, 33, 47, 44, 52, 58,  
 61, 65, 72, 70, 80, 88, 95, 96

**Çalakîya 3.**

Hejmarên jêrîn bi reqeman binivîsin.

nozdeh: ..... heft: ..... pazdeh: ..... heşt: .....  
 duwazdeh: ..... bîst: ..... şeş: ..... hejdeh: .....  
 şazdeh: ..... sê: ..... çardeh: ..... pênc: .....  
 sêzdeh: ..... çar: ..... yazdeh: ..... deh: .....  
 du: ..... neh: ..... hevdeh: ..... yek: .....

**Çalakîya 4.**

Hejmarên jêrîn di nav hevokan de bi kar bînin.

sê / heft / yazdeh / çardeh / bîst

1. Ez **yazdeh** salî me.
2. ....
3. ....
4. ....
5. ....

## BEŞA 3. ZARGOTIN



## 1. Mamik


Wek şivanê berxika(n)  
Dinêre li zaroka(n)  
Fêr dike hêdîka  
Zanîn û tiştika(n).  
**Ev çi ye?**

Li mam heye,  
li xal tune,  
li mal heye,  
li bal tune.  
**Ev çi ye?**

Tûj e weke şûr,  
xweş e weke bilûr.  
**Ev çi ye?**

## 2. Pêkenoka 1.

## LI PEY AYÊ KÎJAN TÎP TÊ?



Mamoste li dibistanê ji Lezgîn dipirse:

- Lezgîn, tu hemû tîpên alfabeyê dizanî?
- Belê mamoste, dizanim.
- Ê de ka bibêje li pey Ayê kîjan tîp tê?
- Li pey tîpa Ayê hemû tîp tîpên mamoste!

## 3. Pêkenoka 2.



## FERMO TU BIXWÎNE

Zemanê berê qazî nameyek ji gundîyekî re şandibû. Zilam yekî nexwende bû. Di gund de jî tu kes peyda nekir ku karibe vê nameyê bixwîne. Radibe diçe cem melayê gund. Dibêje:

-Seyda, ka bi xêra xwe tu ji min re vê nameyê bixwîne.

Ji ber ku nivîs tevlîhev bû nikaribû bixwîne û dibêje:

-Bibore, ez nikarim bixwînim.

Zilam jî dibêje:

-Tu çawa nizanî bixwînî? Ma tu ji şaşika xwe jî şerm nakî?

Mela lê vedigerîne:

-Ma bi şaşikê ye! Naxwe ha ji te re şaşik û fermo tu bixwîne.

Nêçîra Peyvan



name



qazî



şaşik

## BEŞA 4. XAÇEPIRS



1




2



3



4



8



9



5



6



7



10



# BEŞA 5. NIRXANDIN



## A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Di alfabeya me de tîpên dengdêr kîjan in?

.....

2. Di alfabeya me de çend tîpên bêdeng hene?

.....

3. Bi her tîpeke jêrîn peyveke nû binivîsin.

w..... x..... ê..... q .....

4. Navê hejmarên jêrîn li hemberê wan binivîsin.

17: ..... 23: ..... 47: .....

8: ..... 100: ..... 60: .....

5. Bi tîpên jêrîn peyvan çêbikin.

irgdek: ..... yevp: ..... îtp: .....

rêddeg: ..... îkrdu: ..... êşr: .....

## B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç” (çewt) daynin.

1. Alfabeya me ji 33 tîpan pêk tê. ( )

2. Di alfabeya me de tîpên Ê, Î, Û, X, Q, W hene. ( )

3. Di alfabeya me de tîpên Â, Û, Î, Ö, Ğ tune ne. ( )

4. Di alfabeya me de b, c, ç, d, f, g, h.... tîpên dengdêr in. ( )

5. E-Ê, I-Î, U-Û, V-W tîpên nêzdeg in. ( )

**C) Valahîyên jêrîn dagirin.**

1. Pevdenga me..... ye.
2. Alfabeya me ji..... tîpan pêk tê.
3. “BIRIN” û “KIRÎN” bi tîpên hûrdek wekî..... û ..... tên nivîsîn.
4. Tîpên a,E,ê,I,î,O,u,Û wekî tîpên ..... tên binavkirin.
5. Di peyva “xwendingeh”ê de sê tîpên dengdêr û ..... tîpên bêdeng hene.

**D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin.****1. Kîjan tîpa jêrîn dengdêr e?**

- a) k                      b) x                      c) w                      d) û

**2. Kîjan tîpa jêrîn bêdeng e?**

- a) e                      b) q                      c) ê                      d) î

**3. Di kîjan peyvê de pevdengek heye?**

- a) xebat                      b) xanî                      c) xwê                      d) xort

**4. Navê kîjan hejmarê çewt e?**

- a) 18: hejdeh                      b) 16: şazdeh                      c) 8: heşt                      d) 17: heft

**5. Kîjan tîpên jêrîn di alfabeya me de tune ne?**

- a) ğ, ü, ö                      b) ê, î, q                      c) a, e, o                      d) b, c, d

**6. Nivîsandina kîjan hejmarê çewt e?**

- a) sifir                      b) sê                      c) yazdeh                      d) hevt

**7. Kîjan peyv bi tîpên girdek hatiye nivîsandin?**

- a) ziman                      b) PEYV                      c) tîp                      d) alfabe



Dinleme



Konuşma




Okuma



Yazma

## UNÎTEYA 2.

# EZ Û MALBATA XWE



### AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Hûn dikarin hinekî xwe bidin nasîn?
- 2) Hûn dikarin malbata xwe bidin nasîn?
- 3) Derheqê hevalên xwe de hûn dikarin çi bibêjin?
- 4) Pîşeyên kesên li derdora we çi ne?

## BEŞA 1. EZ XWE DIDIM NASÎN

Hevpeyvîn



## EM HEV NAS BIKIN

**Rihan:** Beyanî baş.

**Zozan:** Beyanî baş.

**Rihan:** Navê min Rihan e. Navê te çi ye?

**Zozan:** Navê min Zozan e.

**Rihan:** Tu çawa yî Zozan?

**Zozan:** Ez baş im, gelek spas. Tu çawa yî?

**Rihan:** Ez jî baş im. Spas dikim.

**Zozan:** Tu çend salî yî?

**Rihan:** Ez yazdeh salî me. Tu çend salî yî?

**Zozan:** Ez jî yazdeh salî me?

**Rihan:** Tu ji ku yî?

**Zozan:** Ez ji Batmanê me. Tu ji ku yî?

**Rihan:** Ez ji Erzurumê me.

**Zozan:** Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.

**Rihan:** Ez jî kêfxweş bûm.



**Çalakîya 1. Valahîyên jêrîn li gor hevpeyvînê dagirin.****1. Navê min Zozan e.**

Ez ji ..... me.

Ez ..... salî me.

**2. Navê min Rihan e.**

Ez ji ..... me.

Ez ..... salî me.

**Çalakîya 2. Pirsên jêrîn li gor xwe bibersivînin.****1. Navê te çi ye?**

.....

.....

**2. Tu çawa yî?**

.....

.....

**3. Tu çend salî yî?**


.....

.....

**4. Tu ji ku yî?**

.....

.....



## EZ XWE DIDIM NASÎN



Navê min Zerya ye.  
Çavên min şîn in.  
Ez bejindirêj im.  
Ez diçim pola pêncem.



Navê min Fatma ye.  
Çavên min kesk in.  
Porê min zer e.  
Ez keçeke lawaz im.



Navê min Mistefa ye.  
Ez yazdeh salî me.  
Çavên min hingivî ne.  
Porê min reş e.  
Bejina min kurt e.



Navê min Ristem e.  
Çavên min reş in.  
Porê min qehweyî ye.  
Ez hinekî qelew im.

**Çalakîya 3.**

Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyê “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Çavên Ristem reş in. ( )
2. Bejina Mistefa kurt e. ( )
3. Porê Fatmayê reş e. ( )
4. Zerya bejindirêj e. ( )
5. Mistefa deh salî ye. ( )
6. Ristem lawaz e. ( )
7. Çavên Fatmayê kesk in. ( )

**Çalakîya 4.**

Hûn jî hin taybetîyên xwe ji hevalên pola xwe re bibêjin û li jêr binivîsin.

.....

.....

.....

.....

**Çalakîya 5.**

Li gor mînaka jêrîn hûn jî agahîyên xwe li ser karta endamtîya pirtûkxaneyê binivîsin.

**KARTA  
ENDAMTÎYA  
PIRTÛKXANEYÊ**

Nav: Sara  
Paşnav: Çîçek  
Rojbûn: 02.05.2006  
Pol: 5/C  
Xwendîngeh: Xwendîngeha  
Navîn a Ehmedê Xanî



**KARTA  
ENDAMTÎYA  
PIRTÛKXANEYÊ**

Nav:  
Paşnav:  
Rojbûn:  
Pol:  
Xwendîngeh:



## BEŞA 2. MALBATA MIN



### MALBAT

Malbat ji dê û bav û zarokan pêk tê. Di hin malbatan de bapîr û dapîr jî bi wan re dimînin. Di malbatê de peywîrên her kesî hene. Eger endamên malbatê peywîrên xwe bi cih bînin û alîkarîya hev bikin jîyana wan hêsantir û xweştir dibe.

Dê û bav pêdivîyên zarokên xwe tînin cih û ji bo jîyana wan xweştir bikin dixebitin. Dê û bav ji bo perwerdehiya zarokên xwe jî hewl didin. Zarok jî di malê de alîkarîya dê û bavê xwe dikin û li dersên xwe baş dixebitin.

Kesên malbatê rûmetê didin bapîr û dapîrên xwe û qîmeta wan digirin.


#### Çalakîya 1. Hevokên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

**alîkarîya / rûmetê / zarokan / peywîrên / bapîr û dapîr / pêdivîyên**

1. Malbat ji dê û bav û ..... pêk tê.
2. Di hin malbatan de ..... jî bi wan re dimînin.
3. Dê û bav ..... zarokên xwe tînin cih.
4. Divê kesên malbatê ..... bidin hev.
5. Divê di malbatê de herkes ..... xwe pêk bîne.
6. Di malbatê de zarok ..... dê û bavê xwe dikin.




## ENDAMÊN MALBATÊ



## Çalakîya 2.

Valahîyên tabloya jêrîn li gor malbata xwe dagirin.



## Çalakîya 3.

Cihên vala bi peyvên jêrîn dagirin.

- |                    |         |       |
|--------------------|---------|-------|
| 1. Birayê dêya min | (xal)   | ap    |
| 2. Bavê dêya min   | (.....) | xal   |
| 3. Birayê bavê min | (.....) | xaltî |
| 4. Dêya bavê min   | (.....) | met   |
| 5. Xwişka dêya min | (.....) | bapîr |
| 6. Xwişka bavê min | (.....) | dapîr |

## EYŞAN MALBATA XWE DIDE NASÎN


Merheba, navê min Eyşan e. Ez yazdeh salî me. Diçim pola pêncem.

Ez ji malbata xwe pir hez dikim û dixwazim wan bidim nasîn.

Ev dêya min e. Navê wê Gulîzer e. Ew sih û pênc salî ye û hemşîre ye. Paste û kulîçeyên wê gelekî xweş in.

Ev dapîra min e. Navê wê Nûrê ye. Ew şêst û pênc salî ye û gelekî zana ye.

Ev bapîrê min e. Navê wî Salih e. Ew şêst û nehe salî ye û dengbêjekî jêhatî ye.



Ev birayê min e. Navê wî Ronî ye. Ew sê salî ye û delalîyê malê ye.

Ev xwişkê min e. Navê wê Delal e. Delal heft salî ye û gelekî xwînşîrîn e.

Ev bavê min e. Navê wî Hesen e. Ew sih û heşt salî ye û mamosteyekî jêhatî ye.

**Çalakîya 4.**

Valahîyên jêrîn li gor taybetîyên kesên malbata Eyşanê dagirin.

(Birayê/ Dapîra/ Xwişka/ Bapîrê/ Dêya/ Bavê)

Dapîra

Eyşanê zana ye.

..... Eyşanê dengbêj e.

..... Eyşanê mamosteyekî jêhatî ye.

..... Eyşanê paste û kulîçeyan çêdike.

..... Eyşanê delalîyê malê ye.

..... Eyşanê xwîşîrîn e.

**Çalakîya 5.**

Bi peyvên jêrîn hevokan saz bikin.

1. birayê / Ronî ye / Navê / min **Navê birayê min Ronî ye.**

2. dapîra / Nûrê ye / Navê / min .....

3. jêhatî ye / Ew / dengbêjekî .....

4. dêya / Gulîzer e / Navê / min .....

5. xwîşîrîn e / Delal /gelekî .....

**Çalakîya 6.**

Hûn jî hin taybetîyên endamên malbata xwe yên wekî nav, temen, pîşe, rengê çav û porê ji hevalên pola xwe re bibêjin û li jêr binivîsin.

.....

.....

.....

.....

.....

.....

## Helbest



## MALBATA MIN

Dengê te wek ava zela  
 Rûyê te wek heyva dela  
 Çawa heqê te ez bidim  
 Dayika min a çavxeza

Ji bo min her dem piştgir î  
 Tu derdên min hildigirî  
 Çawa ez pesnê te bidim  
 Bavo şîrîn î, şeker î

Xwişk û birayên min şîrîn  
 Bi kêfxweşî û bi kenîn  
 Hîç şahîya we kêm nebe  
 Neçike kanîya zêrîn

(Komîsyon)

## Çalakîya 7.

Hest û ramanên ku bi vê helbestê bi we re  
 çêbûn bi pola xwe re parve bikin.



## BEŞA 3. HEVALÊN MIN

### HEVALÊN TAXÊ

**Yûsuf:** Roj baş Merwan.

**Merwan:** Roj baş Yûsuf.

**Yûsuf:** Tu çawa yî?

**Merwan:** Ez baş im, spas dikim. Tu çawa yî?

**Yûsuf:** Ez jî baş im, gelek spas dikim.

**Merwan:** Ev hevalê min e. Navê wî Mîrza ye.

**Yûsuf:** Merheba Mîrza, tu çawa yî?

**Yûsuf:** Ez jî baş im. Gelek spas.

**Mîrza:** Tu diçî kîjan xwendingehê?

**Yûsuf:** Ez diçim Xwendingeha Navîn a Xelîl Xeyalî. Tu diçî kîjan xwendingehê?

**Mîrza:** Ez jî diçim Xwendingeha Navîn a Mem û Zîn.

**Yûsuf:** Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.

**Mîrza:** Ez jî kêfxweş bûm.



#### Çalakîya 1.

Li gor hevpeyvîna jorîn gotinan û navên li hemberê wan hevpek bikin.

1. Ez diçim Xwendingeha Navîn a Xelîl Xeyalî.

**Yûsuf**

2. Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.

3. Ez jî diçim Xwendingeha Navîn a Mem û Zîn.

**Mîrza**

4. Ev hevalê min e. Navê wî Mîrza ye.

5. Ez jî kêfxweş bûm.

**Merwan**

#### Çalakîya 2.

Pirsên jêrîn li gor xwe bibersivînin.

1. Tu çawa yî?

.....

2. Tu diçî kîjan xwendingehê?

.....

## BERFÎN HEVALÊN XWE DIDE NASÎN




Ev hevalê min Hiseyn e.  
Ew duwazdeh salî ye û  
diçe Xwendingeha  
Navîn a Feqîyê Teyran.  
Ew ji werzişê pir hez dike.

Navê min Berfîn e.  
Ez diçim Xwendingeha  
Navîn a Melayê Cizîrî.  
Ez dixwazim hevalên xwe  
bi we bidim nasîn.



Ev hevalê min Selîm e.  
Ew deh salî ye û diçe  
Xwendingeha Navîn a  
Malabadê.  
Ew ji xwendina  
pirtûkan pir hez dike.



Ev hevala min Gulê ye.  
Ew yazdeh salî ye.  
Em diçin heman  
xwendigehê.  
Ew ji avjenîyê hez dike.



Ev hevala min Şîlan e.  
Ew yazdeh salî ye û diçe  
Xwendingeha Navîn a  
Selahedînê Eyûbî.  
Ew ji geştûgerê hez dike.

Nêçîra Peyvan



avjenî



werziş



geştûger

**Çalakîya 3.**

Li gor agahîyên jorîn pirsên jêrîn bibersivînin.

**1. Kî ji xwendina pirtûkan pir hez dike?**

- a) Gulê                      b) Şîlan
- c) Hiseyn                 d) Selîm

**2. Kî diçe Xwendingeha Navîn a Selahedînê Eyûbî?**

- a) Gulê                      b) Şîlan
- c) Hiseyn                 d) Selîm

**3. Kî duwazdeh salî ye?**

- a) Gulê                      b) Şîlan
- c) Hiseyn                 d) Selîm

**4. Gulê diçe kîjan xwendingehê?**

- a) Xwendingeha Navîn a Malabadê
- b) Xwendingeha Navîn a Melayê Cizîrî
- c) Xwendingeha Navîn a Feqîyê Teyran
- d) Xwendingeha Navîn a Selahedînê Eyûbî

**5. Kîjan ne taybetîyeke Şîlanê ye?**

- a) Ew diçe Xwendingeha Navîn a Selahedînê Eyûbî.
- b) Ew yazdeh salî ye.
- c) Ew ji avjenîyê hez dike.
- d) Ew ji geştûgerê hez dike.

**Çalakîya 4.**

Hûn jî hin taybetîyên hin hevalên xwe ji hevalên pola xwe re bibêjin û li jêr binivîsin.

.....

.....

.....

.....

.....

## BEŞA 4. PÎŞE

### EM PÎŞEYAN HÎN DIBIN

Mirov ji bo debara  
xwe bikin dixebitin.

Her yek ji wan  
xwedî pîşeyên cuda  
ne. Ev pîşe jîyana me  
hêsan dikin. Werin  
em van pîşeyan hîn  
bibin!



#### Mamoste

Mamoste me, hînkêr im  
Fêrkerê zarokan im  
Belav dikim zanînê  
Ronî dikim jîyanê



#### Cotkar

Rez û zevî, dehl û deşt  
Bi destên min bûn bihişt  
Beyarên hişk û ziwa  
Bûn wekî bûk û zava

#### Dikandar

Navê min e Hayedar  
Hayedarê dikandar  
Bi kirîn û firotin  
Her û her dikim debar



#### Karmend

Em xebatkarên karmend in  
Karê fermî dimeşînin  
Bi dildarî dixebitin  
Em di kar de qet nawestin





### Bijîşk

Bi tenduristîya mirovan  
Mijûl dibim bi şev û rojan  
Bi destsivikî û dilsozî  
Nexweşan zû dikim derman



### Karker

Em karker û xebatkar in  
Ji bo debarê kar dikin  
Geh tenê geh bi hevalan  
Kar dikin bi keda destan



### Endezyar

Endezyar bi hûrgulî  
Avahîyan saz dike  
Bi xebatên hunerî  
Derdorê xweşik dike



### Mêwefiroş

Werin teze ne mêwe  
Fêkîyê min bedew e  
Mêweyan bifiroşim we  
Yên erzan ez bidim we

## Nêçîra Peyvan



deşt



zevî



beyar



dehl



nexweş



endezyar

## Çalakîya 1.

Peyvên jêrîn di hevokan de bi cih bikin.

**Endezyar / Mêwefiroş / Karmend / Mamoste / Bijîşk**

1. .... fêrkerê zarokan e.
2. .... karê fermî dimeşîne.
3. .... nexweşan derman dike.
4. .... avahîyan saz dike.
5. .... mêweyan difiroşe.

## BEŞA 5. ZARGOTIN



## 1. Gotinên Pêşîyan

Dinya gulek e, bêhn bike û bide hevalên xwe.

Bav dixwaze law jê çêtir be, seyda dixwaze şagirt jê jîrtir be.

Zarok kezeba dê û bavên xwe ne.

Pêşî ji hevalê xwe re bixwaze, piştî ji xwe re.

Mal dibistan e, dê û bav mamoste ne.



## 2. Lêhatinok

Endilko bavê Beko  
Nîvî min nîvî keko  
Ê keko kete çalê  
Ê min ma heya salê  
Sala mala me li wê bû  
Serî li ser çokê bû  
Keçik delalîya dê bû.

Heval hevaloşkê  
Nan û penîroşkê  
Hevalê min şivan e  
Gopalê wî pan e  
Ji bo guran derman e.

## 3. Pêkenok

## CAMÊR CAMÊRAN NAS DIKIN

Li gundekî mezin û xweş du heval hebûn. Navên wan Emer û Rênas bûn. Emer duwazdeh salî ye û Rênas bi salekê ji Emer piçûktir e. Rojekê her du heval ji bo bêhna xwe vedin derdikevin derveyê gund. Bi hev re dimeşin heta ku digihêjin ser girekî û li ser kevirekî pan rûdinin. Li wir li kar û xebatên gundîyan temase dikin. Piştî dest bi axaftinê dikin.

Emer:

-Rênas, di vî gundî de du camêr hene.

Rênas:

-Gelo ew kî ne?

Emer:

-Yek ji wan tu yî, lê ez ê din nabêjim.

Rênas:

-Weleh ê din jî tu yî.

Her du heval bi ken dibêjin:

-Ê bavo, camêr camêran nas dikin.



## Çalakîya 1.

Li gor agahîyên jorîn li hemberê hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

- |                                              |       |
|----------------------------------------------|-------|
| 1. Ji bo bêhna xwe vedin diçin derveyê gund. | ( R ) |
| 2. Rênas yazdeh salî ye.                     | ( )   |
| 3. Gundê wan mezin û xweş e.                 | ( )   |
| 4. Navê yekî Rênas, navê yê din Bawer e.     | ( )   |
| 5. Bi meşê çûn serê gir.                     | ( )   |
| 6. Emer ji Rênas piçûktir e.                 | ( )   |
| 7. Bi hesp diçin derveyê gund.               | ( )   |
| 8. Emer neh salî ye.                         | ( )   |

## Çalakîya 2.

Hûn jî derbarê hevaltîyê de pêkenokekê bibêjin.



## Çalakîya 3.

Çîroka jêrîn carekê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin piştre hûn bixwînin. Binê pirsên ku di çîrokê de derbas dibin xêz bikin.

## 4. Çîrok



## ŞENGÊ Û PENGÊ

Hebû tunebû, bizinek û du karikên wê hebûn. Rojekê bizin ji karikên xwe re dibêje:

-Ez dê herim derve biçêrim. Bila şîr têkeve guhanên min û hûn jî karibin têr guhanên min bimijin. Lê heta ku ez werim derî ji kesî re venekin. Dema ku ez vegerim ez dê ji we re vê stranê bibêjim:

“Şenga min Penga min  
Dêya we çûye zozanan  
Xwarine pelên kizwanan  
Şîr ketiye guhanan

Zû kin, lez kin werin danan!” Piştî ku min ev stran ji we re got, wê demê hûn dê derî vekin. Baş e?

-Baş e dayê!

Û bizin diçe. Gurekî jî bi dizî guhdarîya wan dikir. Gur tê û li derî dixe. Şengê û Pengê dibêjin:

-Ew kî ye?

Gur dibêje:

-Ez im ez, dêya we me!

-Na! Tu ne dêya me yî. Dengê dêya me ne wiha ye. Jixwe tu strana dêya me jî nizanî!

Roja din gur baş guhdarîya wan dike. Piştî ku bizin diçe çêreyê, gur tê li derî dixe.

Şengê û Pengê:

-Ew kî ye?

Gur dengê xwe zirav dike û dest bi stranê dike:

-Şenga min Penga min

Dêya we çûye zozanan

Xwarine pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû kin, lez kin werin danan!

Şengê û Pengê bawer dikin ku ew dêya wan e. Derî vedikin ku weeyyy, ev çi ye!

-Ev gur e!

Gur wan dibe û diçe. Dibe êvar. Bizin ji çêreyê tê malê ku çi bibîne?

Mala wê gişt tevlihev bûye û Şengê û Pengê jî xuya nakin. Bizin digirî û dibêje:

-Şenga min Penga min, hûn li ku ne?

Lê tu deng ji derekê nayê. Bizin difikire û dibêje:

-Hebe nebe ev karê gur e.

Bizin yekser diçe ser xanîyê gur û teperepê dike.

Gur dibêje:

-Ew kî ye li ser xanîyê min teperepê dike!

Firaq û kevçiyên min tije toz dike

Jina min hevîr dike!

Bizin dibêje:

-Ez im ez, bizina zêrîn

Kê biriye Şenga min,

Kê biriye Penga min?



Were qal û cenga min

Gur dibêje:

-Min biriye Şenga te

Min biriye Penga te,

Ez tēm qal û cenga te

Gur û bizin li rasta mala gur dest bi şer dikin.

Êrîşî hev dikin. Bizin bi ser dikeve. Dawî bizin diçe

Şengê û Pengê ji destê gur rizgar dike. Şengê û Pengê diçin hambêza dêya xwe. Bizin wan maçî dike û bi hev re diçin mala xwe.

Çîroka min çû dîyaran

Rehmet li dê û bavê guhdaran.



### Nêçîra Peyvan



karik



bizin




kizwan



çêre

### Çalakîya 4.

Li wêneyên çîrokê binêrin. Kîjan ê rojê ye, kîjan ê şevê ye li binê wan binivîsin.



### Çalakîya 5.

Li gor çîroka jorîn bersiva pirsên jêrîn bidin.

1. Şengê û Pengê cara pêşî çima derî li gur venekirin? Bibêjin.
2. Şengê û Pengê cara duyem çima derî li gur vekirin? Bibêjin.
3. Kî Şengê û Pengê direvîne? Bibêjin.

## BEŞA 6. XAÇEPIRS



1




2



3



4



9



10



5



6



7



8



# BEŞA 7. NIRXANDIN



## A) Li gor bersivên jêrîn pirsan çêbikin.

1. ....  
Ez baş im. Spas dikim.
2. ....  
Ez ji Muşê me.
3. ....  
Navê min Bêrîvan e.
4. ....  
Ez yazdeh salî me.
5. ....  
Ez mamoste me.

## B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Cotkar bi tenduristîya mirovan mijûl dibe. ( )
2. Endezyar avahîyan saz dike. ( )
3. Karmend karên fermî dimeşînin. ( )
4. Karker ji bo debara xwe dixebitin. ( )
5. Nanpêj mêweyan difiroşe. ( )

## C) Valahîyên jêrîn li gor xwe dagirin.

1. Navê min .....
2. Çavên min .....
3. Ez .....salî .....
4. Porê min .....
5. Ez di pola ..... de me.

## D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?

1. Ji komika ku ji dê, bav û zarokan pêk tê re çi tê gotin?

- a) heval      b) cîran      c) malbat      d) civak

2. Pênasa kîjan peyvê çewt e?

- a) xal: Birayê dêya me ye.      b) met: Xwişka bavê me ye.  
c) dapîr: Bavê dêya me ye.      d) ap: Birayê bavê me ye.

3. Xwişka bavê min dibe çi yê min?

- a) met      b) xwişk      c) xal      d) xaltî

4. Yek heye, ji zarokên dê û bavê te ye. Lê ne xwişk û birayê te ye. Ev kî ye?

- a) Xalê min e.      b) Ez im.  
c) Apê min e.      d) Birazîyê min e.

5. Derbarê hevaltîyê de kîjan vebijêrk neyînî ye?

- a) hezkirin      b) parvekirin  
c) piştgirî      d) xapandin

6. “Avahîyan saz dîke û derdorê xweşîk dîke” Li jor behsa kîjan pîşeyî tê kirin?

- a) Bijîşkî      b) Karkerî      c) Endezyarî      d) Mêwefiroşî





Dinleme



Konuşma



Okuma



Yazma

## UNÎTEYA 3.

# XWENDINGEH Û JÎNGEHA MIN



### AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Hûn dikarin hinekî behsa xwendingeha xwe bikin?
- 2) Hûn di xwendingehê de kîjan dersan dixwînin?
- 3) Hûn dikarin hinekî behsa xanîyê xwe bikin?

# BEŞA 1. JÎYANA MALÊ

## BEŞ Û AMÛRÊN XANÎ

### 1 Jûra Rûniştinê

Ev jûra rûniştinê ye.  
Em bi malbatî li vir rûdinin.  
Di jûra rûniştinê de **paldank**,  
**sêpê û televîzyon** hene.



### 2 Jûra Razanê

Ev jûra razanê ye.  
Dema dibe şev em li vir radizin.  
Di jûra razanê de **nivîn**,  
**balgeh û lihêf** hene.



### 3 Jûra Zarokan

Ev jûra zarokan e. Zarok li vê  
derê dimînin. Di jûra zarokan  
de **pêlîstok**, **refa pirtûkan** û  
**kompîtur** hene.



### 4 Pêjgeh

Ev pêjgeh e. Em xwarina xwe  
li vir çêdikin û dixwin.  
Di pêjgehê de **sarinc**, **firaqşo** û  
**firin** hene.





5

## Destşok


Ev destşok e. Em li vir dest û rûyê xwe dişon. Di destşokê de **neynik, pêjgir, firçeya diranan** û **macûna diranan** hene.



6

## Serşok

Ev serşok e. Em tê de serê xwe dişon. Di serşokê de **cilşok, şampuan, lûfik** û **şimik** hene.



7

## Daşir


Ev daşir e. Em pêdivîya xwe ya tuwaletê li vir tînin cih. Piştî derketina ji daşirê em destên xwe dişon. Di daşirê de **sîfon** û **kaxeza daşirê** hene.



8

## Şaneşîn

Ev şaneşîn e. Dema hewa hênîk be em li vir rûdinin, li derdora xwe temaşe dikin. Di şaneşînê de **guldank, bixêrî** û **rûniştekan** hene.



## Çalakîya 1.

Li gor agahîyên jorîn hevok û peyvên hevok bikin.

- |                                                     |                     |
|-----------------------------------------------------|---------------------|
| 1. Zarok li vê jûrê dimînin.                        | Jûra rûniştinê      |
| 2. Em bi malbatî li vir rûdinin.                    | Şaneşîn             |
| 3. Dema hewa hênik be em li vir rûdinin.            | Daşir               |
| 4. Dema dibe şev em li vir radizin.                 | <b>Jûra zarokan</b> |
| 5. Em li vir dest û rûyê xwe dişon.                 | Jûra razanê         |
| 6. Em pêdivîya xwe ya tuwaletê li vir bi cih tînin. | Destşok             |

## Çalakîya 2.

Li gor agahîyên jorîn pirsên jêrîn bibersivînin.

- Kîjan amûr li jûra zarokan heye?
 

|          |            |             |            |
|----------|------------|-------------|------------|
| a) lûfik | b) firaqşo | c) pêlîstok | d) guldank |
|----------|------------|-------------|------------|
- Kîjan amûr li pêjgehê tune ye?
 

|           |           |            |          |
|-----------|-----------|------------|----------|
| a) neynik | b) sarinc | c) firaqşo | d) firin |
|-----------|-----------|------------|----------|
- Nivîn, lihêf û balgeh li ku derê ne?
 

|            |          |           |                |
|------------|----------|-----------|----------------|
| a) şaneşîn | b) daşir | c) serşok | d) jûra razanê |
|------------|----------|-----------|----------------|
- Em li ku derê xwarina xwe çêdikin û dixwin?
 

|           |                 |            |                |
|-----------|-----------------|------------|----------------|
| a) pêjgeh | b) jûra zarokan | c) destşok | d) jûra razanê |
|-----------|-----------------|------------|----------------|
- Em serê xwe li ku derê dişon?
 

|            |           |           |            |
|------------|-----------|-----------|------------|
| a) şaneşîn | b) serşok | c) cilşok | d) firaqşo |
|------------|-----------|-----------|------------|

## Çalakîya 3.

Mala xwe û jûra xwe bi pola xwe bidin nasîn.

## Çalakîya 4.

Derbarê amûrên maseya xwe ya xebatê de agahîyan bidin hevalên xwe.

## Çalakîya 5.

Derbarê mala xwe û derdora wê de çend hevokan binivîsin.

.....

.....

.....

## Hevpeyvîn



## NAVNÎŞANA MALÊ

## A) Roja Pêncşemê

**Rûken:** Meryem, roja şemîyê rojbûna min e. Ez dixwazim tu jî bêyî mala me.

**Meryem:** Baş e. Ser çavan. Mala we li ku ye?

**Rûken:** Tu Parka Şîn a ku li hemberê Mizgefta Mezin e nas dikî?

**Meryem:** Erê, baş dizanim.

**Rûken:** Mala me ji parkê pir ne dûr e.

**Meryem:** Naxwe, ez dê bi dêya xwe re roja şemîyê saet li 11.00an werim ber parkê. Tu jî were pêşîya me.


## B) Roja Şemîyê

**Rûken:** Ez pir memnûn bûm ku tu îro hatî mala me.

**Meryem:** Ez jî bi dîtina te gelekî kêfxweş bûm. Ev derfeteke baş bû ku min xaniyê we dît. Bexçeyê we pir mezin û xweş e.

**Rûken:** Tu dikarî hinekî behsa xaniyê xwe bikî?

**Meryem:** Belê. Mala me li pişt xwendingeha me, li kêleka dermanxaneyê ye. Xaniyê me duqatî ye, rengê wî zer e. Pênc jûrên wî hene. Bexçeyê me piçûk e. Çend darên fêkîyan û çend darên çaman lê hene. Dîwarê bexçeyê me qehweyî ye.



## Çalakîya 6.

Hûn jî wekî hevpeyvîna jorîn taybetîyên xaniyê xwe û derdora wî binivîsin.

.....

.....

## BEŞA 2. JÎYANA XWENDINGEHÊ

Hevpeyvîn



## XWENDINGEHA MIN

**Cemîle:** Silav Dilêr. Tu diçî ku?

**Dilêr:** Silav Cemîle. Ez diçim xwendingeha xwe.

**Cemîle:** Xwendingeha te kîjan e?

**Dilêr:** Xwendingeha Navîn a Zembîlfiroş e.

**Cemîle:** Xwendingeha te li ku derê ye?

**Dilêr:** Li Taxa Tenduristîyê li kêleka Parka Gulfiroş e. Tu diçî kîjan xwendingehê?

**Cemîle:** Ez jî diçim Xwendingeha Navîn a Mewlana. Tu di kîjan polê de yî?

**Dilêr:** Ez di pola 5/Ayê de me. Tu di kîjan polê de yî?

**Cemîle:** Ez jî di pola 5/Byê de me.

**Dilêr:** Tu dikarî hinekî behsa xwendingeha xwe bikî?

**Cemîle:** Belê. Xwendingeha min mezin e. Bexçeyê wê gelekî fireh e. Di bexçe de darên mêweyan û cihên lîstikên cûrbicûr hene. Xwendingeha te çawa ye?

**Dilêr:** Xwendingeha min pir ne mezin e. Lê bexçeyê wê mîna yê we ye.

**Cemîle:** Derdora xwendingeha we çawa ye?

**Dilêr:** Derdora wê tev şînahî ye û pir paqij e. Em çopên xwe her tim diavêjin çopdankê.

**Cemîle:** Xwendingeha me jî pir xweş e. Ez jî xwendingeha xwe gelekî hez dikim.

**Dilêr:** Ez jî ji xwendingeha xwe pir hez dikim.





**Çalakîya 1. Valahîyên jêrîn li gor hevpeyvînê dagirin.**

1. Dilêr diçe Xwendingeha Navîn a .....
2. Cemîle di pola .....yê de ye.
3. Bexçeyê xwendingeha Cemîleyê gelekî ..... e.
4. Ez ji xwendingeha xwe gelekî .....
5. Em çopên xwe her tim diavêjin .....

**Çalakîya 2. Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.**

1. Dilêr di pola 5/Ayê de ye. ( )
2. Cemîle diçe Xwendingeha Navîn a Mewlana. ( )
3. Xwendingeha Cemîleyê piçûk e. ( )
4. Derdora xwendingeha Dilêr tev şînahî ye û pir paqij e. ( )
5. Xwendingeha Cemîleyê li Taxa Tenduristîyê li kêleka Parka Gulfiroş e. ( )

**Çalakîya 3. Hûn jî ji hevalên xwe yê polê re behsa xwendingeha xwe bikin.****Çalakîya 4. Valahîyên jêrîn li gor xwe dagirin.**

1. Tu diçî kîjan xwendingehê?  
.....
2. Tu di kîjan polê de yî?  
.....
3. Xwendingeha te li ku derê ye?  
.....

## Helbest



## DERSÊN ME

Dersên me çiqas xweş in

Em ji tevan hez dikin

Ka ji we re bibêjim

Li min guhdarî bikin



Hînbûna **îngîlîzî**

Li me nabe giranî

Derseke gelek xweş e

Ev zimanê biyanî



Heçî dersa **tirkî** ye

Derseke pir spehî ye

Hînbûna vî zimanî

Ji te re dilgeşî ye



Heçî dersa **bîrkarî**

Ji bo hesaban bikî

Ji me re pir pêwîst e

Pir dike alîkarî



**Agahîyên civakî**

Pê cîhanê nas dikî

Em tev tê de hîn dibin

Tiştên erd û deryayî



Di dersa **wêneyan** de  
Em wêneyan xêz dikin  
Tiştên di xeyalan de  
Bi rengan dixemilînin



Dersa **dînî** pir xweş e  
Mîrov her tim pê geş e  
Mîjarên dîn û exlaq  
Kî hîn dibe dilgeş e



Dersa cenabê nebî  
Tu tu car jê têr nabî  
**Jîyana pêxember** e  
Divê tu baş zanibî



Heye derseke din jî  
Xweş e heta bibêjî  
Ji bo ilm û zanînê  
Ev **fen û teknoloji**



Heçî dersa **werzişê**  
Bi tevger û lîstîk e  
Ji bo tenduristîyê  
Feydeyên wê pir hene



Navê ya din **muzîk** e  
Derseke pir rindik e  
Kilam, stran, dengbêjî  
Tevan hînî te dike



Dersa zimanê **kurdî**  
Çiqas xweş û şîrîn e  
Em tiştên xweş hîn dibin  
Bi zimanê zikmakî

## Çalakîya 5.

Li gor helbesta jorîn ders û agahîyan hevpek bikin.

1. Tiştên erd û deryayî

2. Hesabkirin

3. Tenduristî

4. Mijarên dînî û exlaqî

5. Kilam, stran, dengbêjî

a. Dîn

b. Muzîk

c. Bîrkarî

d. Agahîyên civakî

e. Werziş

## Çalakîya 6.

Li gor helbesta jorîn li hemberê hevokên jêrîn nîşaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Em di dersa kurdî de hînî hesaban dibin.

( )

2. Em di dersa agahîyên civakî de hînî tiştên erd û deryayî dibin.

( )

3. Em di dersa fen û teknolojiyê de hînî mijarên zanistî dibin.

( )

4. Em di dersa werzişê de hînî tevger û lîstikan dibin.

( )

5. Em di dersa bîrkarîyê de stranan dibêjin.

( )



## KELÛPELÊN XWENDINGEHÊ

1

Pênûs



Em bi pênûsê dinivîsin.

2

Lênûsk



Em li lîênûskê dinivîsin.

3

Jêbir

Em şaşîyên xwe  
bi jêbirê jê dibin.

4

Çente

Tiştên ku di  
dersan de bi kêrî  
me tînin, em di  
çenteyê xwe de  
dibin xwendingehê.


5

Feheng

Em wateya peyvan ji  
ferhengê hîn dibin.


6

Pirtûk

Em ji pirtûkan gelek  
tiştan dixwînin û hîn  
dibin.

7

Dep

Mamoste di dersan  
de nivîsan li ser dep  
dinivîse.

8

Nexşe

Em bi saya nexşeyê  
cîhên bajar û dewletan  
hîn dibin.

9

Pênûstraş

Em serê pênûsa xwe bi  
pênûstraşê tûj dikin.

10

Pênûsdank

Em pênûs û jêbirên  
xwe dixin hundirê  
pênûsdankê.


11

Mase

Em nivîs,  
xwendin û  
dersên xwe  
li ser maseyê  
çêdikin.

12

Rûnişte

Ji bo rûniştinê  
em rûnişteke  
bi kar tînin.

13

Rastkêş

Em bi rastkêşê xêzan  
rast dikişînin.

14

Çopdank

Em çopên  
xwe diavêjin  
çopdankê.

## KOMÊN XWENDINGEHÊ

## 1 Koma Nivîskarîyê

Xwendekar di koma nivîskarîyê de helbest û nivîsan dinivîsin.



## 4 Koma Kişikê

Xwendekar di koma kişikê de bi kişikê dilîzin û bi hev re dikevin pêşbazîyê.



## 2 Koma Futbolê

Ji koma futbolê tîm tîn sazkin. Carinan ev tîm bi tîmên xwendingehên din re dilîzin.



## 5 Koma Muzîkê

Xwendekar di koma muzîkê de gelek stranan dibêjin û hînî bikaranîna amûrên muzîkê dibin.



## 3 Koma Şanoyê

Di koma şanoyê de xwendekar hînî lîstikvanîyê dibin.



## 6 Koma Folklorê

Endamên koma folklorê hînî reqsên herêmî dibin û wan reqsan di şahîyan de pêşkêş dikin.



### Çalakîya 7. Navên koman bi wêneyên jêrîn re hevpek bikin.

1. Koma Kişikê


2. Koma Şanoyê

3. Koma Muzîkê

4. Koma Nivîskarîyê

5. Koma Folklorê

6. Koma Futbolê



### Çalakîya 8. Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

**nivîskarîyê / futbolê / şanoyê / kişikê / muzîkê / folklorê**

1. Xwendekar di koma ..... de dido dido bi hev re dikevin pêşbazîyê.
2. Di koma ..... de tîm tîm sazîkirin û ev tîm bi tîmên xwendingehên din re dilîzin.
3. Xwendekar di koma ..... de helbest û nivîsan dinivîsin.
4. Endamên koma ..... hînî reqsên herêmî dibin û wan reqsan di şahîyan de pêşkêş dikin.
5. Xwendekar di koma ..... de gelek stranan dibêjin.
6. Li xwendingeha me koma ..... jî heye. Di vê komê de em hînî lîstikvanîyê dibin.

### Çalakîya 9. Rêzikên xwendingeh û polê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin.

# BEŞA 3. JÎYANA GUND Û BAJARAN

Hevpeyvîn



## GUND Û BAJAR

**Osman:** Roja te bi xêr Tajdîn. Tu dikarî hinekî behsa gundê xwe bikî?

**Tajdîn:** Belê, ser çavan. Lê ez dixwazim tu jî ji min re hinekî behsa bajarê xwe bikî.

**Osman:** Baş e.

**Tajdîn:** Gundê me di nav daristanê de ye û pir xweş e.

**Osman:** Bajarê me jî pir xweş e. Bajarekî kevnar û binavûdeng e.

**Tajdîn:** Gundê me piçûk e. Li derdora wî rez û zevî hene.

**Osman:** Lê bajarê me pir mezin e. Gelek avahîyên bilind, park û bazargehên mezin lê hene.

**Tajdîn:** Gundê me piçûk e. Tê de pêncî mal hene.

**Osman:** Bajarê me jî gelekî qerebalix e. Bi sed hezaran mirov lê dijîn.

**Tajdîn:** Nêzî mala me golek heye. Em carinan diçin li wir masîyan digirin.

**Osman:** Nêzî mala me jî hewzê avjenîyê heye. Em tê de avjenîyê dikin.

**Tajdîn:** Li gundê me û derdora wî ajelên wekî ker, hesp, çêlek û berxikan hene.

**Osman:** Li bajarê me jî bexçeyê ajelan heye. Em carinan bi malbatî diçin wir û li ajelan temaşe dikin.

**Tajdîn:** Li gundê me şevbihêrk çêdibin. Em di van şevbihêrkan de li çîrokbêj û dengbêjan guhdarî dikin.

**Osman:** Li bajarê me jî şano û sînema hene.

**Tajdîn:** Ez ji bo van agahîyên te pir kêfxweş bûm. Mala te ava.

**Osman:** Ez jî kêfxweş bûm. Mala te jî ava.





## Nêçîra Peyvan



daristan



rez



zevî



avahî



gol



avjenî



bexçeyê ajelan



dengbêj



şano



bazargeh

## Çalakîya 1.

Li gor hevpeyvîna jorîn li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Gundê Tajdîn gelekî mezin e. ()
2. Bajarê Osman pir xweş e. Bajarekî kevnar û binavûdeng e. ()
3. Gundê Tajdîn di nav daristanê de ye û pir xweş e. ()
4. Nêzî mala Tajdîn hewzê avjenîyê heye. ()
5. Li bajarê Osman şano û sînema hene. ()
6. Li gundê Tajdîn bexçeyê ajelan heye. ()
7. Li bajarê Osman şevbihêrk çêdibin. ()
8. Tajdîn carinan diçe golê û li wir masîyan digire. ()

## Çalakîya 2.

Li gor hevpeyvîna jorîn gund û bajarê hevrû bikin. Tiştên ku li wan hene di tabloya jêrîn de bi cih bikin.

**daristan, bazargehên mezin, avahîyên bilind, park, şevbihêrk, ajelên wekî ker, hesp..., rez û zevî, sînema**

| GUND | BAJAR |
|------|-------|
|      |       |
|      |       |
|      |       |
|      |       |

## BEŞA 4. ZARGOTIN



## 1. Mamik

Her roj li dibistan e, lê tişteke nizane. Ev çi ye?

Pirpel e, nivîs lê bel e, bi bend û bal e, ji te re heval e. Ev çi ye?

Şevê datên, rojê hiltên. Ev çi ne?

## 2. Gotinên Pêşîyan

Divê fikir rind bê fikirandin, peyv rind bê gotin, kar rind bê kirin.

Barê nezanîyê, girantir e ji derdê xizanîyê.

Nezan, dengê xwe bilind dike, zana gotina xwe...

## 3. Lêhatinok

Çûme gundê xalê xwe  
Xal rakir gopalê xwe  
Çû nava dewarê xwe  
Anî goştê gayê xwe  
Danî ber mêvanê xwe

## 4. Pêkenok



## LÊNÛSKA VALA

Dilgeş ji xwendingehê tê malê. Bavê wî jê re dibêje:

-Dilgeş, ka were ez li lênûska te binêrim. We heta niha li xwendingehê çi nivîsîye?

Bavê Dilgeş li lênûska wî dinêre ku lênûsk vikûvala ye. Şaş dimîne û jê dipirse:

-Çima lênûska te wisa vala ye, qey hûn li xwendingehê tiştekî nanivîsin?

Dilgeş:

-Belê bavo em gelek tiştan dinivîsin.

-Naxwe çima lênûska te vala ye?

Dilgeş:

-Dema mamosteyê me tiştên ku li dep nivîsandine jê dibe ez jî ji deftera xwe dibim.

## BEŞA 5. XAÇEPIRS



1

Karê hînbûn û hînkirinê.



2

Lîstikeke stratejîk a ku li ser dep tê lîstin.




3

Cûreyeke kulîlkê ya ku biharê vedibe.



4

Cihê ku tê de îbadet tê kirin.




5

Çêlîya mîyê.



6

Cihê ku nexweş tê de tên dermankirin.



7

Rêyên fireh ku wesayît tê re derbas dibin.



8

Cihê ku perwerdehî lê tê kirin.



## BEŞA 6. NIRXANDIN



### A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Em di kîjan dersê de tiştên bîr û xeyalên xwe bi rengan dixemilînin?

.....

2. Navê çar heb kelûpelên xwendingehê binivîsin.

.....

3. Di xaniyê we de kîjan beş hene? Binivîsin.

.....

4. Di nav komên xwendingeha we de herî zêde kêfa we ji kîjan komê re tê?

.....

5. Li gor we cudahiyeke di navbera gund û bajaran de çi ne?

.....

.....

.....

.....

### B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Em ji pirtûkan gelek tiştan dixwînin û hîn dibin.

( R )

2. Zimanê zikmakî di dursa fen û teknolojiyê de tê hîn kirin.

( )

3. Em di koma nivîskarîyê de hînî lîstikvanîyê dibin.

( )

4. Em li pêjgehê xwarina xwe çêdikin û dixwin.

( )

5. Serjimara gundan ji ya bajaran pirtir e.

( )

**C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.****( muzîkê / pola / bajaran / jûra razanê / jêbirê )**

1. Ez di ..... pêncan de me.
2. Em di darsa .....de kilam û stranan hîn dibin.
3. Em nivîsên xwe bi ..... jê dibin.
4. Nivîn, lihêf û balgeh li .....ne.
5. Li ..... gelek avahîyên bilind, park û bazargehên mezin hene.

**D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?****1. Em bi kîjanê nivîsên xwe dinivîsin?**

- a) bi lînûskê      b) bi pênuşê      c) bi pirtûkê      d) bi nexşeyê

**2. “Ez diçim Xwendingeha Navîn a Mewlana.” Pirsê vê bersivê çi ye?**

- a) Tu di kîjan polê de yî?      b) Tu diçî kîjan xwendingehê?  
c) Li derdora xwendingeha we çi heye?      d) Xwendingeha te li ku ye?

**3. Di kîjan dersê de tiştên erd û deryayî tên hînkirin?**

- a) werziş      b) bîrkarî      c) agahîyên civakî      d) kurdî

**4. “Endamên koma..... hînî reqsên herêmî dibin û di şahîyan de wan pêşkêş dikin.” Valahîya hevokê divê bi kîjan peyvê bê dagirtin.**

- a) folklorê      b) şanoyê      c) kişikê      d) futbolê

**5. Em wateya peyvên jî çi hîn dibin?**

- a) jî lînûskê      b) jî wêneyan      c) jî çente      d) jî ferhengê



Dinleme



Konuşma



Okuma



Yazma


## UNÎTEYA 4. LAŞ Û TENDURISTÎ



### AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Li gor wêneyên jorîn naveroka unîteyê dibe ku çi be?
- 2) Endamên laş çi ne? Bibêjin.
- 3) Têkilîya paqijî û nexweşîyê çi ye? Bibêjin.
- 4) Ji bo hûn nexweş nekevin divê hûn çi bikin? Bibêjin.

## BEŞA 1. ENDAMÊN LAŞ





**Endamên Ser**


çav, guh, enî, birû, poz,  
dev, çene, dêm, lêv,  
ziman, kezî, mijang, bisk

**Endamên  
Ling û Milan**

pê, panî, gûzek, çok,  
ran, tilî, dest, enîşk, mîl

**Endamên Gewdeyê**

zik, sîng, qirik, patik


**Çalakîya 1.**

Li binê wêneyên jêrîn navên wan binivîsin.

birû / lêv / guh / pê / poz / dest / çav / por / dev / çok / tilî / mijang



1.....



2.....



3.....



4.....



5.....



6.....



7.....



8.....



9.....



10.....



11.....



12.....



## Çalakîya 2.

Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Kîjan endamekî ser e?

- a) panî                      b) ran                      c) dêm                      d) tilî

2. Kîjan endamekî ling û milan e?

- a) enîşk                      b) poz                      c) guh                      d) enî

3. Kîjan endamekî gewdeyê ye?

- a) sîng                      b) bisk                      c) dêm                      d) ran

4. Kîjan ne endamekî ser e?

- a) çene                      b) mijang                      c) gûzek                      d) dev

5. Kîjan ne endamê ling û milan e?

- a) dest                      b) kezî                      c) tilî                      d) pê


6. Kîjan ne endamê gewdeyê ye?

- a) zik                      b) patik                      c) qirik                      d) birû




## ENDAMÊN LAŞ DIAXIVIN

Ez guh im. Hûn  
bi min denga  
dibihîzin. Dema  
ku we serê xwe  
şûst divê hûn  
min ziwa bikin  
û hay ji paqijîya  
min hebin.



Ez poz im. Hûn  
bi min bêhnna  
dikin, nefesê didin  
û distînin. Divê  
hûn bi desmalên  
hîjyenîk min paqij  
bikin.



Em diran in.  
Hûn bi me  
xwarinê dicûn.  
Em sih û du  
heb in. Divê  
hûn me paqij  
bigirin û her roj  
me firçe bikin.



Ez ziman im. Hûn  
bi min çêja xurek û  
vexurekan his dikin.  
Ji bo ku hûn zererê  
nedin min divê hûn  
tiştên pir germ û pir  
cemidî nexwin û  
venexwin.



Em çav in. Hûn bi me derdora xwe û dîmenên  
xweş dibînin. Ku hûn demeke dirêj li televîzyon  
û kompîturê binêrin em zererê dibînin. Divê hûn  
hay ji me hebin û me ji toz û dûmanê biparêzin.

## Çalakîya 3.

Li gor agahîyên jorîn hevok û peyvên hevok bikin.

1. Hûn bi me xwarinê dicûn. Em sih û du heb in.
2. Hûn bi min çêja xurek û vexurekan digirin.
3. Hûn bi me derdora xwe û dîmenên xweş dibînin.
4. Hûn bi min bêhnna dikin, nefesê didin û distînin.
5. Hûn bi min denga dibihîzin.

çav  
poz  
guh  
ziman  
**diran**

Helbest



## ENDAMÊN LAŞÊ ME

Endamên laş kîjan in?  
Em bi hev re hîn bibin  
Erkên endaman çi ne?  
Kîjan kar bi wan dibin?



Endamên laş va ev in  
Divê hûn baş zanibin  
Dê û poz, dev û ziman  
Ser û sîng û pê û ran



Guhên me pir nazik in  
Gelek tiştan seh dîkin  
Ji bo dîmen û rengan  
Çavên xwe ji bîr nekin

Du mil û du destên me  
Peywirên wan zêde ne  
Bisk û mijang û çene  
Çok, por û zik jî hene

Tilî, pêçî û zend in  
Digel wan birh û lêv in  
Panî, gûzek jî hene  
Ew çiqas bihuner in.

**(Komîsyon)**



## BEŞA 2. PAQIJÎYA LAŞ



Hevpeyvîn

## PAQIJÎ

**Mamoste:** Zarokino, mijara dersa me paqijîya laş e. Girîngîya paqijîya laş çi ye?  
Hûn dikarin hinekî ji me re behs bikin.

**Berfîn:** Paqijîya laş ji bo tenduristîyê gelekî girîng e. Eger em hay ji paqijîya xwe hebin em zû bi zû nexweş nakevin.

**Mamoste:** Belê, rast e. Gelo ji bo paqijîya laş hûn çi dikin?

**Dildar:** Ez berî xwarinê û piştî xwarinê dest û rûyê xwe dişom.

**Gulsûm:** Ez birêkûpêk porê xwe şeh dikim.

**Mihemed:** Ez herî kêr heftayê du caran serê xwe dişom.

**Mizgîn:** Ez sibeh û êvaran diranên xwe firçe dikim.

**Mehmûd:** Ez nahêlim neynûkên min zêde dirêj û qirêj bibin.

**Gulistan:** Ez şimik, pêjgir, şeh, neynûkbir, firçeya diranan û pêlava xwe bi kesî re parve nakim.

**Mamoste:** Tiştên ku we gotin tev jî rast in, her bijîn zarokino!



Nêçîra Peyvan



neynûkbir



pêlav



şeh



pêjgir

## Çalakîya 1.

Li gor hevpeyvîna jorîn kes û agahîyan hevpek bikin.

1. Ez nahêlim neynûkên min zêde dirêj û qirêj bibin.
2. Ez sibeh û êvaran diranên xwe firçe dikim.
3. Paqijîya laş ji bo tenduristîyê gelekî girîng e.
4. Ez birêkûpêk porê xwe şeh dikim.
5. Ez berî xwarinê û piştî xwarinê dest û rûyê xwe dişom.

Berfîn

Mehmûd

Dildar

Mizgîn

Gulsûm

## Çalakîya 2.

Bi peyvên tevlîhev ên jêrîn hevokên sererast çêbikin.



1

porê/ şeh dikim/ xwe/ Ez  
**Ez porê xwe şeh dikim.**



2

xwe/ser û çavên/Ez/dişom  
 .....



3

Ez/diranên/firçe dikim/xwe/  
 .....



4

neynûkên/jê dikim/xwe/Ez  
 .....

## Çalakîya 3.

Li gor we paqijîya laş çima girîng e?

.....

.....

.....

## Çalakîya 4.

Di jîyana xwe ya rojane de hûn dikarin çi bikin û çi nekin? Ji pola xwe re bibêjin.

## BEŞA 3.

# TENDURISTÎ Û NEXWEŞÎ

### TENDURISTÎ



Serhed kurekî livdar bû, di cihê xwe de nedisekinî. Serhed wê sibehê li hewşa xwendîngehê dilîst. Ket erdê û çoka wî birîndar bû. Mamoste dema dît ku Serhed ket, hat cem wî. Mamosteya wî yeke zana bû. Dît ku çoka Serhed birîndar bûye çû ji hundirê xwendîngehê çenteyê alîkarîya bilez anî. Di nav çenteyê alîkarîya bilez de pembû, meqes, banda pêçanê, çapûtê pêçanê, ava bioksîjen û çend tiştên din hebûn. Mamoste pêşî rewşa birîna wî fam kir û alîkarîya wî kir. Paşî telefonî ambulansê kir û piştî malbata Serhed agahdar kir.

Piştî demeke kurt ambulans hat. Di vê navberê de jî dêya Serhed hatibû. Dêya Serhed hinekî dîlzîz bû lê nehişt ku Serhed pê bihise. Dêya Serhed derbarê parza

û rewşa tenduristîya Serhed de agahî dan tenduristvanan. Tenduristvanan Serhed li ambulansê siwar kir û wan ew bir nexweşxaneyê.

Li nexweşxaneyê bijîşk û xebatkarên tenduristîyê pêşwazîya Serhed kir. Hemû rûken bûn. Bijîşk yekî jêhatî bû. Piştî ku birîna wî derman kir ji Serhed re wiha got:

-Ji bo ku birîna te zû baş bibe divê tu hay ji paqijîyê hebî û birîna xwe di wextê xwe de pansûman bikî.

Serhed:

-Belê, di dersê de em hînî van bûbûn. Mamosteya me derbarê tenduristîyê de hin agahî dabûn me.

Bijîşk:

-Ooo, pir baş e! Wekî din hûn hînî çî bûn?

Serhed:

-Ez dizanim ku ji bo em xwe ji nexweşîyan biparêzin divê em hay ji xwarin û vexwarina xwe jî hebin, paqijîya laşê xwe bikin û werzişê jî piştguh nekin.

-Maşelah, tu çiqas zîrek î! Gelo te tiştek ji bîr nekir?

Serhed:

-Himm, nehate bîra min apê bijîşk.

Bijîşk:

-Ji bo em laşê xwe ji nexweşîyan biparêzin divê em xwe parza bikin.

Serhed:

-Belê, niha hat bîra min. Mamosteya me ji me re gotibû.

Bijîşk:

-Herwiha ji bo tenduristîya xwe divê em çopên xwe neavêjin erdê û derdora xwe paqij bihêlin.


Serhed:

-Spas ji bo van agahîyan.

Bijîşk:

-Spasxweş Serhed can! Xwedê şifaya xêrê bide te.

(Komîsyon)





**Çalakîya 1.**

Hûn wateya kîjan peyvên jêrîn dizanin?  
Nîşan bikin. Peyvên ku hûn wateya wan nizanin jî  
texmîn bikin û binivîsin.

1. hewş ( ) .....
2. birîndar ( ) .....
3. pêşwazîkirin ( ) .....
4. rûken ( ) .....
5. tenduristî ( ) .....
6. bijîşk ( ) .....

**Çalakîya 2.**

Li gor agahîyên jorîn pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Çoka Serhed kengî birîndar bû?  
.....
2. Berî ku mamoste telefonî ambulansê bike çi kir?  
.....
3. Mamosteyê piştî ku alîkarîya Serhed kir kî agahdar kir?  
.....
4. Serhed bi ambulansê çû ku?  
.....
5. Bijîşk çi anî bîra Serhed?  
.....

**Çalakîya 3.**

Li gor agahîyên jorîn di çenteyê alîkarîya bilez de çi  
hene? Nîşan bikin.

- |                |                     |                      |
|----------------|---------------------|----------------------|
| 1. pembû ( + ) | 4. meqes ( )        | 7. çapûtê pêçanê ( ) |
| 2. lênûsk ( )  | 5. banda pêçanê ( ) | 8. pirtûk ( )        |
| 3. nexşe ( )   | 6. rastkêş ( )      | 9. ava bioksîjen ( ) |

**Çalakîya 4.**

Taybetîyên kesên jêrîn li gor çîrokê hevrû bikin û  
navên wan li ber taybetîya guncan binivîsin.

Serhed / bijîşk / mamoste / dêya Serhed

| Taybetî | Kes |
|---------|-----|
| zana    |     |
| jêhatî  |     |

| Taybetî | Kes |
|---------|-----|
| livdar  |     |
| dilzîz  |     |

## ALÎKARÎYA BILEZ



1

**Meqes** bi kêrî jêkirina  
çapûtê pêçanê tê.



2

**Pembû** bi kêrî paqijkirina birînê tê.



3

**Çapûtê birînê** bi kêrî  
sergirtina birînê tê.



4

**Ava bioksîjen** bi kêrî kuştina  
mîkroban tê.



5

**Çapûtê pêçanê** bi kêrî pêçana  
birînê tê.




6

**Banda pêçanê** bi kêrî girêdana  
çapûtê pêçanê tê.

## Çalakîya 5.

Navên alavên di çenteyê alîkarîya bilez de li binê wêneyên wan binivîsin.



1.....



2.....



3.....



4.....



5.....



6.....

## Çalakîya 6.

Valahîyên jêrîn dagirin.

**Ava bioksîjen/ Pembû/ Çapûtê birînê/ Meqes/ Çapûtê pêçanê/ Banda pêçanê**

1. .... bi kêrî girêdana çapûtê pêçanê tê.

2. .... bi kêrî pêçana birînê tê.

3. .... bi kêrî kuştina mîkroban tê.

4. .... bi kêrî sergirtina birînê tê.

5. .... bi kêrî jêkirina çapûtê pêçanê tê.

6. .... bi kêrî paqijkirina birînê tê.

## BEŞA 4. ZARGOTIN



## 1. Pêkenok



## HER DERÊ MIN DIÊŞE

Mirovek diçe cem bijîşk û jê re dibêje:

-Ezbenî, ez gelekî nexweş im. Her derê laşê min diêşe.

Bijîşk laşê wî miayene dike. Destê xwe dide ku derê, mirovê nexweş dibêje:

-Na, ew der naêşe.

Bijîşk xwe hinekî aciz dike û jê re dibêje:

-Tu nexweşiyên te nînin!

Êdî nexweş xwe aciz dike û tilîya xwe di ser laşê xwe re digerîne û ji bijîşk re dibêje:

-Binêre, ev der diêşe, ev der jî û ev der jî!... Yanî ez destê xwe didim ku derê ew der diêşe. Tu çawa dibêjî tu nexweşiyên te nînin?

Bijîşk şaş dimîne, vê carê destê wî miayene dike. Piştî dikene û jê re dibêje:

-Bira, jixwe tu destê xwe bidî ku derê dê ew der biêşe. Ji ber ku tilîya te şikestî ye.



## 2. Mamik

Odeyek şûştî mûştî, sih û du peya lê rûniştî. Ev çi ye?

Cêwî ne, li kêlek in; ne goşt in, lê nermik in. Ev çi ne, de fam bikin?

Du pencereyên bêderî, bi şev girtî, bi roj vekirî. Ev çi ne?

## 3. Gotinên Xweş

Bingeha hêz û bextewarîyê tenduristî ye.

Tenduristî dayîka dilşadîyê ye.


Ev cîhan yek e, hay jê hebe, qirêj meke.

## 4. Zûgotinok




Şok sabûn,  
Du şo sabûn  
Sê şo sabûn  
Çar şo sabûn  
Pênc şo sabûn  
Şeş şo sabûn

## BEȘA 5. XAÇEPIRS



## BEŞA 6. NIRXANDIN



### A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Navên çar endamên laş binivîsin?

.....

.....

.....

.....

2. Ji bo em nexweş nekevin divê em çi bikin?

.....

3. Di çenteyê alîkarîya bilez de çi hene? Navên çar heban binivîsin.

.....

.....

.....

.....

4. Ji bo tenduristîya laşê xwe divê em kîjan alav û amûrên xwe parve nekin?

.....

5. Gava em nexweş ketin divê em çi bikin?

.....

### B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

- |                                                                |     |
|----------------------------------------------------------------|-----|
| 1. Em bi pozê xwe tiştan bêhn dikin.                           | ( ) |
| 2. Divê em berî xwarinê û piştî xwarinê dest û rûyê xwe bişon. | ( ) |
| 3. Pembû bi kêrî kuştina mîkroban tê.                          | ( ) |
| 4. Meqes bi kêrî jêkirina çapûtê pêçanê û bandê tê.            | ( ) |
| 5. Em bi çavên xwe xwarinê dicûn.                              | ( ) |

**C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.****pêçana / şeh / neynûkbirê / ziman / nexweşîyan**

1. Ez porê xwe birêkûpêk ..... dikim.
2. Ez ..... im. Hûn bi min çêja xurek û vexurekan his dikin.
3. Çapûtê pêçanê bi kêrî ..... birînê tê.
4. Ji bo em xwe ji ..... biparêzin divê em hay ji xwarin û vexwarina xwe hebin.
5. Ez neynûkên xwe bi ..... jê dikim.

**D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?**

1. Birû, lêv, guh, pê û dest endamên çi ne?
 

|           |                    |
|-----------|--------------------|
| a) laş    | b) alîkarîya bilez |
| c) paqijî | d) nexweşî         |
2. Em dîmenên derdora xwe bi çi dibînin?
 

|        |          |
|--------|----------|
| a) guh | b) ziman |
| c) çav | d) diran |
3. Di çenteyê alîkarîya bilez de kîjan tune ye?
 

|                 |          |
|-----------------|----------|
| a) pembû        | b) meqes |
| c) banda pêçanê | d) jêbir |
4. Kîjan ne endamekî laş e?
 

|        |                  |
|--------|------------------|
| a) poz | b) ava bioksîjen |
| c) dêm | d) gûzek         |
5. Kîjan rasterast ne derheqê tenduristîyê de ye?
 

|            |                    |
|------------|--------------------|
| a) telefon | b) paqijî          |
| c) parza   | d) alîkarîya bilez |





Dinleme



Konuşma



Okuma



Yazma

## UNÎTEYA 5.

# XUREK Û VEXUREKÊN ME



### AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Herî zêde kêfa we ji kîjan xwarinan re tê? Bibêjin.
- 2) Herêma we bi kîjan mêwe û sebzeyan navdar e? Bibêjin.
- 3) Dema hûn cilûbergekekî distînin, bi giştî hûn kîjan rengî dibijêrin?

# BEŞA 1. DANÊN XWARINÊ

Hevpeyvîn



## DANÊN XWARINÊ

Îbrahîm ji bo sparteka xwe ya projeyê çêbike çû xwaringeheke ku lê xwarinên malê çêdibin. Ji ber ku sparteka wî derheqê “danên xwarinê” de bû.

**Îbrahîm:** Qewet be xalo!

**Hoste:** Sax bî, kerem bike. Tu dê çi bixwî?

**Îbrahîm:** Na, ez ne ji bo xwarinê hatime. Ez xwendekar im, di pola pêncan de dixwînim. Navê min Îbrahîm e. Mamosteya me spartekek da me. Eger hûn alîkarîya min bikin ez dê kêfxweş bibim.

**Hoste:** Ser çavan, ka bibêje sparteka te çi ye?

**Îbrahîm:** Derbarê danên xwarinê de ye. Eger destûra we hebe ez dê çend tiştan ji we bipirsim.

**Hoste:** Kerem bike Îbrahîm!

**Îbrahîm:** Hûn rojê çend caran xwarinê çêdikin?

**Hoste:** Em rojê sê caran xwarinê çêdikin: Danê sibehê, nîvro û êvarê.

**Îbrahîm:** Tu dikarî navê danên xwarinê û demên wan ji min re bibêjî?

**Hoste:** Belê. Danê sibehê taştê, danê nîvro firavîn û danê êvarê jî şîv tê xwarin.

**Îbrahîm:** Di taştêyê de herî zêde çi tên xwarin?

**Hoste:** Tiştên wekî penîr, zeytûn, hêk, hingiv, nîvişk, dims û to tên xwarin.

**Îbrahîm:** Di firavînê de bi piranî çi tên xwarin?

**Hoste:** Cûreyên wekî goşt, fasûlî, selete, birinc, masî û kutilk tên xwarin.

**Îbrahîm:** Di şîvê de bi piranî çi tên xwarin?

**Hoste:** Tiştên wekî tirşik, savar, şorbe, mast, selete, ispenax û kartolên kelandî.

**Îbrahîm:** Evqas dê bes be. Biborin, min hûn mijûl kirin.

**Hoste:** Xem nake, canê te sax be.

**Îbrahîm:** Nawxe ez rabim. Ji bo van agahîyan gelek spas dikim. Bi xatirê we.

**Hoste:** Oxir be, bi hêvîya serkeftinê.

### Çalakîya 1. Valahîyên jêrîn li gor hevpeyvîna jorîn dagirin.

**agahîyan / destûra / danên xwarinê / alîkarîya / xwarinê**

1. Eger hûn ..... min bikin ez dê kêfxweş bibim.
2. Ji bo van ..... gelek spas dikim.
3. Sparteka Îbrahîm derheqê.....de bû.
4. Em rojê sê caran ..... çêdikin: Danê sibehê, nîvro û êvarê.
5. Eger ..... we hebe ez dê çend tiştan ji we bipirsim.

### Çalakîya 2. Li gor agahîyên jorîn li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Îbrahîm ji bo sparteka xwe çêbike çû xwaringehê. ( )
2. Hoste rojê pênc caran xwarinê çêdike. ( )
3. Di taştêyê de herî zêde goşt, fasûlî, selete, birinc, masî û kutilk tên xwarin. ( )
4. Îbrahîm di pola pêncan de dixwîne. ( )
5. Danê sibehê taştê, danê nîvro firavîn û danê êvarê jî şîv tê xwarin. ( )



## BEŞA 2. DANASÎNA XUREK Û VEXUREKÊN ME

### KAMPA ŞOPGERÎYÊ

Çend xwendekar di betlaneya havînê de ji bo kampa şopgerîyê çûbûn Sinopê. Di şeveke sayî de li bin stêrkan li dora agirekî gur li hev civîyabûn. Bi hev re diaxivîn û henek li hev dikirin. Sohbeteke pir germ bû.

**Ronî** ji hevalên xwe re got:

-Xwezî niha zebeşekî gundê me li vir bûna û me bi hev re dabûna ber gezan. Ji ber ku zebeşên gundê me pir xweş û navdar in.

**Seyidxan** jî wisa got:

-Li ber wî zebeşî penîrê bisîrik yê zozanên me dê çiqas xweş be.

**Sadiq** li ser vê axaftinê got:

-Na, na. Xwezî çend kîlo zerdalîyên bajarê me hebûna. Malatya bi zerdalîyên xwe pir navdar e.

**Dilgerm** rabû ji pêya û teklîfeke wiha li hevalên xwe kir:

-Naxwe hevalino werin her yek ji me bila navê xurek û mêweyên navdar ên bajarê xwe bibêje.

**Bilal**: Ez ji Erzurumê me û kebaba caxê li bajarê me navdar e.

**Emîn**: Ez Batmanî me û dimsa bajarê me pir xweş û navdar e.

**Bawer**: Ez ji Kahramanmaraşê me. Qeşîra bajarê me pir xweş e û li her derê tê nasîn.

**Serdar**: Hevalino, bajarê min jî Siirt e û ev der bi parêvê navdar e. Herwiha fistiqên wê jî pir xweş in û li her derê tên nasîn.

**Ciwan**: Ez jî ji Mardinê me û gilyazên Mardinê pir xweş û navdar in.

**Îdrîs**: Ez jî ji Hakkariyê me. Hingivê bajarê me gelekî xweş e û li her deverê tê nasîn.

(Komîsyon)





**Çalakîya 1.**

Peyvên ku hûn wateya wan dizanin nîşan bikin.  
Ji bo peyvên ku hûn nizanin jî li ferhengê binêrin û  
wateya wan binivîsin.

1. betlane ( ) .....
2. şopgerî ( ) .....
3. sayî ( ) .....
4. sîrik ( ) .....
5. stêrk ( ) .....
6. gur ( ) .....

**Çalakîya 2.**

Hûn jî wekî mînakên jerîn bi peyvan hevokan çêbikin  
û ji pola xwe re bibêjin û binivîsin.

1. betlane-havîn: Çend xwendekar di betlaneya havînê de çûn Sinopê.
2. kamp-şopgerî: Kampa şopgeriyê xweş derbas bû.
3. dor-agir: .....
4. zebeş-gundê me: .....
5. kebab-cax: .....
6. dims-bajarê me: .....
7. bajar-min: .....
8. heval-xwe: .....

**Çalakîya 3.**

Hûn jî tiştên ku li bajarê we navdar in ji pola xwe re  
bibêjin û binivîsin.

.....

.....

.....

.....

.....

.....

## XWARINÊN ME



## Çalakîya 4.

Navên xwarinan bi wêneyên li binê wan re hevîk bikin.

1. pelên pêçayî  
( )

2. kutilk  
( )

3. goştê biraştî  
( )

4. tirşik  
( )

5. mehîr  
( )



a



b



c



d




e

## Çalakîya 5.

Hûn jî navên çar xwarinan binivîsin.

1. ....
2. ....
3. ....
4. ....

## VEXUREKÊN ME



## Çalakîya 6.


Navên vexurekan bi wêneyên li binê wan re hevîyek bikin.

1. ava sûsê  
( )

a

2. dew  
( )

b

3. avmêwe  
( )

c

4. şîr  
( )

d

5. xweşav  
( )


e

## Çalakîya 7.

Hûn jî navên çar vexurekan binivîsin.

1. ....
2. ....
3. ....
4. ....

## PÊXWARINÊN ME



## Çalakîya 8.

Navên pêxwarinan bi wêneyên jêrîn re hevpek bikin.

1. nîvîşk

( )

2. dims

( )

3. to

( )

4. hingiv

( )

5. lorik


( )



a



b



c



d



e

## Çalakîya 9.

Hûn jî navên çar pêxwarinan binivîsin.

1. ....
2. ....
3. ....
4. ....



## BEŞA 3. MÊWE Û SEBZE

## MÊWE



zebeş



gilyaz



fistiq



sêv



tirî



zerdalî



behîv



bihok



xox



petîx



gûz



incas



hirmî



tû



hinar



hejîr

## Çalakîya 1.

Li binê wêneyên jêrîn navên wan binivîsin.



1.....



2.....



3.....



4.....



5.....



6.....



7.....



8.....



9.....



10.....



11.....



12.....

## SEBZE



firingî



bacana reş



dolmik



îsot




bexdenûs



kartol



xiyar



gêzer



pîvaz



sîr



kelem



tivir

## Çalakîya 2.

Li binê wêneyên jêrîn navên wan binivîsin.



1.....



2.....



4.....



5.....



3.....



6.....

## LI BAZARÊ



1

Qewet be birayê mêwefiroş,  
kîloya firingîyan bi çiqasî ye?

1

Xwedê ji te razî be xwişka min.  
Kîloya wan bi du lîre û nîvan e.

2

Na bira, na! Pir biha ye.  
Duh min bi du lîreyan kirîbû.

2

Ew duh bû xwişka min. Li halê  
her tişt biha bûye. Firingîyên  
min ji yê xelkê erzantir in.

3

Rast e, lê bazar helal e. Eger tu  
bi du lîreyan bidî min ez dê bibim.

3

Bila canê te sax be.  
Were ji xwe re bibe.

## Çalakîya 3.

Valahîyên jêrîn li gor hevpeyvîna jorîn dagirin.

**lîreyan / erzantir / çiqasî / bazar / biha/ bi du lîre û nîvan**

1. Kîloya firingîyan bi ..... ye?
2. Kîloya wan ..... e.
3. Duh min bi du ..... kirîbû.
4. Li halê her tişt ..... bûye.
5. Rast e, lê ..... helal e.
6. Firingîyên min ji yê xelkê ..... in.



## ÇÊJ

Hingiv




Hingiv şîrîn e.

Xwê



Xwê şor e.

Îsot



Îsot tûj e.

Berû



Berû tahl e.

Tirş



Simaq tirş e.

## Çalakîya 4.

Çêj û wêneyan hevîyek bikin.

tirş

tûj

şîrîn

tahl



dîms

dendikên  
qehweyê

lîmon



pîvaz

## BEŞA 4. RENG



## Çalakîya 1.

Li binê rengên jêrîn navên wan binivîsin.




1.....



2.....



3.....



4.....



5.....



6.....

## Çalakîya 2.

Rengên mêwe û sebzeyên jêrîn ji pola xwe re bibêjin û binivîsin.



1.....



2.....



3.....



4.....



5.....

## Helbest



## RENG

Di vê cîhana me de  
Her tişt bi rengê xwe ye  
Tê hezkirin di dil de  
Her tişt bi rengê xwe ve

Sêva sor û gula sor  
Xecxecokan girte dor  
Gilyaz, tûerd, firingî  
Çi xweş in bi vî rengî

Tava zer û gilover  
Ronî dike her dever  
Lîmon, bihok, gulberoj  
Rengezer in wekî roj

Rengê deryayê ye şîn  
Jê ye gerestêrka şîn  
Xweşik e şînê çavan  
Wekî rengê morîkan

Zebeş e, dendik reş e  
Zeytûna reş çi xweş e  
Dinya reş e bi şevan  
Çiqas xweş e bêhnvedan

Pîvaz, îsot û xiyar  
Şînayî, gîya û dar  
Pelên wan ên wekî bask  
Xweşik in bi rengê kesk

Spî ye, paqijî ye  
Rengê şeker û xwê ye  
Zivistana seqemî  
Berfa spî xweş dikî

(Komîsyon)

## Nêçîra Peyvan



xecxecok



tûerd



gulberoj



morîk



## Çalakîya 3.


Hest û ramanên ku bi vê helbestê bi we re çêbûn  
ji hevaleke/hevalekî xwe re vebêjin.

## Çalakîya 4.

Navên tiştên jêrîn û rengên wan hevrek bikin.

1. lîmon
2. xiyar
3. firingî
4. berf
5. derya
6. zeytûn

- sor  
reş  
şîn  
zer  
kesk  
spî



## BEŞA 5. ZARGOTIN



## 1. Mamik

Xanîyekî gilover û spî, bêpace û bêderî, tê de rûniştiye bûkeke zerî.  
Ev çi ye?

Goga min a sor, tê de hene heft çermên spî bi dor. Ev çi ye?

Mamikê mino, laşê wê reş e, serê wê kesk e, dilê wê spî ye. Ev çi ye?

Ji devehê bilindtir e, xwarina wê ji hingivî xweştir e, şîrê wê ji jehrê  
nexweştir e, tovê wê ji kuncî hûrtir e. Ev çi ye?

Mamikê mino, ji caran carekê, ji yekê derket hezarekê. Ev çi ye?

## 2. Gotinên Pêşîyan

Zebeş bi dengê xwe, hinar bi rengê xwe...

Xwarin bi hevalan re xweş tê xwarin.

Mastê payîzan bidin ezîzan.

Nanê êvarê bihêle sibê, şixulê êvarê nehêle sibê.

## Çalakîya 1.

Devê pirtûkên xwe bigirin. Gotinên pêşîyan ên jorîn  
ji mamosteyê xwe guhdarî bikin û li lênûska xwe  
binivîsin.



## 3. Pêkenok



## TE TIŞTEK JI MIN RE NEHIŞT

Du şivan li ser xweşbûn û tamdarîya xwarinê sohbet dikin. Yek ji yê din dipirse:

-Li gor te xwarina herî xweş kîjan e?

Hevalê wî wiha bersiva wî dide:

-Bi serê min û bi serê te, di dinyayê de ji pîvazê xweştir tişteke tune ye.

Piştî vê bersivê herdu hinekî bêdeng dimînin. Paşê xwedîyê bersivê ji yê din dipirse:

-Min a xwe got. De ka tu bibêje, tu ji kîjan xwarinê hez dikî?

Yê din bi hêrs got:

- Malnexirab, ma te tişteke ji min re hişt ku ez bibêjim!



## BEŞA 7. NIRXANDIN



### A) Pirsên jêrîn bibersivîn.

1. Navên danên xwarinê binivîsin.

.....

2. Navên çar mêweyan binivîsin.

.....

3. Navên çar sebzeyan binivîsin.

.....

4. Navên sê xwarinên ku li herêma we navdar in binivîsin.

.....

5. Herî zêde kêfa we ji kîjan rengan re tê? Binivîsin.

.....

### B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyê “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Zerdalîyên herî xweş li Malatyayê çêdibin.

( )

2. Gilyazên Erzurumê gelekî navdar in.

( )

3. Ji xwarina êvarê re firavîn tê gotin.

( )

4. Şîr, dew, çay, ava sûsê û avmêwe vexurek in.

( )

5. Bacana reş, dolmîk, gêzer, kelem û tivir sebze ne.

( )

### C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

**pêxwarin / şîvê / caxê / taştê / Batmanê**

1. Ji xwarina sibehê re..... tê gotin.

2. Dimsa ..... pir xweş û navdar e.

3. Hingiv, dims, lorik û penîr .....in.

4. Tiştên wekî tirşik, savar, şorbe, mast, selate, ispenax û kartolên kelandî di  
..... de tên xwarin.

5. Kebaba .....li Erzurumê navdar e.

**D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin.****1. Xwarina ku nîvro tê xwarin kîjan e?**

- a) taştê                      b) firavîn                      c) şîv                      d) paşîv

**2. Rengê kîjanê çewt hatiye dayîn?**

- a) mast- mor                      b) pembû-spî                      c) derya-şîn                      d) roj-zer

**3. Kîjan ne pêxwarinek e?**

- a) to                      b) nîvişk                      c) birinc                      d) mast

**4. Kîjan ne mêwe ye?**

- a) xox                      b) incas                      c) gûz                      d) firingî

**5. Ji wêneyên jêrîn kîjan ê vexurekekê ye?**

- a) tirî                      b) hêk                      c) dew                      d) zebeş







Dinleme



Konuşma



Okuma



Yazma

## UNÎTEYA 6. SALNAME Û DEMSAL



### AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Herî zêde kêfa we ji kîjan demsalê re tê, çima?
- 2) Hûn saet di çendan de radizin?
- 3) Cilûbergên me li gor demsala çima diguherin?

## BEŞA 1. DEMSAL Û MEH

SALEK

4 demsal e.  
12 meh e.52 hefte ye.  
365 roj û 6 saet e.

Demsalek 3 meh e.

## BIHAR



ADAR → NÎSAN → GULAN

## HAVÎN



HEZÎRAN → TÎRMEH → TEBAX

## PAYÎZ

ÎLON → ÇIRÎYA PÊŞÎN →  
ÇIRÎYA PAŞÎN

## ZIVISTAN

KANÛNA PÊŞÎN → KANÛNA  
PAŞÎN → SIBAT

1 Kanûna  
2 Paşîn  
3 Sibat  
4 Adar  
5 Nîsan  
6 Gulan


6 Hezîran



7 Tîrmeh  
8 Tebax  
9 Îlon  
10 Çirîya Pêşîn  
11 Çirîya Paşîn  
12 Kanûna Pêşîn

Çalakîya 1.

Devê pirtûkên xwe bigirin. Navên mehan ji mamosteyê xwe guhdarî bikin û li lênûska xwe binivîsin.



## SOHBETA DEMSALAN

**Bihar:** Navê min bihar e. Dema ez têm, gul û gîya şîn dibin. Dar, kulîlkên xwe vedikin. Alûtîrşk û behîvterk çêdibin. Mirov cilên stûr ji xwe dikin û hêdî hêdî cilên tenik ji dolaban derdixin lê carinan sîwanan jî bi kar tînin. Hêdî hêdî sobeyan radikin û kalorîferan vedimirînin.

**Havîn:** Navê min havîn e. Dema ez têm hewa germ dibe. Mêwê û sebze pir zêde dibin. Mêweyên wekî zebeş, petîx, zerdalî, gilyaz û hejîran çêdibin. Mirov tenê cilên tenik li xwe dikin. Dema derdikevin ber tavê hin mirov şewqeyan didin serê xwe. Li hin deveran jî ber germê mirov li ser banan radizin. Êdî sîwanan jî bo tavê bi kar tînin.

**Payîz:** Navê min payîz e. Dema ez têm gîya zer dibe û pelên daran diweşin. Hewa hêdî hêdî hênîk dibe. Tirî, incas û gûz çêdibin. Mirov dest bi cotkirina zevîyan û çandinîyê dikin. Hin mirov jî bo amadehiya zivistanê êzingan û komirê dikirin. Hêdî hêdî cilên stûr ji dolaban derdixin û yên tenik dihilînin.

**Zivistan:** Navê min zivistan e. Dema ez têm, serma zêde dibe û carinan berf dibare. Dema berf dibare zarok kalê berfê çêdikin. Sêv, pirteqal û lîmon çêdibin. Mirov sobeyên xwe datînin an jî kalorîferên xwe pêdixin û xwe li ber germ dikin. Tenê cilên stûr wekî sako û qazaxan li xwe dikin û botan dixin pêyên xwe. Bi kumên stûr xwe jî sermayê diparêzin.



## Çalakîya 2.

Derheqê demsal û rewşên hewayê de tiştên ku hûn dizanin ji pola xwe re bibêjin. Di axaftina xwe de peyvên wekî “û, lewra, lê” jî bi kar bînin.

## Çalakîya 3.

Valahîyan li gor agahîyên jorîn dagirin.

salek / biharê / **havînê** / payîzê / zivistanê

1. Di demsala **havînê** de hewa germ e.
2. .... 365 roj û 6 saet e.
3. Di demsala ..... de serma zêde dibe û carinan berf dibare.
4. Di demsala ..... de gul û gîya şîn dibin.
5. Îlon, çirîya pêşîn û çirîya paşîn mehên demsala ..... ne.

## Çalakîya 4.

Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Di her demsalekê de çar meh hene. ( Ç )
2. Hezîran, tîrmeh û tebax mehên payîzê ne. ( )
3. Salek duwazdeh meh e. ( )
4. Di demsala payîzê de gîya zer dibe û pelên daran diweşin. ( )
5. Mehek 40 roj e. ( )

## Çalakîya 5.

Agahîyan û demsalên jêrîn hevîyek bikin.

1. Gîya zer dibe û pelên daran diweşin. **Bihar**
2. Hewa germ dibe. Mêwê û sebze pir zêde dibin. **Havîn**
3. Serma zêde dibe û carinan berf dibare. **Payîz**
4. Gul û gîya şîn dibin, dar kulîlkan vedikin. **Zivistan**

## Çalakîya 6.

Peyvên jêrîn li gor demsalan bi cih bikin.

**bot / cilên tenik / cilên stûr / kumên stûr /  
kalê berfê / sobe û kalorîfer / zebeş û petîx**

Havîn

.....  
.....  
.....  
.....

.....  
.....  
.....  
.....

Zivistan



## BEŞA 2. DEMSAL Û REWŞÊN HEWAYÊ

Helbest



### ÇAR DEMSAL

Bihar hat xemilî cîhan  
Belav bû bêhna kulîlkan  
Va vejîn dîsa dar û ber  
Şîn bûn gîyayên hişk û zer

Havîn e binavûdeng e  
Sirûşt rind e cûrereng e  
Bixwin zarok, jin û zilam  
Sebze û fêkîyên xweştam

Pelên zer weşîn, payîz e  
Demsalek xweş e, ezîz e  
Kêm nabe bahoze û teyrok  
Ba û baran û bablîsok

Berfedims, berfemêr, kaşûn  
Hemû zarok pevra şabûn  
Demsalek sar e zivistan  
Çîkspî dibe deşt û zozan

(Komîsyon)

## REWŞÊN HEWAYÊ



Hewa sayî ye.



Hewa ewrî ye.



Berf dibare.



Baran dibare.



Teyrok dibare.




Ba tê.

**Çalakîya 1.**

Li gor wêneyên jêrîn rewşa hewayê binivîsin.

(Hewa sayî ye. / Hewa ewrî ye. / Ba tê. /  
Teyrok dibare. / Berf dibare. / Baran dibare.)



1) .....



2) .....



3) .....



4) .....



5) .....



6) .....


**Çalakîya 2.**

Îro rewşa hewayê çawa ye? Ji hevalên xwe re bibêjin.



## BEŞA 3. HEFTE

## ROJÊN HEFTEYÊ



- 1 Duşem
- 2 Sêşem
- 3 Çarşem
- 4 Pêncşem
- 5 În
- 6 Şemî
- 7 Yekşem

## Çalakîya 1.

Rojan bi rêzê binivîsin.

1. Duşem
2. ....
3. ....
4. ....
5. ....
6. ....
7. Yekşem




## HEFTEYEKE ROJÎNÊ



Navê min Rojîn e. Ez dixwazim behsa hefteyeke xwe ji we re bikim. Roja **duşemê** dersên me yên xwendîgehê dest pê dîkin. Piştî dersan kursa me ya muzîkê dest pê dike. Me koroyek ava kiriye û em di vê koroyê de stranan dibêjin.



Li nêzî mala me hewzek heye. Ez û hevalên xwe roja **sêşemê** li wir hînî avjenîyê dibin. Roja **çarşemê** jî li dibistanê kursa me ya folklorê heye. Em tê de hînî reqsên herêmî dibin. Me bi hinek hevalan re koma xwendinê ava kiriye. Piştî ku em heman pirtûkê dixwînin em her **pêncşem** tîn cem hev û derbarê vê pirtûkê de diaxivin.



Li dibistana me koma kişîkê jî heye. Ez roja **înê** diçim tevî vê komê dibim û bi hevalên xwe re bi kişîkê dilîzim. Roja **şemî** û **yekşemê** betlane ye. Em carinan bi malbatî diçin seyran, şano yan jî sînemayê; carinan jî diçin serdana pismam û xizmên xwe yên din. Hin caran jî ez bi hevalên xwe re lîstîkên cûrbicûr dilîzîm.

(Komîsyon)



## Çalakîya 2.

Valahîyan li gor agahîyên jorîn dagirin.

folklorê / stranan / xwendinê / muzîkê / bi malbatî / hewzek


1. Roja duşemê piştî dersan kursa me ya muzîkê dest pê dike.
2. Em carinan ..... diçin seyran, şano yan jî sînemayê.
3. Li nêzî mala me ..... heye. Ez û hevalên xwe roja sêşemê li wir hînî avjenîyê dibin.
4. Me koroyek ava kiriye. Em di koroyê de .....dibêjin.
5. Me bi hinek hevalan re koma .....ava kiriye. Em bi hev re heman pirtûkê dixwînin.
6. Roja çarşemê jî li dibistanê kursa me ya..... heye. Em tê de hînî reqsên herêma dibin.

## Çalakîya 3.

Roj û çalakîyên Rojînê hevîk bikin.

1. Rojîn diçe kursa folklorê. ( ) î
2. Ew û hevalên xwe tîn cem hev û derbarê pirtûka xwendinê de diaxivin. ( ) çarşem
3. Dersên xwendingehê dest pê dikin. ( ) duşem
4. Rojîn û hevalên xwe hînî avjenîyê dibin. ( ) pêncşem
5. Rojîn diçe tevî koma kişikê dibe û bi hevalên xwe re bi kişikê dilîze. ( ) sêşem

## DANÊN ROJÊ



## Çalakîya 4.

Derbarê danên rojê de bi hevîk/hevîkî xwe re biaxivin.

## BEŞA 4. SAET



Hevpeyvîn

## SAETA RAZANÊ

**Xetîce:** Roj baş mamoste. Biborin ez dereng mam.

**Mamoste:** Roj baş Xetîce. Tu bi xêr hatî. Gelo tu çima dereng mayî?

**Xetîce:** Mamoste ji ber ku duh bi şev saet di duwazdehê şevê de yanî dereng raketim, sibehê ez di xew de mam.

**Mamoste:** Naxwe tu dizanî ji bo ku em ji xwendingehê dereng nemînî divê em çi bikin?

**Xetîce:** Belê mamoste, ji bo ku em dereng nemînî divê em zû razin.

**Mamoste:** Sihet xweş Xetîce! Ez hêvî dikim tu careke din dereng namînî.

**Xetîce:** Înşelah ez êdî dereng ranazim û ez dê biwext bêm dersê.

**Mamoste:** Zarokino divê hûn herî dereng heta kengî şîyar bimînî?

**Ehmed:** Mamoste, divê herî dereng em saet di yazdehê şevê de rakevin.

**Selma:** Mamoste, yazdeh jî dereng e. Divê em berî saet dehê şevê razin.

**Kamûran:** Eger ez dehê şevê rakevim, roja din sibehê zû şîyar nabim û bê taştê tîm xwendingehê.

**Mamoste:** Kamûran tiştêkî pir girîng got. Zarokino de ka bibêjin, çima divê hûn bê taştê neyên xwendingehê?

**Aram:** Mamoste, taştê ji bo tenduristîya me pir girîng e. Eger em bê taştê bîm xwendingehê em nikarin guhê xwe baş bidin dersên xwe.

**Mamoste:** Naxwe divê herî dereng em kengî razin?

**Heyder:** Mamoste, divê herî dereng em saet di neh û nîvê şevê de razin.

**Mamoste:** Her bijî Heyder! Te rast got. Tu ji ku derê hîn bûyî?

**Heyder:** Ez ji mamosteyên xwe û hişyarîyên ekrana televîzyonê hîn bûm.



**Çalakîya 1.****Hevokên jêrîn û navan li gor hevpeyvînê hevpek bikin.**

1. Belê mamoste, divê herî dereng em saet di yazdehê şevê de rakevin. ( ) Kamûran
2. Ez ji mamosteyên xwe û hişyarîyên ekrana televîzyonê hîn bûm. ( ) Selma
3. Mamoste, taştê ji bo tenduristîya me pir girîng e. ( ) Ehmed
4. Eger ez dehê şevê rakevim, roja din sibehê zû şîyar nabim. ( ) Aram
5. Mamoste, yazdeh jî dereng e. Divê em berî saet dehê şevê razin. ( ) Heyder
6. Kamûran tiştêkî pir girîng got. ( ) Xetîce
7. Roj baş mamoste. Biborin ez dereng mam. ( ) mamoste

**Çalakîya 2.****Valahîyan li gor agahîyên jorîn dagirin.****xwendingehê / dereng / Biborin / xew / taştê / divê**

1. Sibehê ez di .....de mam.
2. Mamoste, .....ji bo tenduristîya me pir girîng e.
3. Divê hûn bê taştê neyên .....
4. Roj baş mamoste. .... ez dereng mam.
5. Înselê ez êdî ..... ranazim.
6. Mamoste, ..... em herî dereng saet di neh û nivê şevê de razin.

**Çalakîya 3.****Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.**

1. Taştê ji bo tenduristîya me pir girîng e. ( )
2. Ê ku ji xwendingehê dereng dimîne Ehmed e. ( )
3. Ji bo ku em dereng nemînin divê em zû razin. ( )
4. Divê herî dereng em saet di neh û nivê şevê de razin. ( )
5. Heyder agahîyên saeta razanê ji hevalên xwe hîn bûye. ( )



## SAET ÇEND E?



Saet pênc e.



Saet çar û nîv e.



Saet sê û çaryek e.




Saet şeş û pênc deqe ye.



Saet ji heştan re  
çaryek maye.  
(Saet heşt kêr çaryek e.)



Saet ji nehan re  
bîst deqe maye.  
(Saet neh kêr bîst deqe ye.)



Saet heşt û nîv e.



Saet dehê şevê ye.

Saet neh û bîst û  
pênc deqe ye.

## Çalakîya 4.

Li gor we çima divê em biwext razin? Binivîsin.

.....

.....

## Çalakîya 5.

Saetên wêneyên jêrîn li valahîyan binivîsin.



1



2



3

Saet deh û nîv e.

12:20

01:55

09:45

4

5

6

11:25

06:52

12:15

7

8

9

## Çalakîya 6.

Niha saet çend e? Ji hevaleke/hevalekî xwe bipirsin.

## Çalakîya 7.

Saetan hevyekek bikin.



1 Saet sê ye.

2 Saet şeş e.

3 Saet deh û nîv e.

4 Saet çar û nîv e.

5 Saet heft e.

6 Saet neh e.

7 Saet çar e.

8 Saet yazdeh e.

9 Saet yek e.

10 Saet pênc û nîv e.

## BEŞA 5. ZARGOTIN



## 1. Mamik

Tiştekî min heye. Sar e, bêdeng e, ne xuya ye, nayê girtin, bêreng e.  
Ev çi ye?

Hûr hûr barî, hey hey barî, deşt û banî, her çar alî, girt û danî.  
Ev çi ye?

Çar bira ne, çar dîyar; yek germ e, yek hênîk, yek şilî ye, yek sar.  
Ev çi ne?

Roja navî, şeva navî, heft bira li pey hev direvî. Ev çi ne?

## 2. Xeberoşkên Mehan

Xwezî bi dehê kanûnê, berê xwe dide sosin û beybûnê.

Sibat tiroviro, adar ma bîst û du ro.

Adar e sibehê sar e, nîvro bihar e.

Nîsan e, bûka salan e.

Gulan e, şingêna dasan e.

Hezîran e, dema das û taran e.

Temûz e, kakil kete gûz e.

Heyva tebaxê, tirî kete miştaxê.



## 3. Ji Adetên Me



**BÛKA BARANÊ**

Hin salan baran û şîlî kêr dibare. Di van deman de ji bo baran bibare û bereket zêde bibe zarok li hev dicivin û bûka baranê digerin. Zarok ji potikan bûkekê çêdikin û dixemilînin û vê bûkê bi serê darekî dirêj ve dikan. Piştî vê bûkê di kuçê û kolanan de digerin û diçin mala her kesî. Dema zarok bûka baranê digerin dûrik û stranan jî di ber re dibêjin û kêf û şahîyê dikan. Zarok ji malan jî bo xwe xurekên wekî rûn, savar, birinc didin hev û diçin malekê li hev dicivin. Van tiştên ku berhev kirine li wir bi kebanîya malê didin çêkirin û bi hev re dixwin. Piştî jî ji bo baran bibare bi hev re diayan dikan. Dema ku bûka baranê digerin hin dûrikan dibêjin. Yek ji wan dûrikan jî ev e:

**DÛRIKA BÛKA  
BARANÊ**

Bûka me baran dixwaze  
Golîka me gîya dixwaze  
Rebî tu baranê bidî  
Mal û milkan tu av bidî

## BEŞA 6. XAÇEPIRS



## BEŞA 7. NIRXANDIN



### A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Navên demsalan binivîsin.

.....

2. Rojên heftêyê li gor rêzê binivîsin.

.....

3. Demsala herî germ kîjan e? Binivîsin.

.....

4. Navên her sê mehên demsala biharê binivîsin.

.....

5. Rewşên hewayê binivîsin.

.....

### B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyê “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Salek 52 hefte ye. ( )

2. Di biharê de gul û gîya şîn dibin. Dar kulîlkan vedikin. ( )

3. Rewşa hewayê hîç naguhere. ( )

4. Ji bo em zû ji xewê şîyar bibin divê em zû rakevin. ( )

5. Heftetek ji heşt rojan pêk tê. ( )

### C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

**zivistanê / çar / sê / duşemê / havînê**

1. Hezîran, tîrmeh û tebax mehên ..... ne.

2. Hefte bi roja ..... dest pê dike.

3. Mehek ..... hefte ye.

4. Di demsala ..... de serma zêde dibe û carinan berf dibare. Dema berf dibare em kalê berfê çêdikin.

5. Di her demsalekê de ..... meh hene.

**D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?****1. Kîjan ne rewşeke hewayê ye?**

- a) teyrok                      b) sayî                      c) baran                      d) demsal

**2. Di kîjan vebijêrkê de saet çewt hatiye nivîsandin?**

- a) 10.15: Saet deh û çaryek e.                      b) 08.55: Saet neh kêr pênc deqe ye.  
c) 12.45: Saet duwazdeh kêr çaryek e.                      d) 06.30: Saet şeş û nîv e.

**3. Di kîjan vebijêrkê de saet çewt hatiye nivîsandin?**

- a) 07.12: Saet heft û duwazdeh deqe ye.                      b) 05.15: Saet pênc kêr çaryek e  
c) 09.35: Saet deh kêr bîst û pênc deqe ye.                      d) 08.30: Saet heşt û nîv e.

**4. Di hefteyekê de çend roj hene?**

- a) sê                      b) pênc                      c) şeş                      d) heft

**5. Kîjan rojeke hefteyê ye?**

- a) şemal                      b) payîz                      c) şemî                      d) şev

**6. Piştî roja pêncşemê kîjan roj tê?**

- a) yekşem                      b) îr                      c) çarşem                      d) sêşem

**7. Kîjan roj wekî dawîya hefteyê tê binavkirin?**

- a) duşem                      b) çarşem                      c) îr                      d) yekşem

**8. Berî roja şemîyê kîjan roj tê?**

- a) duşem                      b) sêşem                      c) îr                      d) yekşem

**9. Di kîjan demsalê de dar kulîlkan vedikin?**

- a) havîn                      b) zivistan                      c) bihar                      d) payîz





Dinleme



Konuşma




Okuma



Yazma

## UNÎTEYA 7. GEŞTÛGER Û HATÛÇÛ



### AMADEHÎYA UNÎTEYÊ


- 1) Hûn dikarin navnîşana xwendingeha xwe bibêjin?
- 2) Rêzikên hatûçûyê bi kêrî çi tî? Bibêjin.
- 3) Li bajarên we cihên geştûgerê kîjan in? Bibêjin.

## BEŞA 1. CIH Û HÊL

## EM CIH Û HÊLAN HÎN BIBIN


Roj ji hêla rojhilat ve hiltê.

Roj ji hêla rojava ve diçe ava.



Dema em destê xwe yê rastê bidin hêla ku roj jê hiltê, destê me yê çepê rojava nîşan dide. Berê me dikeve bakur. Pişta me jî dikeve başûr.

## LI DERDORA WE ÇI LI KU DERÊ YE?



### Çalakîya 1.

Valahîyan li gor agahîyên jorîn dagirin.

keçikê / rastê / avahîyê / darê / zer

1. Keçik li bin ..... ye.
2. Pisîk li pişt ..... ye.
3. Kîso li kêleka keçikê, li milê ..... ye.
4. Çûkê şîn li cem çûkê ..... e.
5. Dar li pêşîya ..... ye.

### Çalakîya 2.

Li gor wêne hevokên jêrîn bi peyvên li hemberê wan re hevpek bikin.

1. Li pêşîya avahîyê ye.
2. Li pişt keçikê ye.
3. Li rex keçikê, li milê çepê ye.
4. Li ser darê ne.
5. Li kêleka keçikê, li milê rastê ye.

kûçik  
kîso  
dar  
pisîk  
çûk

## Çalakîya 3.

Li gor wêneyê jêrîn valahîyan bi peyvên guncan dagirin.



li hember / li rex / di bin / li ser / li ber

1. Pirtûk ..... maseyê ye.
2. Kompîtur ..... pirtûkdankê ye.
3. Gog ..... maseyê de ye.
4. Guldank ..... paceyê ye.
5. Kursî ..... maseyê ye.

## Çalakîya 4.

Wekî mînakên jêrîn hûn jî hevokan çêbikin û li ser tabloyê binivîsin.

|        |       |                                   |
|--------|-------|-----------------------------------|
| şekir  | bê    | Çaya <b>bê</b> şekir xweştir e.   |
| dar    | istan | Dar <b>istan</b> hêlîna ajelan e. |
| aqil   | bi    |                                   |
| gul    | dank  |                                   |
| xwarin | ve    |                                   |
| bazar  | geh   |                                   |



## Hevpeyvîn



## LÎSTIKA HÊLAN

**Emîne:** Gulnaz, were em bi lîstika hêlan bilîzin.

**Gulnaz:** Baş e, em bilîzin lê ev lîstik çawa tê lîstin?

**Emîne:** Ez dê ji nexşeyê bajaran nîşanî te bidim. Tu jî dê hêla wan bajaran bibêjî. Piştî çar pîrsan vê carê tu dê ji min bipirsî. Ji bo her bersiveke rast du puan tên.

**Gulnaz:** Kerem bike, tu dest pê bike.

**Emîne:** Hatay dikeve kîjan hêlê?

**Gulnaz:** Li başûr e.

**Emîne:** İzmir dikeve kîjan hêlê?

**Gulnaz:** Li rojava ye.

**Emîne:** Sinop dikeve kîjan hêlê?

**Gulnaz:** Li bakur e.

**Emîne:** Van dikeve kîjan hêlê?

**Gulnaz:** Li rojhilat e.

**Emîne:** Te heşt puan girtin. Vêca tu bipirse.



## Çalakîya 5.

Li gor vê hevpeyvînê valahîyên jêrîn dagirin.

kîjan / lîstika / heşt / dest pê / nexşeyê

1. Kerem bike tu ..... bike.
2. Ez dê ji ..... bajaran nîşanî te bidim.
3. Van dikeve ..... hêlê?
4. Te ..... puan girtin.
5. Were em bi ..... hêlan bilîzin.

## BEŞA 2. HATÛÇÛ

Hevpeyvîn

## PERWERDEHÎYA HATÛÇÛYÊ



Mamosteya me îro ji me re got ku mijara dersa me rêzikên hatûçûyê ye. Ji bo em wan baş hîn bibin mamoste em birin Parka Zarokan a Perwerdehîya Hatûçûyê. Saet di dehan de em gihaştin parkê. Mamosteya me agahî dabû rêvebirê parkê. Xebatkarên parkê em pêşwazî kirin û heta em vegerîyan jî bi me re bûn. Xebatkaran serê pêşî em li parkê gerandin. Li parkê rêyên wesayît û peyayan, nîşanên hatûçûyê û wesayîten sîmulator hebûn. Karmendekî em kirin du kom û ji me re got:

-Komek dê tûra xwe bi peyatî biavêje, koma din jî dê tûra xwe bi wesayîtan biavêje. Ez di koma peyayan de mam. Piştî ku her du koman tûrên xwe qedandin cihên xwe bi hev guherandin û vê carê ez bûm ajovanê otobûsa sîmulator. Me bi vî awayî tûreke din jî avêt. Piştî mamoste got:

-Zarokino, tev werin, kekê we yê karmend dê tiştinan ji we bipirse.

**Karmend:** We tûrên xwe qedandin û hûn bi giştî serkeftî bûn. Lê ez dixwazim hin pirsan ji we bikim. Gelo rêzikên girîng ji alîyê her kesî ve tên zanîn an na. Lambeya sor ji bo çi ye?

**Mirad:** Ji bo rawestîne ye.

**Karmend:** Lambeya zer ji bo çi ye?

**Leyla:** Ji bo amadebûnê ye.

**Karmend:** Lambeya kesk ji bo çi ye?


**Îlyas:** Ji bo derbasbûnê ye.

**Karmend:** Rêwî di otobûsan de çima ji derîyê pêş ve peya nabin?

**Berçem:** Ji ber ku kesên dixwazin siwar bibin dê tengezar bibin.

**Karmend:** Li hin cihan lambeyên hatûçûyê nînin. Divê peya li wan cihan di ku derê re derbasî hemberê rê bibin?

**Zehra:** Divê di peyaboran re derbas bibin.



**Karmend:** Dema peya derbasî hemberê rê dibin pêşî çima li milê çepê dinêrin?

**Siyabend:** Dema em tên ber rêyekê wesayîten ku nêzîkê me diçin ji alîyê çepê ve tên. Loma jî em pêşî li milê çepê dinêrin.

**Karmend:** Maşelah, hûn çiqas zîrek in! Pirsra dawî tê: Kîjan wesayît dikarin di lambeya sor de derbas bibin?

**Helîme:** Dema rewşeke bitalûke hebe ambulans û agirkuj dikarin di lambeya sor de derbas bibin.

**Zehra:** Biborin, çawa dikarin di lambeya sor de derbas bibin, min fam nekir. Hûn dikarin careke din bibêjin?

**Karmend:** Tenê ev wesayît dema ku talûkeyeke wekî qeza, şewat hebe dikarin derbas bibin. Mamoste, xwendekarên te gelekî serkeftî ne. Jixwe tiştêkî ez bipirsim jî nema.

**Mamoste:** Mala we ava. Em kêfxweş bûn. Bi xatirê we.

**Karmend:** Oxira we ya xêrê be!

Piştî em bi rê ketin û vegehiyan xwendengeha xwe. Geştî me ya îro pir xweş bû. Me li parkê rêzikên hatûçûyê pêk anîn. Bi vî awayî em baş hîn bûn.

(Komîsyon)

### Nêçîra Peyvan



peya



agirkuj



lambeyên hatûçûyê



### Çalakîya 1.

Valahîyan li gor hevpeyvîna jorîn dagirin.

**rêzikên / pêşwazî / parkê / tûreke / serkeftî**

1. Saet di dehan de em gihastin .....
2. We tûrên xwe qedandin û hûn bi giştî ..... bûn.
3. Mijara darsa me ..... hatûçûyê ye.
4. Me bi vî awayî ..... din jî avêt.
5. Xebatkarên parkê em..... kirin.

## Çalakîya 2.

Pirsên jêrîn li gor hevpeyvînê bibersivînin.

1. Mamoste çima xwendekar birin Parka Zarokan a Perwerdehiya Hatûçûyê?

.....

2. Rêwî di otobûsan de çima di deriyê pêş ve peya nabin?

.....

3. Lambeya sor ji bo çi ye?

.....

4. Lambeya zer ji bo çi ye?

.....

5. Lambeya kesk ji bo çi ye?

.....

6. Kîjan wesayît hin caran dikarin di lambeya sor de derbas bibin?

.....

## Çalakîya 3.

“Biborin, çawa dikarin di lambeya sor de derbas bibin, min fam nekir. Hûn dikarin careke din bibêjin?”

**Wekî mînaka jorîn dema meseleyek nehat famkirin hûn çawa dipirsin?**

**Li ser vê bi hevalekî/ hevaleke xwe re hevpeyvînekê çêbikin.**

## DERBASBÛNA ALÎYÊ DIN

Dema  
ez dixwazim  
derbasî hemberê rê bibim  
pêşî li milê çepê, piştre li milê  
rastê û dîsa li milê çepê dinêrim.  
Eger wesayît tune bin  
derbas dibim.



Ez  
di peyaborê re  
derbasî hemberê rê  
dibim.



## BEŞA 3. CIHÊN GEŞTÛGERÊ

### Çalakîya 1.

Li gor sernav û wêneyan, mijara çîroka jêrîn dibe ku çi be? Bibêjin. Piştî devê pirtûkên xwe bigirin û çîrokê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin.

### GEŞTÛGEREKE HAVÎNÊ

Vê havînê meta min û keça wê Sosin ji Îstanbulê hatin, bûn mêvanên me. Êvarî Sosinê qala Îstanbulê ji me re kir. Li gor wê li Îstanbulê gelek deverên geştûgerê yên hêja hene. Di nav wan cihên ku jimartin de Mizgefta Sultanahmet, Birca Galatayê, Kendava Haliçê û gelek cihên din hebûn.

Min jî xwest ku ez wan li cihên geştûgerê yên herêma me bigerînim. Min ev fîkra xwe ji bavê xwe re got û me bi hev re bernameyeke geştûgerê amade kir. Roja pêşî em li bajarê me gerîyan. Sosinê û meta min sûrên kevin, Bexçeyên Hewselê, Pira Dehderî û Pira Malabadê pir ecibandin. Piştî em li bajarên derdorê gerîyan.


Di geştûgera xwe de me gelek cihên balkêş û kevnar dîtîn. Li Mardinê Xerabeyên Darayê, keleha, dêr, mizgeftên kevnar û muze hebûn.

Li Batmanê bi taybetî keleha Hasankeyfê û pira wê ya kevnar pir xweşik û balkêş bûn. Ji ber ku dê Hasankeyf di bin avê de bimîne cihê Qubeya Zeynel Bey hatibû veguhestin.

Me li Vanê jî gelek cihên balkêş dîtîn. Meta min û Sosinê, Gol û Keleha Vanê û Girava Akdamarê pir ecibandin. Hewaya Vanê pir xweş û hênîk bû. Me berê xwe ji Vanê da Qesra Îshakpaşa û Gora Ehmedê Xanî.

Li ser gora wî bavê min helbesteke Ehmedê Xanî xwend. Em bi vê helbestê pir hestiyar bûn.

Meta min û Sosinê ji bo vê gerê kêfxweşîya xwe anî ziman û spasîyên xwe ji me re pêşkêş kirin.



(Komîsyon)

## Çalakîya 2.

Navên wênayên çîroka “Geştûgereke Havînê” ku we guhdarî kir li binê wan binivîsin.



1) .....

2) .....

3) .....

## Nêçîra Peyvan



birc



kendav



qesr

## Çalakîya 3.

Tiştên ku ji çîroka jorîn di hişê we de man bi pola xwe re parve bikin.

## Çalakîya 4.

Binê peyvên demê yên ku di çîroka “Geştûgereke Havînê” de derbas bûne xêz bikin.

## Çalakîya 5.

Valahîyên jêrîn li gor hevpeyvîna jorîn dagirin.


**herêma / derdorê / Îstanbulê / Vanê / balkêş û kevnar**

1. Sosinê êvarî qala ..... kir.
2. Di geştûgera xwe de me gelek cihên ..... dîtîn.
3. Min jî xwest ku ez wan li cihên geştûgerê yên ..... me bigerînim.
4. Hewaya..... pir xweş û hênîk bû.
5. Piştî em li bajarên .....gerîyan.

**Çalakîya 6.**

Bersivên pirsên jêrîn di nexşeya çîrokê de bi cih bikin.

1. Kî û kî derketin geştûgerê?
2. Sosinê kengî qala Îstanbulê kir?
3. Roja pêşî li ku gerîyan?
4. Piştî gera li Vanê çi kirin?

**Çalakîya 7.**

Li gor agahîyên jorîn cihên geştûgerê û bajarên wan hevîk bikin.

- |                                                         |              |
|---------------------------------------------------------|--------------|
| 1. Mizgefta Sultanahmet, Birca Galatayê, Kendava Haliçê | ( ) Batman   |
| 2. Xerabeyên Darayê                                     | ( ) İstanbul |
| 3. Keleha Hasankeyfê û Qubeya Zeynel Bey                | ( ) Van      |
| 4. Girava Akdamarê                                      | ( ) Mardin   |

**Çalakîya 8.**

Peyvên jêrîn di nava hevokên guncan de bi cih bikin.

**lê / an / lewra / û**

1. Sosinê û meta min sûrên kevin, Bexçeyên Hewselê, Pira Dehderî ..... Pira Malabadê pir ecibandin.
2. Van bajarekî xweş e ..... cihên geştûgerê li Vanê pir in.
3. Wesayîti di lambeya sor de derbas nabin ..... ambulans û agirkuji carinan derbas dibin.
4. Pêşî em herin Mizgefta Sultanahmet ..... Birca Galatayê?

**Çalakîya 9.**

Nivîsa jêrîn bixwînin û pirsên li jêr li gor vê nivîsê bibersivînin.

Cihê Qubeya Zeynel Bey di 12ê Gulana 2017an de hat guhertin. Lewra dema ku Bendava Ilisuyê hat temamkirin dê di bin avê de mabûna. Ev guhertin bi platformeke xwedî sed û pêncî tekel pêk hat. Cara yekem bû ku ev teknoloji li Türkiyeyê hat bikaranîn. Bi vê tîknolojiyê ev qube ji cihê xwe yê berê du kîlometreyan hat dûrxistin û li cihê wê yê nû hat danîn. Vê veguhestinê çar saetan dewam kir. Karê bicihkirina vê qubeyê jî sê rojan dewam kir.

1. Çima cihê Qubeya Zeynel Bey hat guherandin?
2. Veguhestinê çend saetan dewam kir?
3. Ev veguhestin kengî pêk hatiye?
4. Li gor we sernavê vê nûçeyê divê çi be?  
Li valahîya jorîn binivîsin.

**Çalakîya 10.**

Nivîsa jêrîn ji mamosteyê xwe guhdarî bikin û peyvên mîqdarê yên ku derbas dibin li lînûska xwe binivîsin.

## QEWÎTÎYA DÊYA MIN

Îro dema ez hatim malê min nîşeyek bi derîyê pêjgehê ve daleqandî dît. Xûya bû dêya min hin tişt xwestibûn. Di nîşeyê de ev nivîsandî bûn:

“Kurê min, niha saet tê duduyan. Ez diçim xwendîngeha xwişka te. Min pere danîn ser maseya li pêjgehê. Here mîwefiroşê nêzîk, ji me re hinek sebze û mîweyan bikire. Du kîlo firingî bikire û hinek jî pîvazên hişk... Îsot jî pir lazim in. Hêj hinek mîwe li malê mane, gelekane nekire û barê xwe pir giran neke. Bi bihayê pênc lîreyan sêv û hinaran bikire. Dê pere ji ber wan bimînin. Dilê te biçe çi ji xwe re ji mîwefiroş bikire. Mîweyên cûrbicûr li dikana wî hene. Piştî jî neseke û vegere malê. Jixwe ez dê jî heta hingî bêm.”

Ez derketim û çûm mîwefiroş. Ev, dikana Xalê Zibeyr e. Hem nêzîkî mala me ye û hem jî mîwe û sebzeyên wê teze û xweş in. Bi ser de jî ji yên dikanên din erzantir in. Em gelek pêdiviyên xwe ji cem Xalê Zibeyr peyda dikin.



## BEŞA 4. ZARGOTIN



## 1. Mamik

Sindoqa çar ling, dibeze mîna piling. Ev çi ye?

Or or dike, bor bor dike, qesta bajaran dike. Ev çi ye?

Çîyayê bêkevir, deryaya bêav, daristana bêdar, bajarê bêmirov...  
Ev çi ye?

Diçim naçim dirêj e, dişom naşom qirêj e. Ev çi ye?

## 2. Gotinên Pêşîyan

Pira Batmanê, Medreseya Gomeydanê, Mizgefta Hîzanê, xirab nabin  
heta axirzemanê.

Ne mirovê bêbiryar û ne rêwîyê bêheval.

Rovîyekî gerok, ji şerekî xewar çêtir e.

## 3. Pêkenok

## RÊWÎ

Du heval li benda trêne bûn. Ketibûn meseleyên kûr. Di wê navberê de trêner derbas bû. Li pey trêner bazdan lê negihaştinê. Yekî ji wan got:

-Qe nebe em ji trênera duyemîn nemînin.

Dîsa vegehiyan meseleya xwe. Trêner dîsa derbas bû û dîsa negihaştinê. Yekî dîsa got:

-Em ji vê trênerê jî nemînin, lewra ev a dawî ye. Wan dîsa dest bi axaftinê kir. Trêner çû.

Li pey bazdan û bazdan. Vê carê yek ji wan siwar bû. Lê yê din negihaştîyê. Yê ku jê mayî kenîya. Zilamekî ku di wir re derbas dibû jê pirsî:

-Ê ku ji trênerê ma tu yî, hevalê te siwar bû, ma tu çima dikenî?



Wî jî bersiv da:

-Ê ne xalo tu nizanî. Ez dê biçûma, ew hatibû ku min bi rê bike.

## Çalakîya 1.

Pêkenoka jorîn li lînûska xwe binivîsin û dû re nivîsa xwe kontrol bikin.

## BEŞA 5. XAÇEPIRS



## BEŞA 6. NIRXANDIN



## A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Navên her çar hêlan binivîsin.

.....

2. Li Îstanbulê cihên geştûgerê kîjan in? Binivîsin.

.....

3. Dema peya derbasî hemberê rê dibin pêşî çima li milê çepê dinêrin? Binivîsin.

.....

4. Li Vanê cihên geştûgerê kîjan in? Binivîsin.

.....

5. Li bajarê we cihên geştûgerê kîjan in? Binivîsin.

.....

## B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

- |                                                          |     |
|----------------------------------------------------------|-----|
| 1. Roj di rojhilat re diçe ava.                          | ( ) |
| 2. Wesayît di lambeya sor de radiwestin.                 | ( ) |
| 3. Divê rêwî di otobûsan de ji derîyê pêş ve peya bibin. | ( ) |
| 4. Hêlên sereke başûr, bakur, rojhilat û rojava ne.      | ( ) |
| 5. Sinop dikeve hêla rojava.                             | ( ) |

## C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

**rojava / peyaboran / rojhilat / kesk / agirkuj**

- Di lambeya..... de wesayît derbas dibin.
- Dema rewşeke bitalûke hebe ambûlans û ..... dikarin di lambeya sor de derbas bibin.
- Cihên ku lambeyên hatûçûyê lê tune bin divê peya di ..... re derbas bibin.
- Roj ji hêla..... ve diçe ava.
- Dema em destê xwe yê rastê bidin hêla..... destê me yê çepê rojava nîşan dide.

**D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?**1. Li gor cih û alîyan kîjan çewt e?

a)

**Guldank li ser maseyê ye.**

b)

**Xwendîgeh li rex mizgeftê ye.**

c)

**Pisîk li bin televîzyonê ye.**

d)

**Mamoste li ber dep e.****2. Kîjan cihê geştûgerê li Îstanbulê ye?**

a) Mizgefta Sultanahmet   b) Bexçeyên Hewselê   c) Pira Dehderî   d) Pira Malabadê

**3. Kîjan wesayît dikare di lambeya sor de derbas bibe?**

a) ambulans   b) kamyon   c) otobûs   d) otomobîl

**4. Xerabeyên Darayê li kîjan bajarî ne?**

a) Erzurum   b) Van   c) Batman   d) Mardin

**5. Di kîjan lambeya hatûçûyê de wesayît ji bo derbasbûnê amade dibin?**

a) sor   b) zer   c) şîn   d) kesk





Dinleme



Konuşma



Okuma



Yazma

## UNÎTEYA 8. LÎSTİK Û ÇÎROK




### AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Hûn kîjan lîstikan dizanin? Bibêjin.
- 2) Li taxa we herî zêde kîjan lîstik tên lîstin? Bibêjin.
- 3) Hûn kîjan çîrokan dizanin? Bibêjin.

## BEŞA 1. LÎSTIKÊN ME

Hevpeyvîn

## EM ÇI BILÎZIN?



**Elî:** Hevalino, werin em lîstikekê bilîzin.

**Dîlan:** Em çi bilîzin?

**Bêrîvan:** Em bi **teytokê** bilîzin.

**Mistefa:** Na, na! Em bi **xaran** bilîzin.

**Mîhrîban:** Em bi **pêncokê** bilîzin.

**Mesûd:** Werin em bi **tepê** bilîzin.

**Sînan:** Bi ya min **darqîtik** xweştir e.

**Dîlan:** Hevalino, **veşartok** çawa ye?

**Elî:** Lîstikên ku we gotin tev jî xweş in. Lê bi ya min jî veşartok baştir e.

**Zarok tev bi hev re:** De naxwe em bi veşartokê bilîzin.

**Dîlan:** Em pîra holikê bi bizdim-badimê yan bi lêhatinokê dîyar bikin?

**Elî:** Bila Derya lêhatinokê bibêje.

**Derya:**

Yekê yekê

Yekaneke

Dabistanê

Ezîzanê

Gula çepo

Çep li mijo

Arê gijo

Heba tirî

Vegindirî

Bar û dey e

Şam û şe ye

Gul hine ye

Yek li min e

Bîst li te ye



**Çalakîya 1.**

Hûn jî hevpeyvîneke wekî ya jorîn bi hevalên xwe re pêk bînin. Di axaftinên xwe de peyvên wekî “û, jî, lê, naxwe”yê jî bi kar bînin.

**Çalakîya 2.**

Valahîyên lêhatinoka jêrîn dagirin.

Yekê yekê

(3) .....

(1) .....

Bar û dey e

Dabistanê

Şam û şe ye

Ezîzanê

(4) .....

(2) .....

Yek li min e

Çep li mijo

(5) .....

Arê gijo

Heba tirî

**Çalakîya 3.**

Kî dixwaze kîjan lîstik bê lîstin? Hevyek bikin.

1. tepê

( ) Sînan

2. veşartok

( ) Mistefa

3. xar

(1) Mesûd

4. teytok

( ) Mîhrîban

5. pêncok

( ) Dîlan

6. darqîtik

( ) Bêrîvan

**Çalakîya 4.**

Hûn jî navên sê lîstikên din binivîsin.

1. ....

2. ....

3. ....

**Çalakîya 5.**

Helbesta jêrîn ji mamosteyê xwe guhdarî bikin. Bala xwe bidin derbandinê. Piştê hûn bixwînin.

## Helbest



## LÎSTIK

Hevalino bilezînin      Navê lîstikê **xar** e      Yek, dido, sisê, çar, pênc  
 Em bi hev re bilîzin      Cam, hesin an kevir e      Pênc kevirên gelek qenc  
 Çi xweş in listîkên me      Hin piçûk û hin mezin      Em bilîzin bi **pêncok**  
 Em têra xwe şa bibin      Xweşik e wekî dur e      Bigre li ser her du penc

**Veşartok** çiqas xweş e      Ya din jî **darqîtik** e      -Hop, va li te tepa min!  
 Yê dilîze kêfxweş e      Lê bide da bipeke      -Ez bûm mak, bû dora min  
 Va ye dijimêre mak      Bijimêre bi pêyan      Hûn baz bidin, çû ji we  
 Kî xuya be bextreş e      Qaman li ser hev bike      **Tepê** tîne kêfa min

(Komîsyon)

Dor gihişte **teytokê**  
 Bi xêzik û kevirokê  
 Qet pê li xêzê neke  
 Li çûn û vegerokê

## Çalakîya 6.

Binê hejmar û gihanekên (peyvên ku gotinan bi hev ve dikin) ku di helbestê de derbas dibin xêz bikin.

## Çalakîya 7.

Ji peyvên jêrîn ên ku hûn wateya wan dizanin nîşan bikin. Ji bo yên ku hûn wateya wan nizanin jî li ferhengê binêrin.

1. bazdan ( ) .....
2. dor ( ) .....
3. xêz ( ) .....
4. hesin ( ) .....
5. kevir ( ) .....
6. şabûn ( ) .....
7. dur ( ) .....



## MIHRÎCANA LÎSTIKAN

Em li fêrgehê bûn. Mamosteyê me afîşek anî û nîşanî me da. Di afîşê de dinivîsand ku dê mihîrîcaneke lîstikan ji alîyê Midûrîyeta Çandê ya navçeya me ve bê lidarxistin. Li gor vê afîşê mamosteyê me ji pola me xwest ku em lîstikekê amade bikin. Pêwîst bû ev lîstik di kolanan de li nav zarokan pir berbelav bûna.

Li gor vê afîşê me jî lîstikeke ku em li kolanan pir dilîzin hilbijart. Lîstika ku me hilbijart darqîtîk bû. Jixwe li taxê, em bi hevalên xwe re her roj bi darqîtîkê dilîstin.

Roja mihîrîcanê jî şeş dibistanên navçeyê lîstikvan hatibûn û her dibistanekê lîstikek pêşkêş kir. Gelek temaşevan hatibûn. Lîstik pir hatin ecibandin. Ji bilî lîstika me; veşartok, teytok, pêncok, xar û tepê jî hatin pêşkêşkirin. Dema me pir xweş derbas bû. Dê û bavê me jî vê mihîrîcanê pir memnûn man û em pîroz kirin. Mamosteyê me jî em pîroz kirin û ji me re got:

-Zarokino, lîstik, hem ji alîyê tenduristîya laşê me ve pir girîng in û hem jî bi lîstina van lîstikan em kêfxweş dibin. Divê em ne tenê lîstikên dijîtal bilîzin, lîstikên xwe yên gelêrî jî bilîzin û van lîstikan ji bîr nekin.

Piştî vê mihîrîcanê me jî fam kir ku feydeyên van lîstikan pir in.

(Komîsyon)



**Çalakîya 8.****Pirsên jêrîn li gor çîroka jorîn bibersivînin.**

1. Mîhrîcana lîstîkan ji alîyê kê ve tê lidarxistin?

.....

2. Roja mîhrîcanê ji çend dibistanên navçeyê lîstîkvan hatibûn?

.....

3. Di mîhrîcanê de kîjan lîstîk hatin pêşkêşkirin?

.....

4. Zarok li taxê bi hevalên xwe re her roj bi kîjan lîstîkê dilîstin?

.....

5. Piştî vê mîhrîcanê zarokan çi fam kir?

.....

.....

**Çalakîya 9.****Bi peyvên tevlîhev hevokan çêbikin.**

1. temaşevan / hatibûn / Gelek

.....

2. derbas bû / pir / xweş / me / Dema

.....

3. kirin / em / Wan / pîroz

.....

4. pir / Lîstîk / ecibandin / hatin

.....

5. van / Feydeyên / pir in / lîstîkan

.....

**Çalakîya 10.****Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.**

1. Mamosteyê me fîmek anî û nîşanî me da.

( )

2. Dê û bavê me ji vê mîhrîcanê pir memnûn man û em pîroz kirin.

( )

3. Lîstîk qet nehatin ecibandin.

( )

4. Mamosteyê me ji pola me xwest ku em lîstîkekê amade bikin.

( )

5. Lîstîka ku me hîlbijart veşartok bû.

( )

## LÎSTIK ÇAWA TÊN LÎSTIN?



1

Tepê

Ji bo vê lîstikê hejmara lîstikvanan ne girîng e. Maka lîstikê bi lêhatinokekê tê bijartin. Dema mak dîyar dibe zarokên din her yek bi alîyekî ve direvin. Mak jî dide pey wan, xwe bigihîne kê destê xwe didiyê û dibêje: “Tepê!” Bi vî awayî mak tê guhertin û lîstik didome.

2

Darqîtik

Bi du komên ku hejmara wan wekî hev in tê lîstin. Ji bo vê lîstikê darekî bi qasî bostekê û yekî bi qasî milekî hewce ne. Ji yê kin re qîtik, ji yê dirêj re jî dar tê gotin. Li erdê kortikeke piçûk tê kolan û mirov qîtik datîne ser kortikê. Mirov bi dar, qîtik hildide û lê dide, dipekîne. Ji bo lîstikvan bi ser bikevin divê qîtik dûr bikeve.



3

Xar



Hejmara lîstikvanan ji bo vê lîstikê ne girîng e. Bi xarên piçûk ên ku ji kevîr, hesin an caman çêbûne tê lîstin. Gelek cûreyên vê lîstikê hene. Ji bo ku lîstikvan xaran qezenc bike divê xara xwe li xareke din bixe.





4

## Teytok

Bi du kesan tê lîstin. Ji bo lîstikê kevirekî pan hewce ye. Li erdê malikên çargoşe tên xêzkirin. Mirov radibe ser pêyekî û kevir di wan malikan de bi pêyê xwe diajo. Divê di lîstikê de mirov pê li xêzikan neke û kevir jî li ser xêzikan nesekine.

5

## Pêncok

Bi du kesan tê lîstin. Ji bo vê lîstikê pênc kevirên şayîk hewce ne. Kevir li hewayê tên girtin. Heke kevir bikevin erdê dor digihêje lîstikvana/lîstikvanê din.



6

## Veşartok



Ji bo vê lîstikê hejmara lîstikvanan ne girîng e. Mak bi “bizdim-badimê” tê dîyarkirin. Mak berê xwe dide dîwar an darekê û heta bîstan dijimêre. Lîstikvanên din xwe vedişêrin. Mak êdî li wan digere. Berî ku ew veşartinê destê xwe bidin cihê jimartinê, mak destê xwe didiyê.



## BEŞA 2. ÇÎROKÊN ME

### ÇÎROKA APÊ MIN



Duh apê min Cemîl hat li mala me bû mêvan. Çend saet bûn ku ez û birayê xwe û xwişka xwe me li televîzyonê temaşê dikir û paşî jî li ser kompîturê em bi lîstikan dilîstin. Apê min gazî me kir û wiha got:

-Zarokino, ev çend saet in ku hûn li televîzyonê temaşê dikin û bi lîstikên kompîturê dilîzin. Eger hûn bixwazin, werin ez ji we re çîrokekê bibêjim.

Em li dora apê xwe civîyan û apê min dest bi çîrokê kir:

“Hebû tunebû. Dibêjin li gundekî rovîyek û kîsoyek hebûn. Piştî hevaltî û cîrantîyeke dûvedirêj rovî û kîso bûn destûbirakên hev. Rojek ji rojên payîzê rovî ji kîso re got:

-Em bi hev re genim biçînin. Em dê debara xwe pê bikin.

Kîso got:

-Bila be, naxwe divê em dest bi karê xwe bikin. Wextê çandinîyê ye.

Roja din dest bi tovavêtinê kirin. Rovî rabû çû, kete ber latekê û got:

-Birayê min, wele ez nikarim alî te tov bireşînim. Ji ber ku vê latê gava din ji min re got: “Ez dikim bikevim. Divê tu nelebitî û min bigirî da ku ez bi ser te de nekevim.”

Kîso jî got:

-Na, na birakê min. Bila lat bi ser te de nekeve, ez dê ji dêvla te ve jî bixebitim.

Wextê cot hat û kîso bi tena serê xwe şuxilî, cotê xwe kir. Heta ku wextê aşêfê hat, eynî wilo... Bû wextê çînîna genim, eynî wilo... Bû wextê gêreyê. Kîso ew jî bi tenê çêkir. Vê rewşê wiha dewam kir heta ku genimê wan bû lod, rovî her car wiha digot:

-Birayê kîso, ez nikarim ji ber vê



latê rabim. Tu jî dizanî ku ez rabim dê ev lat bi ser min de bikeve. Heke na min dê alî te kiribûna.

Her cara ku rovî wiha digot kîso jî lê vedigerand:

-Na, birakê min na. Hema bila bi ser te de nekeve, ez dê îş bikim.

Kar qedîya, bû wextê parvekirinê. Kîso got:

-Em çawa bikin? Gelo em pişkê bavêjin, vî genimî em çawa parve bikin? Jixwe bi nivî ye.

Rovî jî got:

-Hema kî berî kê serê şeveqê bigihêjiyê bila genim ji wî re be.

Xatir ji hev xwestin û her yek çû mala xwe. Rovî ji xwe re digot: "Jixwe ez jêhatî me. Sibeyî ez dê bêjim xirrrr, di demeke kin de xwe bigihînim loda genim." Kîso jî ji xwe re digot: "Wele hema ez dê bi şev bikevim rê. Eger bi şev bikevim rê, heta sibehê jixwe ez dê bigihêjim lodê." Nêta herduyan jî ev bû.

Rovî roja din çû ser vî sergoyî, ser sergoyê din û yê din... Çavê wî lê bû ku hestûyekî an tiştêkî din bibîne û bixwe. Kîsoyê me jî hêj ji şevê ve ketibû ser rê û çûbû.

Rovî hat ber loda genim lê kîso serê xwe ji nav genim hilda û fîkand. Genim ji kîso re mabû. Rovî got:

-Bira, ma qey zikat jî lê nakeve?

Kîso got:

-Ê wele libek genim, zikata wî heye.

Rovî got:

-Ma yek-du heb neketine dora benderê jî?

Kîso got:

-Em dê yekê ji dora benderê jî bidin te.



Rovî li derdorê gerîya û libek genim jî wî ji xwe re dît. Bûn sê libên wî. Rahîşt wan her sê libên genim û piştê serê xwe xurand û ji xwe re got:

-Ev yek ji çavbirçîtî û tiralîya min hat serê min.

Çîroka me çû dîyaran, rehma Xwedê li dê û bavên guhdaran."

Çîroka ku apê min got pir xweş bû û me pir ecibandibû. Piştî wê rojê me girîngîya çîrokan bêhtir fam kir û niha em ji çîrokan bêhtir hez dikin. Roja din ez çûm pirtûkxaneyê û min hinek pirtûkên çîrokan bi emanetî anîn. Bavê min jî ji pirtûkfiroş çend pirtûkên çîrokan ji min re kiribûn û êvarê bi xwe re anîn. Edî li malê saeta me ya xwendina çîrokan heye. Em di wê saetê de bi malbatî çîrokan dixwînin û ji hev re dibêjin.

(Komîsyon)



Nêçîra Peyvan



bênder



tov



pirtûkfiroş

**Çalakîya 1.****Valahîyan li gor hevpeyvîna jorîn dagirin.**

1. Zarok berî ku li çîrokê guhdarî bikin çi karî dikin?

.....

2. Kî çîroka Rovî û Kîso ji zarokan re dibêje?

.....

3. Rovî û kîso bi hev re çi karî dikin?

.....

4. Rovî ji bo nexebite her car ji kîso re çi digot?

.....

5. Serê sibehê kî berî kê digihêje ber loda genim?

.....

**Çalakîya 2.****Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneya “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.**

1. Ji ber çavbirçîtî û tiralîyê, rovî bi ser neket.

( )

2. Zarokan çîroka apê xwe neecibandibû.

( )

3. Piştî ku apê wan çîrokê ji wan re dibêje zarok bêhtir li televîzyonê dinêrin.


( )

4. Piştî hevaltî û cîrantîyeke dûvedirêj rovî û kîso dibin destûbirakên hev.

( )

5. Kîso ji ber ku bi şev dikeve rê, berî rovî digihêje loda genim.

( )

**Çalakîya 3.****Lîstikek û çîrokeke ku hûn dizanin ji hevalekî/hevaleke xwe re bibêjin. Di axaftinên xwe de hay ji edeba axaftinê, nîşanên laş û rû û derbandinê jî hebin.**

## BEŞA 3. ZARGOTIN



## 1. Gotinên Pêşîyan

Pêşî gotina xwe bipêje û piştire bibêje.

Dilê şivên bixwaze, dikare ji nêrî şîr bidoşe.

Di navbera gotin û kirinê de çîya hene.

Bila hindik be bila rindik be.

## 2. Mamik

Çûme êş, ecêbek hate pêş, bi şeş lîngan bû ji xeynî yên pêş. Ev çi ye?

Mamikê mino, kir xîşt û xîşt, çû pişt derî rûnişt. Ev çi ye?

Mamikê mino, bi şev xemilî ne, bi roj vemirî ne. Ev çi ne?

Heyv hebe difire, tav hebe direve. Ev çi ye?

Ser textik e ne dar e, bin textik e, ne dar e, çilo dixwe ne kar e.  
Ev çi ye?

## 3. Zûgotinok

Kerê zer li rizdeyê dizirî.

Rovî li rê zivirî, rê li rovî zivirî.

## 4. Lêhatinok

Rovî rovî rovî rindik

Serê dûvê rovî bi kincik

Rovî çûye mala xala

Lê kirine barê dara

Bijmêr nejmêr bîst û çar e

Rovîyê me hesabdar e.



## 4. Pêkenok

## WÊNEYÊN WESÎQEYÎ

Reşît ji bo bikeve karekî fermî, serî li sazîyekê dide. Sazî heşt heb wêneyên wesîqeyî jê dixwaze. Lê Reşît nizane ku wêneyên wesîqeyî çi ne. Ew jî diçe ji hevalê xwe Metîn dipirse. Metîn jê re dibêje:

-Tîştê ez dizanim wêneyê wesîqeyî, ew wêne ye ku tê de nîvê bejina mirov xuya ye. Tu çalekê li vir bikole ez dê herim wênegirê bînim û wêneyên te bigirim.

Reşît dest bi kolandina çalê dike. Dema Metîn vedigere dibîne ku Reşît heşt çal kolane. Metîn şaş dimîne û dibêje:

-Kuro Reşît ev çi ne, te çima heşt heb çal kolane?

Reşît:

-Êêê, ma ji min ne heşt heb wêne xwestibûn?

Metîn:

-Wîî! Te çima wisa kir? Jixwe min heşt heb wênegir anîbûn.

(Bi guhertinên piçûk ji Abdulkadîr Bîngol)

## 5. Stran

## ZOZAN ZOZAN

Zozan Zozan Zozan lê lê Zozan lê lê Zozan  
Zozan Zozan Zozan lê lê Zozan kewê canê

Firîya serê gazan lê lê Zozan lê lê Zozan  
Firîya serê gazan lê lê Zozan kewê canê

Ref tê ji refên qazan lê lê Zozan lê lê Zozan  
Ref tê ji refên qazan lê lê Zozan kewê canê

Hûrik hûrik dimeşe lê lê Zozan lê lê Zozan  
Hûrik hûrik dimeşe lê lê Zozan kewê canê

(Strana Gelêrî)


## Nêçîra Peyvan



kew




gaz



ref

## BEŞA 4. XAÇEPIRS



1





2




3




6




4



8



5



9



7



10

## BEŞA 5. NIRXANDIN



### A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Hûn herî zêde ji kîjan lîstikan hez dikin? Bibêjin.
2. Feydeyên lîstikan çi ne? Bibêjin.
3. Lîstikên ku bi keviran tên lîstin kîjan in? Bibêjin.
4. Navên sê çîrokên ku hûn ji wan hez dikin bibêjin.
5. Hûn dikarin lîstina lîstikekê tarîf bikin?

### B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Lîstika pêncokê bi du kesan tê lîstin. ( )
2. Mihrîcan, kolan û çepil navê çend heb lîstikan in. ( )
3. Ji bo lîstikên wekî tepê, xar û veşartokê hejmara lîstikvanan girîng e. ( )
4. Lîstik tev bi zûgotinokekê dest pê dikin. ( )
5. Lîstika teytokê bi du kesan tê lîstin. ( )

### C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

**maka / qîtik / teytokê / kevirên / xarên**

1. Li erdê kortikeke piçûk tê kolan û mirov ..... datîne ser kortikê.
2. Ji bo vê lîstikê pênc .....şayik hewce ne.
3. Bi .....piçûk ên ku ji kevir, hesin an caman çêbûne tê lîstin.
4. ....lîstikê bi zûgotinokekê tê bijartin.
5. Ji bo lîstika ..... kevirêk pan hewce ye.

**D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?**

1. Kîjan lîstik bi du komên ku hejmara wan wekî hev e tê lîstin?

- a) tepê      b) xar      c) darqîtik      d) pêncok

2. “Mak bi ‘bizdim-badimê’ tê dîyarkirin. Mak berê xwe dide dîwar an darekê û heta bîstan dijimêre. Lîstikvanên din xwe vedişêrin. Mak êdî li wan digere û berî ku ew vegerin û destê xwe bidin darê destê xwe didiyê. Ji bo ku mak ji makbûnê azad bibe divê jêhatî be.”

Li jor behsa kîjan lîstikê tê kirin?

- a) veşartok      b) teytok      c) tepê      d) xar

3. “Kevir li hewa tên girtin. Eger kevir bikevin erdê dor digihêje lîstikvanên din.”

Li jor behsa kîjan lîstikê tê kirin?

- a) darqîtik      b) xar      c) tepê      d) pêncok

4. “Ji bo lîstikê kevirêkî pan hewce ye. Li erdê malikên çargoşe tên xêzkin. Mirov radibe ser pêyekî û kevir di wan malikan de bi pêyê xwe diajo. Divê di lîstikê de mirov pê li xêzikan neke û kevir jî li ser xêzikan neseke.”

Li jor behsa kîjan lîstikê tê kirin?

- a) xar      b) teytok      c) darqîtik      d) pêncok

5. “Ji bo vê lîstikê darikekî bi qasî bostekê û yekî bi qasî milekî hewce ne. Ji yê kin re qîtik ji yê dirêj re dar tê gotin. Li erdê kortikeke piçûk tê kolan û mirov qîtik datîne ser kortikê. Mirov bi dar, qîtik hildide û lê dide, wî dipekîne. Ji bo lîstikvan bi ser bikevin divê qîtik dûr bikeve.”

Li jor behsa kîjan lîstikê tê kirin?

- a) teytok      b) darqîtik      c) tepê      d) veşartok





Dinleme



Konuşma



Okuma



Yazma

## UNÎTEYA 9.

# ÇALAKÎYÊN SERBEST



### AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Hûn di demên xwe yên serbest de bi çi mijûl dibin? Bibêjin.
- 2) Hûn herî zêde ji kîjan bernameyên televîzyonê hez dikin? Bibêjin.
- 3) Hûn bêhtir kîjan cûreyên werzişê dikin? Bibêjin.

# BEŞA 1. ÇALAKÎYÊN HUNERÎ Û HOBÎ

Hevpeyvîn



## HOBÎYÊN ME

Roja yekşemê ji kêfan ez zû şîyar bûm. Lewra mamosteya me dê em biribûna seyrane. Êdî min hew karîbû razim. Min bavê xwe şîyar kir û bavê min ez birim cihê hevdîtînê. Em li dibistanê li hev civîyan. Berî ku em bi rê bikevin mamosteya me derbarê cihê seyrane de agahî dan me. Ji bo ewlehîya me jî hin hişyarî dan me û em bi rê ketin.

Em çûn seyrangehê. Me li wir taştê xwar. Em bi topê lîstin. Hin ji me jî bi benik lîstin. Em têra xwe li derdora seyrangehê gerîyan. Wextê



me pir xweş derbas dibû. Êdî em tev ji ger û lîstikê pir westîyabûn. Me xwe da ber sîyê. Mamosteya me gazî me tevan kir. Em tev li dor wê civîyan. Mamosteyê ji me re got:

-Xuya ye ku seyrana me diqede. De ka bibêjin seyrana me çawa derbas bû? Me tevan bi hev re ji bo vê roja xweş spasîyên xwe jê re gotin. Lezgîn ket axaftinê û bi kelecana got:

- Mamoste, careke din em dê kengî werin? Em tev bi hev re kenîyan. Mamosteyê bersiva wî da û jê re got ku ji xeynî seyrane tiştine din jî hene. Ji me pirsî ku em di wextên xwe yên serbest de çi dikin. Di navbera me de ev hevpeyvîn çêbû:

**Zeyneb:** Ez ji xwendina pirtûkan pir hez dikim. Bi pirtûkên ku ez dixwînim, welat û çand û mirovên cuda nas dikim. Bi vê naskirinê ez pir kêfxweş dibim. Carinan jî bi hevalên xwe re diçim şanoyê. Dema ez lîstikvanê şanoyê li ser dikê dibînim wekî ku ez jî bi wan re dilîzim.

**Mistefa:** Kêfa min ji sînemayê re tê. Ez bêhtir diçim filmên anîmasyon. Dema mezin bûm ez jî dixwazim filmên anîmasyon çêbikim.

**Berfîn:** Kêfa min jî ji wênekêşîyê re tê. Ez ewqas bi wênekêşîyê re mijûl dibim ku di malbatê de ji min re dibêjin “Wênekêş”.

**Ristem:** Li malê ajelên min ên kedî hene. Bi wan re diaxivim û guh didim wan. Kuçikekî min heye. Me li bexçe jê re xanîkek çêkiriye. Pisîka min jî li malê ye û ji lîstikê pir hez dike. Li malê sebra min bi wan tê.

**Fatma:** Ez ji muzîkê pir hez dikim. Hem guhdarîkirin û hem jî lêxistina kemanê bi min pir xweş e. Ji bilî muzîkê bi orîgamîyê re jî mijûl dibim. Piştî ku dersên xwe dixwînim li muzîkê guhdarî dikim û di ber de jî bi kaxezên rengîn figuran çêdikim. Jûra min bi van tiştan xemilandî ye. Ez carinan wan didim hevalên xwe jî.

**Zînê:** Kêfa min ji wênesazîyê re tê. Li malê pêûsên min ên rengîn pir in û ez bi wan, wêneyên gelek tiştan çêdikim. Ji xeynî wêneyan ez ji çêkirina xwarinan jî pir hez dikim. Ez û birayê xwe hînî çêkirina gelek xwarinan bûne.

**Elî:** Ez pir caran dawîya hefteyê bi kekê xwe re diçim masîyan. Em çadira kampê datînin. Em şewkên xwe diavêjin avê û li benda masîyan dimînin. Piştî ku me şewk avêtin em li dora agirê kampê rûdinin û kekê min ji min re çîrokan dibêje.

**Mîrza:** Ez jî ji lîstina bi kişikê pir hez dikim û dikarim birayê xwe yê mezin mat bikim.

Mamosteya me jî di dawîyê de wiha got:

-Ez jî ji kişikê pir hez dikim. Min heta niha nizanîbû ku tu di kişikê de pêşketî yî. Naxwe em dikarin carinan bi hev re bilîzin.

Dû re berê xwe da me hemûyan û wiha got:

- Zarokino, ji van tiştên ku hûn ji wan hez dikin û di demên xwe yên serbest de pêk tînin re hobî tê gotin. Her yek ji me li gor zewqê xwe ji hobîyên cuda hez dike. Hobî jîyana me rengîn dikin û em bi saya van hobîyan hînî gelek tiştan dibin. Hobî nahêlin ku mirov bi tiştên xirab û bêkêr re mijûl bibin. Jîyana me bi hebûna hobîyan xweştir dibe.

(Komîsyon)

### Nêçîra Peyvan



seyran



benik



wênekêş



wênegir



ajelên kedî

## Çalakîya 1.

Hûn jî derheqê malbat, heval, lîstik û hobîyan de bi hevaleke/ hevalekî xwe re hevpeyvînekê çêbikin.

## Çalakîya 2.

Pirsên jêrîn li gor agahîyan bibersivînin.

1. Berî ku zarok ji bo seyranê bi rê bikevin mamosteya wan çi dike?

.....

2. Kî bi lîstina kişikê dizane?

.....

3. Fatma bi çi û çi mijûl dibe?

.....

4. Hobî çi ye?

.....

## Çalakîya 3.

Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Her kes ji heman hobîyê hez dike. ( )

2. Jîyana me bi hebûna hobîyan xweştir dibe. ( )

3. Kêfa Zînê ji wênesazîyê re tê. ( )

## Çalakîya 4.

Hobîyên ku hûn ji wan hez dikin û hez nakin wekî mînakên jêrîn binivîsin û ji pola xwe re bibêjin.

1. Ez ji xwendina pirtûkan hez dikim.

2. Ez ji girtina masîyan hez nakim.

3. ....


4. ....

## Çalakîya 5.

Hobîyên ku hûn ji wan hez dikin û hez nakin ji hevaleke/hevalekî xwe re bibêjin. Bi hevalên ku mîna we difikirin re hûn dikarin komên hobîyan jî ava bikin.



## ÇALAKÎYÊN HUNERÎ Û HOBÎ



Xwendina pirtûkan




Temaşekirina şanoyê



Guhdarîkirina muzîkê  
û lêxistina amûrên wê



Temaşekirina sînemayê



Xêzkirina wêneyan



Kişandina wêneyan



Xwedîkirina ajelan



Girtina masîyan



Lîstina bi kişîkê



Kampvedan



Çêkirina xwarinê



Orîgamî

## BEŞA 2. WERZIŞ



Hevpeyvîn

## WERZIŞ

**Mamoste:** Zarokino, dersa me werziş e. Werziş ji bo tenduristîya me pir baş e. Hûn ji kîjan cûreyên werzişê hez dikin, ka bibêjin?

**Mehmûd:** Ez ji basketbolê pir hez dikim. Ez bi hevalên xwe re li taxê bi basketbolê dilîzim.


**Gulsîma:** Ez jî ji kaşûnê pir hez dikim. Îsal em bi malbatî çûn Erzurumê û me li wir li ser berfê kaşûn kir.

**Sumeye:** Ez jî ji ajotina patenê pir hez dikim. Cihên ku wesayît di wan de naçin û nayên, ji bo ajotina patenê guncan in. Dema diçim ser patenê ez kaska xwe didim serê xwe.

**Hisên:** Ez ji lîstina futbolê pir hez dikim. Me di pola xwe de tîmek ava kiriye. Em bi tîmên wan polên din re bi futbolê dilîzin.

**Xezal:** Ez ji lîstina pînponê pir hez dikim. Li xwendingeha me di hola werzişê de maseya pînponê heye. Em bi hevalên xwe re li wir bi pînponê dilîzin.

**Rêzan:** Kêfa min jî ji ajotina bisiklêt re tê. Ez di rêyên bisiklêtan de bisiklêtê xwe diajom. Dema diçim ser bisiklêt ez kaska xwe didim serê xwe.





**Şanaz:** Li gor min voleybol jî lîstikeke pir xweş e. Em di demên xwe yên serbest de bi hevalên xwe re bi voleybolê dilîzin.

**Mûsa:** Ez jî ji avjenîyê hez dikim. Li taxa me hewzekî avjenîyê heye. Dema hewa xweş be ez li wir avjenîyê dikim.

**Evîn:** Meş jî werzişeke xweş e. Ji bo tenduristîya me pir baş e. Em bi malbatî her sibeh dimeşin.

### Nêçîra Peyvan



werziş



tax



kask

### Çalakîya 1.

Li gor hevpeyvîna jorîn gotin û navên li hemberê wan hevkek bikin.

1. Ez bi hevalên xwe re li taxê bi basketbolê dilîzim. ( ) **Mûsa**
2. Îsal em bi malbatî çûn Erzurumê û me li wir li ser berfê kaşûn kir. ( ) **Xezal**
3. Li xwendingeha me di hola werzişê de maseya pînponê heye. ( ) **Gulsîma**
4. Ez gelek caran di cihên ewle de patenê diajom. ( ) **Sumeye**
5. Ez jî ji avjenîyê hez dikim. Li taxa me hewzekî avjenîyê heye. ( ) **Mehmûd**

### Çalakîya 2.

Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneya "R" (rast) an "Ç" (çewt) daynin.

1. Cihên ku wesayît di wan de naçin û nayên, ji bo ajotina patenê guncan in. ( )
2. Werziş ji bo tenduristîya me pir baş e. ( )
3. Dema em çûn ser patenê divê em tişteki nedin serê xwe. ( )
4. Şanaz bi hevalên xwe re bi voleybolê dilîze. ( )
5. Dema em biçin ser bisiklê divê em kaska xwe bidin serê xwe. ( )

## CÛREYÊN WERZÎŞÊ



Basketbol



Futbol



Voleybol



Pînpon



Bisiklêt



Paten



Kaşûn



Avjenî



Meş



# BEŞA 3. BERNAMEYÊN TELEVÎZYONÊ

## BERNAMEYÊN TELEVÎZYONÊ


Televîzyon amûreke ragihandinê ye. Bernameyên televîzyonê cûrbicûr in. Gelek bûyerên ku li nêzîk û dûr diqewimin em ji bernameyên nûçeyan hîn dibin. Bi saya bernameyên geştûgerê em dikarin cihên gelek dûr nas bikin. Em bi temaşekirina bernameyên televîzyonê

carinan hînî tiştên teknolojîk jî dibin. Em agahîyan derbarê ajelên cûrbicûr de ji belgefilmên ajelan hîn dibin. Bi xêzefilman cîhana me ya xeyalî bi pêş dikeve. Bi bernameyên pêşbirkan, agahîyên me zêde dibin. Bi filmên sînemayê hem wextê me xweş derbas dibe û hem jî em jîyan û çand û dîroka gelên din ji wan filman hîn dibin. Bi bernameyên xwarinê em hînî çêkirina xwarinên herêm û welatan dibin. Carinan jî li gor terîfên van bernameyan li mala xwe em xwarinên nû çêdikin.

Digel van feydeyên televîzyonê divê em di temaşekirina televîzyonê de hay ji xwe hebin. Eger em hay ji xwe nemînin em dê gelek zerera jî jê bibînin. Wexta ku em demeke dirêj li ber televîzyonê xerc bikin hem wextê me diçe û hem jî çavên me û laşê me diwestin û zerere dibînin. Di nav bernameyên televîzyonê de hin bername ne li gor me zarokan in. Ji ber vê ye ku divê em li her bernameyê temaşe nekin û bernameyên li gor xwe hilbijêrin. Li ser ekrana televîzyonê hin nîşaneyên

hişyarîyê tên bikaranîn. Divê di temaşekirina bernameyan de em bala xwe bidin van nîşaneyan û li gor wan hereket bikin. Bi vî awayî em dikarin xwe ji van zerera biparêzin.

(Komîsyon)



## Çalakîya 1.

Pirsên jêrîn li gor agahîyên jorîn bibersivînin.

1. Feydeya bernameyên nûçeyan çi ye?  
.....
2. Em agahîyên derbarê ajelên cûrbicûr de ji kîjan bernameyan hîn dibin?  
.....
3. Em jîyan û çand û dîroka gelên din ji çi hîn dibin?  
.....
4. Feydeya bernameyên pêşbirkê çi ye?  
.....
5. Ji bo parastina ji zererên hin bernameyan, li ser ekrana televîzyonê çi tên bikaranîn?  
.....

## Çalakîya 2.

Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Bi saya bernameyên geştûgerê em dikarin cihên gelek dûr nas bikin. ( )
2. Bi filmên sînemayê wextê me xweş derbas nabe û em tiştêkî ji wan hîn nabin. ( )
3. Zererên televîzyonê hîç tune ne. ( )
4. Em bi bernameyên teknolojîk hînî çêkirina xwarinên herêm û welatan dibin. ( )
5. Di nav bernameyên televîzyonê de hin bername ne li gor me zarokan in. ( )

## Çalakîya 3.

Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

wextê / teknolojîk / ragihandinê / xêzefilman / terîfên

1. Em bi temaşekirina bernameyên televîzyonê carinan hînî tiştên ..... jî dibin.
2. Carinan jî li gor ..... van bernameyan li mala xwe em xwarinên nû çêdikin.
3. Televîzyon amûreke ..... ye.
4. Bi filmên sînemayê ..... me xweş derbas dibe.
5. Bi ..... cîhana me ya xeyalî bi pêş dikeve.

## Çalakîya 4.

Fîmekî ku we lê temaşe kiribe yan pirtûkeke ku we xwendibe ji hevaleke/hevalekî xwe re vebêjin.

## BEŞA 4. ZARGOTIN



## 1. Mamik

Bê dest û bê ling e, lê avjenîyê dike. Ev çi ye?

Qutîyeke min heye, hemû cîhan tê de ye. Ev çi ye?

Çûme serê banekî, min lêxist gopalekî, deng çû welatekî. Ev çi ye?

Tiştêkî min heye biqirik e, bêziman e; bidev e, bêdiran e. Dilorîne, ne  
însan e. Ev çi ye?

Sindoqa tijî têt, deng dide pêl bi pêl. Ev çi ye?

## 2. Lêhatinok

Heft ser re û heft ber re  
Û heft jî ji xwe û me re  
Hê nû here milek gîya bîne  
Ji ker û golikê xwe re

Kurik ê biçe mala xala(n)  
Ê barkê ji barê dara(n)  
Hat ku berîka vala  
Kada bigire ji jinxala(n)

Çîrokê çîrvanokê  
Rûnê rokê  
Berda cokê  
Co miçiqî  
Rûn biriqî  
Golika salê  
Li garanê  
Şengo mengo  
Mi çiqas xweş go


## 3. Zûgotinok

Şivên Sofî Sîso şeş in.

Heft elb mast heft elb şîr.

Heşt hirç her heşt hirç pişt pirç.

## 4. Pêkenok



## HEFT ROJ

Mamoste ji xwendekaran re got:

-Divê hûn nivîseke wisa binivîsin ku navên heft rojan tê de derbas bibin.

Xwendekarekî wisa nivîsî:

-Bavê min roja yekşemê çû nêçîrê. Masîyekî ewqas mezin girt û anî malê ku roja duşem, sêşem, çarşem, pêncşem, în û şemîyê me xwar, hêj jî neqedîyaye.

(Ji Abdulkadîr Bîngol)



# BEŞA 5. XAÇEPIRS



1




2



3




4



5



6



7



8



## BEŞA 6. NIRXANDIN



## A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Di televîzyonê de çi cûre bername derdikevin? Navê sê heban binivîsin.

.....

.....

.....

2. Feydeyên hobîyan çi ne? Binivîsin.

.....

.....

3. Navên sê cûreyên werzişê binivîsin.

.....

.....

.....

4. Navên sê cihên çalakîyên hunerî binivîsin.

.....

.....

.....

5. Zererên televîzyonê çi ne? Binivîsin.

.....

.....

## B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Divê em li her bernameyê temaşê bikin. ( )
2. Meş ji bo tenduristîyê ne baş e. ( )
3. Digel feydeyên televîzyonê hin zererên wê jî hene. ( )
4. Berî ku em herin seyraneke divê em agahîyan derbarê wê de hîn bibin. ( )

**C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.**

pînponê / avjenîyê / nûçeyan / guhdarî / zarokan

1. Ez li muzîkê ..... dikim.
2. Gelek bûyerên ku li nêzîk û dûr diqewimin em ji bernameyên ..... hîn dibin.
3. Li xwendingeha me di hola werzişê de maseya ..... heye.
4. Di nav bernameyên televîzyonê de hin bername ne li gor me ..... in.
5. Li taxa me hewzekî ..... heye.

**D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?**

1. Em bi saya kîjan bernameyan hînî çêkirina xwarinên herêm û welatan dibin?
 

|                        |                           |
|------------------------|---------------------------|
| a) bernameyên nûçeyan  | b) bernameyên teknolojîk  |
| c) bernameyên xwarinan | d) bernameyên belgefilman |
2. Kîjan hobîyek e?
 

|                      |                     |
|----------------------|---------------------|
| a) serdana mirovan   | b) çûna xwendingehê |
| c) lîstina bi kişîkê | d) xebata dersan    |
3. Tiştên ku mirov ji wan hez dikin û di demên xwe yên vala de pêk tînin re çî tê gotin?
 

|         |         |         |         |
|---------|---------|---------|---------|
| a) nûçe | b) hobî | c) wêne | d) ajal |
|---------|---------|---------|---------|
4. Ji bo ajotina patenê cihên guncan ku der in?
 

|                                             |                        |
|---------------------------------------------|------------------------|
| a) Cihên ku wesayît di wan de naçin û nayên | b) Zevîyên hişk û ziwa |
| c) Cihên ku mirov lê bêhnna xwe vedidin     | d) Nava jûra rûniştinê |

5. Em bi saya kîjan bernameyan dikarin cihên gelekî dûr jî nas bikin?

- a) bernameyên pêşbirkê                      b) bernameyên teknolojik  
c) bernameyên nûçeyan                      d) bernameyên geştûgerê

6. Em agahîyên derbarê ajelên cûrbicûr de ji kîjan bernameyan hîn dibin?

- a) bernameyên belgefilman                      b) bernameyên geştûgerê  
c) bernameyên teknolojik                      d) bernameyên nûçeyan

7. Kîjan feydeyeke xêzefilman e?

- a) Em derbarê her tiştî de agahdar dibin.                      b) Em bi temaşekirinê gelekî diwestin.  
c) Cîhana me ya xeyalî bi pêş dikeve.                      d) Hiç feydeyên wan tune ne.

8. Divê kîjan bê valahîya jêrîn?

Ez li muzîkê .....dikim.

- a) guhdarî                      b) xwedî                      c) temaşe                      d) çê

9. Divê kîjan bê valahîya jêrîn?

Ez patenê .....

- a) temaşe dikim.                      b) guhdarî dikim.                      c) diajom.                      d) li xwe dikim.

10. Ji hevyeckirinan kîjan çewt e?

a) kaşûn

b) meş

c) kişik

d) orîgamî





# F E R H E N G O K

## A

**acizkirin:** rahatsız etmek  
**adar:** mart  
**agahî:** bilgi  
**agir:** ateş  
**agirkuj:** itfaiye  
**ajel:** hayvan  
**ajotin:** sürmek  
**ajovan:** sürücü, şoför  
**alav:** araç gereç, edevat  
**alî:** taraf  
**alîkarî:** yardım  
**alîkarîya bilez:** ilkyardım  
**alûtirşk:** erik  
**amadehî:** hazırlık  
**amûr:** araç, alet  
**an...an...:** ya...ya...  
**ap:** amca  
**aşêf:** ayrık otu ayıklama  
**av:** su  
**avahî:** yapı, bina  
**ava sûsê:** meyan şerbeti  
**avakirin:** inşa etmek  
**avdan:** sulama  
**avêtin:** atmak, fırlatmak  
**avjenî:** yüzme  
**avmêwe:** meyvesuyu  
**awaz:** ses  
**axaftin:** konuşmak

## B

**ba:** rüzgar  
**bablîsok:** rüzgar hortumu  
**bahoz:** kasırga  
**bajar:** şehir  
**bakur:** kuzey  
**balgeh:** yastık  
**balkêş:** ilginç  
**ban:** dam  
**bapîr:** dede  
**bar:** yük

**baran:** yağmur  
**barîn:** yağma, yağış  
**bask:** kanat  
**baş:** iyi  
**başûr:** güney  
**bav:** baba  
**bavo:** babacığım  
**bazargeh:** alışveriş mekanı  
**bazdan:** koşma  
**bedew:** güzel  
**behîvterk:** badem çağlası  
**behskirin:** bahsetmek  
**bejindirêj:** uzun boylu  
**bejinkurt:** kısa boylu  
**belavbûn:** yayılma  
**belavkirin:** yaymak  
**belê:** evet  
**belgefilm:** belgesel  
**bendav:** baraj  
**benik:** ip  
**berbelav:** yaygın  
**berê:** eskiden  
**berêvar:** ikindi, akşamüstü  
**berf:** kar  
**berhem:** eser  
**berhevkirin:** toplamak  
**berî ...:** ...den önce  
**berîk:** cep  
**bername:** program  
**bersiv:** cevap  
**bersivandin:** cevaplamak  
**berû:** palamut meyvesi  
**berx:** kuzu  
**bes:** yeter  
**beş:** bölüm  
**betlane:** tatil  
**bexçeyê ajelan:** hayvanat bahçesi  
**bextewarî:** mutluluk  
**bextreş:** şanssız  
**beyanî baş:** günaydın

**beyar:** ekilmemiş tarla  
**beybûn:** papatya  
**beyt:** iki dizeli şiir kıtası  
**bêav:** susuz  
**bêdeng:** sessiz  
**bêhn:** koku  
**bêkêr:** işe yaramaz  
**bênder:** harman yeri  
**bêr:** kürek  
**bêreng:** renksiz  
**bi çi:** ne ile  
**bi giştî:** genellikle  
**bi hev re:** birlikte  
**bi malbatî:** ailece  
**bi qasî:** ...e kadar  
**bi saya:** sayesinde  
**bi taybetî:** özellikle  
**bi vî awayî:** böylece  
**bi xêra xwe:** lütfen, hayrına  
**bi ya min:** bana göre  
**biborin:** affedersiniz  
**bicihkirin:** yerleştirmek  
**biha:** 1. pahalı 2. fiyat  
**bihar:** bahar  
**bihîstin:** iştirmek  
**bihişt:** cennet  
**bijartin:** seçmek  
**bijîşk:** doktor  
**bikaranîn:** kullanmak  
**bikêrhatin:** yaramak  
**bila be:** tamam, olsun  
**bilez:** hızlı  
**bilind:** yüksek  
**bilûr:** kaval  
**bin:** alt  
**binavkirin:** adlandırmak  
**binavûdeng:** meşhur, ünlü  
**bira:** erkek kardeş  
**biraştin:** ızgarada pişirmek  
**birêketin:** yola çıkmak  
**birêkûpêk:** düzenli

**birin:** götürmek  
**birîn:** yara  
**birîndar:** yaralı  
**biriqîn:** parlama  
**birû:** kaş  
**biryar:** karar  
**bisk:** kakül  
**bitalûke:** tehlikeli  
**biwext:** zamanında, vakitli  
**bizin:** keçi  
**bîr:** 1.kuyu 2.hatır, hafıza  
**bîrkarî:** matematik  
**biyanî:** yabancı  
**bost:** karış, el ölçüsü  
**boz:** sarı, açık renkli  
**bûk:** gelin  
**bûn:** olmak  
**bûyer:** olay

## C

**camêr:** mert, delikanlı  
**car:** kere, defa  
**carinan:** bazen  
**cemidî:** soğuk  
**cenabê nebî:** hazreti peygamber  
**ceng:** kavga, savaş  
**cewahir:** mücevher  
**cêwî:** ikiz  
**cih:** yer  
**cişok:** çamaşır makinesi  
**cilûberg:** giysi, üstbaş  
**civîn:** toplanma  
**ciwan:** genç  
**cîhan:** dünya  
**cîrantî:** komşuluk  
**co:** su arkı  
**cotkar:** çiftçi  
**cotkirin:** çift sürmek  
**cuda:** farklı  
**cudahî:** farklılık  
**cûrbicûr:** türlü türlü  
**cûre:** tür, çeşit  
**cûtin:** çiğneme

## Ç

**çal:** derin çukur, kuyu  
**çalakî:** etkinlik  
**çand:** kültür  
**çandin:** ekip biçme  
**çapûtê pêçanê:** sargı bezi  
**çarşem:** çarşamba  
**çaryek:** çeyrek  
**çav:** göz  
**çavbirçîtî:** açgözlülük  
**çawa:** nasıl  
**çem:** akarsu  
**çend:** 1. kaç 2. birkaç  
**çep:** sol  
**çêj:** tat  
**çewt:** yanlış  
**çêkirin:** yapmak  
**çêlek:** inek  
**çêlî:** yavru  
**çêre:** otlak  
**çêrîn:** otlama  
**çêtir:** daha iyi  
**çi:** ne  
**çikîn:** suyun kesilmesi  
**çilo:** palamut, meşe dalı  
**çima:** neden  
**çinîn:** yolmak, toplamak  
**çiqas:** ne kadar  
**çirîya paşîn:** kasım  
**çirîya pêşîn:** ekim ayı  
**çikspî:** bembeyaz  
**çîrok:** 1. masal 2. hikaye  
**çîrokbêj:** masal anlatıcısı  
**çok:** diz  
**çopdank:** çöp kutusu  
**çûk:** kuş

## D

**da ku... :** ...mesi için  
**dagirtin:** doldurmak  
**daleqandin:** asmak, iliştmek  
**dan:** 1. verme 2. öğün

**danasîn:** tanıtma  
**danê xwarinê:** yemek öğünü  
**danîn:** bırakmak, koymak  
**dapîr:** nine  
**daristan:** orman  
**darqîtik:** çelik çomak  
**das:** orak  
**daşir:** tuvalet  
**dawîya hefteyê:** haftasonu  
**debar:** geçim  
**dehl:** sulak bahçe  
**delal:** güzel  
**dem:** zaman  
**dêm:** yanak  
**demsal:** mevsim  
**dendik:** çekirdek  
**deng:** ses  
**dengbêjî:** ozanlık  
**dep:** tahta  
**der:** yer  
**derbandin:** vurgulama  
**derbarê ... de:** ... hakkında  
**derbasbûn:** geçme  
**derdor:** etraf  
**derengmayîn:** geç kalma  
**derewîn:** yalancı  
**derheqê ... de:** ... hakkında  
**derî:** kapı  
**dermankirin:** ilaçlama, tedavi etmek  
**derve:** dışarı  
**derya:** deniz  
**desmal:** 1. mendil 2. yazma  
**destpêkirin:** başlamak  
**dest:** el  
**destnîşan:** imza  
**destsivikî:** el çabukluğu  
**destşok:** lavabo  
**destûbirak:** ahiret kardeşi  
**destûr:** izin  
**deşt:** ova  
**dev:** ağız

**deveh:** deve  
**dever:** yer  
**dew:** ayran  
**dewlemendî:** zenginlik  
**dê:** anne  
**dê û bav:** ebeveyn  
**dêr:** kilise  
**din:** diğer  
**di nav de:** içinde  
**dibistan:** okul  
**dido dido:** ikişer ikişer  
**dijmin:** düşman  
**dikandar:** bakkal  
**dildarî:** gönüllülük  
**dilêr:** cesur  
**dilgeş:** mutlu  
**dilsoz:** sadık  
**dilşadî:** mutluluk  
**dilzîzî:** duygusallık  
**dîmen:** manzara  
**dims:** pekmez  
**diran:** dış  
**dirêj:** uzun  
**divê:** ...malı / ...meli  
**dîsa:** yine  
**dîtin:** görmek  
**dohtin:** sağmak  
**domandin:** devam etmek  
**dor:** 1. sıra 2. çevre, civar  
**duqatî:** iki katlı  
**dubare:** tekrar  
**duh:** dün  
**dur:** inci  
**duşem:** pazartesi  
**duyem:** ikinci  
**dûr:** uzak  
**dûrik:** mani  
**dûrxistin:** uzaklaştırmak  
**dûv:** kuyruk

## E

**ecibandin:** beğenme  
**edeba axaftinê:** konuşma

adabı  
**elb:** ölçek çeşidi  
**em:** biz  
**endam:** üye  
**endamtî:** üyelik  
**endezyar:** mühendis  
**enî:** alın  
**enîşk:** dirsek  
**erd:** yer  
**erê:** evet  
**erk:** görev  
**erzan:** ucuz  
**ev:** bu  
**ew:** o, şu  
**ewlehî:** güvenlik  
**ewrî:** bulutlu  
**ez:** ben  
**ezbenî:** efendim

## Ê

**êdî:** artık, bundan sonra  
**êrîş:** saldırı  
**êş:** acı  
**êvar:** akşam  
**êzing:** odun

## F

**famkirin:** anlamak  
**fen:** hile  
**ferheng:** sözlük  
**ferhengok:** sözlükçe  
**fermî:** resmi  
**fermo:** buyurun  
**fêkîfiroş:** manav  
**fêrgeh:** derslik  
**fêrkin:** öğretmek  
**fıraçso:** bulaşık makinesi  
**firavîn:** öğle yemeği  
**fırçeya diranan:** diş fırçası  
**fireh:** geniş  
**firingî:** domates  
**firotin:** satma  
**fîkandin:** ıslık çalmak

## G

**ga:** öküz  
**garan:** sığır sürüsü  
**gava din:** az önce  
**gavan:** sığır çobanı  
**gaz:** tepcek  
**gazîkirin:** seslenme,  
 çağırma  
**gel:** halk  
**gelek spas:** çok teşekkürler  
**gelekî:** çokça  
**gelêrî:** folklorik  
**gelo:** acaba  
**genim:** buğday  
**gerestêrk:** gezegen  
**germ:** sıcak  
**gerok:** gezen  
**geşbûn:** gürleşme  
**geşt:** gezi  
**gewr:** 1. gri 2. açık renkli  
**gez:** ısırmak  
**gêre:** harman dövmek  
**gihanek:** bağlaç  
**gihaştin:** ulaşmak, varmak  
**gilover:** yuvarlak  
**gilyaz:** kiraz  
**gir:** iri  
**giranî:** ağırlık  
**giranîr:** daha ağır  
**girav:** ada  
**girêdan:** bağlama  
**girîngî:** önem  
**gîya:** ot  
**gog:** top, küre  
**golik:** buzağı  
**gopal:** baston  
**gor:** mezar  
**goşt:** et  
**gotinên pêşîyan:** atasözleri  
**guh:** kulak  
**guhan:** hayvan memesi  
**guhdan:** bakım, önemseme  
**guhdar:** dinleyici

**guhdarîkirin:** dinlemek  
**guherîn:** değişim  
**gulan:** mayıs  
**gulberoj:** ayçiçeği  
**guldank:** vazo, saksı  
**gulfiroş:** çiçekçi  
**gulî:** dal  
**guncan:** uygun  
**gund:** köy  
**gundî:** köylü  
**gur:** kurt  
**gûz:** ceviz

## H

**hatûcû:** trafik  
**havîn:** yaz mevsimi  
**heb:** tane  
**hebû tunebû:** bir varmış bir yokmuş  
**hebûn:** var olmak  
**heçî:** her kim ki, her ne ki  
**hêj:** henüz  
**hejîr:** incir  
**hejmar:** sayı  
**heke:** eğer  
**helbest:** şiir  
**heman:** aynı  
**hember:** karşı  
**hembêz:** kucak  
**hemû:** bütün, hepsi  
**henek:** şaka  
**hênik:** serin  
**her bijî:** aferin  
**her der:** her yer  
**her tim:** her zaman, hep  
**her û her:** daima  
**herdu:** ikisi  
**herêm:** yöre, bölge  
**herî kêr:** en az  
**herî zêde:** en çok  
**herwiha:** aynı zamanda  
**hesabdar:** hesabı kuvvetli  
**hesin:** demir

**hesp:** at  
**hest:** duygu  
**hestî:** kemik  
**hestiyar:** duygusal  
**heta hingî:** o zamana kadar  
**heta niha:** şimdiye kadar  
**heval:** arkadaş  
**hevaltî:** arkadaşlık  
**hevîr:** hamur  
**hevnasîn:** tanışma  
**hevok:** cümle  
**hevpeyvîn:** diyalog  
**hevrûkirin:** karşılaştırmak  
**hevyekkirin:** eşleştirmek  
**hew:** bundan sonra hiç  
**hewce:** lazım  
**hewldan:** çabalama  
**hewş:** avlu  
**hewzê avjenîyê:** yüzme havuzu  
**heya:** ...e kadar  
**heyv:** ay  
**hezar:** bin  
**hezîran:** haziran  
**hezkirin:** sevmek  
**hêdî:** yavaş  
**hêja:** değerli  
**hêkerûn:** omlet  
**hêl:** yön  
**hêsanî:** kolaylık  
**hêvî:** umut  
**hêz:** güç  
**hilbijartin:** seçmek  
**hilhatin:** güneşin, ayın yükselmesi  
**hin:** bazı  
**hine:** kına  
**hinekî:** biraz  
**hingiv:** bal  
**hingivî:** ela renkli  
**hirç:** ayı  
**hiş:** akıl, hafıza  
**hişk:** sert

**hişyarî:** uyarı  
**hînbûn:** öğrenme  
**hînker:** öğretici  
**hînkirin:** öğretmek  
**hundir:** içeri  
**huner:** sanat  
**hunerî:** sanatsal  
**hûn:** siz  
**hûr:** ufak  
**hûrgulî:** ayrıntı

## I

**incas:** erik

## Î

**îkon:** simge, sembol  
**îlon:** eylül  
**în:** cuma  
**îro:** bugün  
**îsal:** bu yıl  
**îşev:** bu gece

## J

**jehr:** zehir  
**jêbir:** silgi  
**jêbirin:** silmek  
**jêhatî:** çalışan  
**jêkirin:** kesmek  
**jêr:** aşağı  
**jêrîn:** aşağıdaki  
**ji ber ku:** nedeniyle  
**ji bilî...:** ...nin dışında  
**ji bo:** için  
**ji dêvla:** yerine  
**ji ku:** nereden  
**ji xeynî:** hariç  
**ji ...:** ...dan / ...den  
**jibîrkirin:** unutmak  
**jimartin:** saymak  
**jin:** kadın  
**jinxal:** dayının karısı  
**jixwe:** zaten  
**jî:** da / de, bile  
**jîjo:** kirpi



**jîn:** yaşam  
**jîngeh:** çevre  
**jîr:** akıllı, zeki  
**jîyan:** yaşam  
**jor:** yukarı  
**jorîn:** yukarıdaki  
**jûr:** oda

## K

**ka:** 1.saman 2. haydi  
**kad:** çörek  
**kadîn:** saman deposu  
**kakil:** ceviziçi, bademiçi  
vb.  
**kalê berfê:** kardanadam  
**kalik:** dede  
**kampvedan:** kamp kurmak  
**kanî:** kaynak suyu, çeşme  
**kanûna paşîn:** ocak ayı  
**kanûna pêşîn:** aralık ayı  
**kar:** iş  
**karik:** oğlak  
**karîn:** yapabilmek,  
edebilmek  
**karker:** işçi  
**karmend:** memur  
**kartol:** patates  
**kaxez:** kağıt  
**keç:** kız evlat  
**ked:** emek  
**kedî:** evcil  
**kek:** abi  
**kelandin:** haşlamak  
**kelecan:** heyecan  
**keleh:** kale  
**kelem:** lahana  
**kelûpel:** araç gereç  
**kendav:** körfez  
**kengî:** ne zaman  
**kenîn:** gülmek  
**ker:** eşek  
**kerem bike:** buyur  
**kes:** kişi, kimse

**kesk:** yeşil  
**kevir:** taş  
**kevnar:** eski  
**kew:** keklik  
**kezeb:** ciğer  
**kezîzer:** sarı örgülü  
**kêfxweşbûn:** memnun  
olmak

**kêlek:** yan  
**kêm:** eksik  
**kîjan:** hangi  
**kilam:** uzun hava  
**kin:** kısa  
**kirin:** yapmak, etmek  
**kirîn:** satın almak  
**kişandin:** çekmek  
**kişik:** satranç  
**kizwan:** menengiç  
**kî:** kim  
**kîso:** kaplumbağa  
**kolan:** cadde  
**kolandin:** kazmak  
**kom:** grup  
**kompîtur:** bilgisayar  
**kortik:** küçük çukur  
**kuçe:** sokak  
**kulîçe:** kuru pasta  
**kulîlk:** çiçek  
**kum:** takke  
**kuncî:** susam  
**kundir:** bal kabağı  
**kur:** erkek evlat  
**kurm:** kurt, solucan  
**kurt:** kısa  
**kuştin:** öldürmek  
**kutîlk:** içli köfte  
**kûr:** derin

## L

**laş:** beden  
**lat:** kaya, kayalık  
**law:** oğul  
**lawaz:** zayıf, sıska

**legleg:** leylek  
**lewra:** çünkü  
**lezkirin:** acele etmek  
**lê:** ama, fakat  
**lêdan:** vurma, çalma  
**lêhatinok:** oyundaki  
tekerleme  
**lênûsk:** defter  
**lêv:** dudak  
**lêvegerandin:** cevap  
vermek  
**li bal:** yanında  
**li ber:** önünde  
**li bin:** altında  
**li cem:** yanında  
**li gor:** ...e göre  
**li hemberê:** karşısında  
**li ku:** nerede  
**li pey:** arkasından, izinden  
**li rex:** tarafında  
**li ser:** üstünde  
**lib:** tane  
**lidarxistin:** düzenlemek  
**lihêf:** yorgan  
**ling:** ayak  
**livdar:** hareketli  
**lixwekirin:** giymek  
**lîstik:** oyun  
**lîstikvan:** oyuncu  
**lod:** yığın  
**loma:** o yüzden  
**lorik:** lor peyniri  
**lorîn:** ninni söyleme

## M

**maçîkirin:** öpmek  
**mak:** oyundaki ebe  
**mala te ava:** sağolasın  
**malbat:** aile  
**malik:** kutucuk  
**mamik:** bilmece  
**mamoste:** öğretmen  
**masî:** balık

**mast:** yoğurt  
**meh:** ay  
**mehîr:** ayran çorbası  
**mela:** imam  
**meş:** yürüme  
**met:** hala  
**meyandin:** mayalamak  
**mezin:** büyük  
**mêvan:** misafir  
**mêwefiroş:** manav  
**mihîrîcan:** festival, şölen  
**mijang:** kirpik  
**mijar:** konu  
**mijîn:** emme  
**mijûlbûn:** meşgul olmak  
**mil:** kol  
**mirov:** insan, kişi  
**miştaxe:** meyve kurutma yeri  
**mizgeft:** cami  
**mizgînî:** müjde  
**mî:** koyun  
**mîna:** gibi  
**morîk:** boncuk

## N

**na:** hayır, yok  
**name:** mektup  
**nan:** ekmek  
**nanpêj:** fırıncı  
**nasîn:** tanıma  
**nav:** isim  
**navber:** ara  
**navçe:** ilçe  
**navdar:** meşhur  
**naverok:** içerik, içindekiler  
**navnîşan:** adres  
**naxwe:** öyleyse  
**nerm:** yumuşak  
**nevî:** torun  
**nexşe:** harita  
**nexwende:** okur yazar olmayan

**nexweşî:** hastalık  
**nexweşxane:** hastane  
**neynik:** ayna  
**neynûkbir:** tırnak makası  
**nezanî:** bilmeme, cehalet  
**nêçîr:** av  
**nêrî:** erkek keçi, teke  
**nêrîn:** 1. bakma 2. görüş  
**nêz:** yakın  
**niha:** şimdi  
**nîrxandin:** değerlendirme  
**nivîn:** yatak  
**nivîs:** yazı  
**nivîsandin:** yazmak  
**nivîskarî:** yazarlık  
**nîne:** yoktur  
**nîşandan:** gösterme  
**nîşanên laş û rû:** jest ve mimik  
**nîşe:** yazılı not  
**nîv:** yarım  
**nîvişk:** tereyağı  
**nîvro:** öğle  
**nûçe:** haber

## O

**olan:** yankı

## P

**pace:** pencere  
**paldank:** koltuk, kanepa  
**pan:** yassı  
**panî:** topuk  
**paqij:** temiz  
**paqijkirin:** temizlemek  
**parastin:** korumak  
**parêv:** büryan kebabı  
**parvekirin:** paylaşmak  
**parza:** aşı  
**paşîv:** sahur  
**paşnav:** soyadı  
**patik:** ense  
**payîz:** sonbahar

**pekîn:** fırlamak  
**pel:** yaprak  
**pelên pêçayî:** sarma yemeği  
**penc:** avuç, el  
**penîrê bisîrik:** otlu peynir  
**perwerdehî:** eğitim  
**pesn:** övgü  
**petîx:** kavun  
**pevdeng:** çok harfli ses (kurmanca için “xw” sesi)  
**peya:** yaya  
**peyabor:** yaya geçidi  
**peydakirin:** temin etmek  
**peyker:** heykel  
**peyv:** kelime  
**peywir:** görev  
**pê:** ayak  
**pêçan:** sarmak  
**pêçî:** parmak  
**pêdivî:** ihtiyaç  
**pêhisîn:** farkına varma  
**pêjgeh:** mutfak  
**pêjgir:** havlu  
**pêkenok:** fıkra  
**pêkhatin:** oluşma  
**pêl:** dalga  
**pêlav:** ayakkabı  
**pêlistok:** oyuncak  
**pêncem:** beşinci  
**pêncok:** beştaş  
**pêncşem:** perşembe  
**pênûsdank:** kalemlik  
**pênûstraş:** kalemtraş  
**pêşbazî:** yarışma  
**pêşbirk:** yarışma  
**pêşî:** önce  
**pêşkêşkirin:** sunmak  
**pêşketî:** gelişmiş  
**pêşketin:** gelişmek  
**pêşwazîkirin:** karşılamak  
**pêwîst:** gerekli  
**pêxember:** peygamber

**pêxwarin:** kahvaltılık  
**piçûk:** küçük  
**piling:** kaplan  
**pir:** 1. çok 2. köprü  
**piranî:** çoğunluk  
**pirpel:** çok yapraklı  
**pirs:** soru  
**pirteqalî:** turuncu  
**pirtûkdank:** kitaplık  
**pirtûkfiroş:** kitapçı  
**pirtûkxane:** kütüphane  
**pişîk:** kedi  
**pişkavêtin:** kura çekmek  
**piştgir:** dayanak, destek  
**piştguhkirin:** kulak ardı etmek  
**piştî ku:** ...den sonra  
**piştire:** sonra  
**pixêrî:** şömine  
**pîr:** yaşlı  
**pîra holikê:** oyundaki ebe  
**pîrozkirin:** kutlamak  
**pîşe:** meslek  
**pol:** sınıf  
**por:** saç  
**potik:** bez  
**poz:** burun

## Q

**qal:** söz, konuşma  
**qalik:** kabuk  
**qam:** 1. boy 2. oyundaki sayı  
**qazî:** kadı, hakim  
**qe nebe:** hiç olmazsa  
**qedandin:** bitirmek  
**qehweyî:** kahverengi  
**qelandin:** kızartmak  
**qelem:** kalem  
**qelew:** şişman  
**qenc:** iyi  
**qerebalix:** kalabalık  
**qerisandin:** dondurmak

**qesr:** saray  
**qeşîr:** dondurma  
**qet:** hiç  
**qewet be:** kolay gelsin  
**qewimîn:** olma, meydana gelme  
**qewîfî:** tembih, nasihat  
**qey:** 1. acaba 2. sanki  
**qijik:** karga  
**qîmetgirtin:** değer bilmek  
**qirêj:** kir  
**qirik:** boğaz  
**qube:** kubbe, türbe  
**qul:** delik  
**quling:** turna  
**qurm:** kütük, kök

## R

**rabûn:** kalkmak  
**ragihandin:** iletişim  
**rakirin:** kaldırmak  
**raman:** fikir  
**ran:** uyluk, but  
**rasterast:** doğrudan  
**rastkêş:** cetvel  
**rawestgeh:** durak  
**rawestin:** durmak  
**razan:** uyumak  
**ref:** 1. raf 2. kuş sürüsü  
**reqsên herêmî:** yöresel halkoyunu  
**reş:** siyah  
**reşandin:** saçmak, serpmek  
**revandin:** kaçırma  
**revîn:** kaçmak  
**rewş:** 1. durum 2. parıltı  
**rez:** üzüm bağı  
**rê:** yol  
**rêvebir:** yönetici  
**rêwî:** yolcu  
**rêz:** sıra  
**rêzik:** kural  
**rihan:** reyhan

**rindik:** güzel, hoş  
**riz:** pirinç  
**rizgarkirin:** kurtarmak  
**roja te bi xêr:** hayırlı günler  
**rojane:** günlük  
**rojawa:** batı  
**rojbûn:** doğumgünü  
**rojhilat:** doğu  
**ronîkirin:** aydınlatma  
**rovî:** tilki  
**rû:** yüz  
**rûken:** güleç, güler yüzlü  
**rûmetdayîn:** değer vermek  
**rûn:** yağ  
**rûnişte:** oturak, sandalye  
**rûniştin:** oturmak

## S

**sako:** mont, kaban  
**sal:** yıl  
**salname:** takvim  
**sar:** soğuk  
**sarinc:** buzdolabı  
**savar:** bulgur  
**sayî:** açık hava  
**sazî:** kurum, kuruluş  
**sazkirin:** kurmak  
**sehkirin:** iştirmek  
**seqem:** ayaz  
**ser:** baş  
**ser çavan:** başüstüne, hayhay  
**serdan:** ziyaret  
**sereke:** ana, temel, esas olan, başlıca  
**sererastkirin:** düzeltmek  
**sergirtin:** örtmek, kapamak  
**sergo:** çöplük  
**serîlêdan:** başvurmak  
**serjimar:** nüfus  
**serkeftî:** başarılı  
**serkeftin:** başarmak

**serma:** soğuk  
**sernav:** başlık  
**serşok:** banyo  
**seyda:** imam  
**seyran:** piknik  
**sênî:** tepsi  
**sêpê:** sehpa  
**sêr:** sihir  
**sêşem:** salı  
**sêv:** elma  
**sibat:** şubat  
**sir:** 1. sır 2. soğuk rüzgar  
**sirûd:** marş  
**sirûşt:** doğa, tabiat  
**siwarbûn:** binmek  
**siwarkirin:** bindirmek  
**sî:** gölge  
**sîng:** göğüs  
**sîwan:** şemsiye  
**sor:** kırmızı  
**sosin:** süsen çiçeği  
**spartek:** ödev  
**spaskirin:** teşekkür etmek  
**spî:** beyaz  
**stêrk:** yıldız  
**stran:** şarkı, türkü  
**stûr:** kalın

## Ş

**şabûn:** eğlenmek  
**şagirt:** öğrenci  
**şahî:** eğlence  
**şandin:** göndermek  
**şaneşîn:** balkon  
**şano:** tiyatro  
**şar:** şehir  
**şaşî:** yanlışlık  
**şaşik:** sarık  
**şaşmayîn:** şaşırmak  
**şayîk:** pürüzsüz  
**şehkirin:** taramak  
**şemalk:** mum  
**şemî:** cumartesi

**şer:** savaş, kavga  
**şermkirin:** utanmak  
**şev:** gece  
**şevbihêrk:** akşam ziyartei  
**şeveq:** sabahın ilk anları  
**şewat:** yangın  
**şewk:** olta  
**şewqe:** şapka  
**şikestin:** kırılmak  
**şilî:** yağış  
**şimik:** terlik  
**şivan:** çoban  
**şixul:** çalışma  
**şîn:** mavi  
**şînayî:** yeşillik, bitki  
**şîr:** süt  
**şîv:** akşam yemeği  
**şopgerî:** izcilik  
**şûr:** kılıç  
**şûştin:** yıkama

## T

**tar:** ahşap çember  
**taştê:** kahvaltı  
**tav:** güneş  
**tax:** mahalle  
**taybetî:** özellik  
**tebax:** ağustos  
**tahl:** kekremsi acı (badem acısı gibi)  
**têkilî:** ilişki  
**temaşekirin:** izlemek  
**temaşevan:** izleyici  
**temen:** yaş, ömür  
**tenduristî:** sağlık  
**teng:** dar  
**tengezarbûn:** rahatsız olmak  
**tenik:** ince  
**tepê:** elim sende oyunu  
**tev:** hepsi, tamamı  
**tevger:** hareket  
**tevlîbûn:** katılmak

**tevlîhev:** karışık  
**text:** tahta  
**teyrok:** dolu yağışı  
**teytok:** sek sek oyunu  
**têr:** 1.tok 2.yeterince  
**têra xwe:** doyasıya  
**tilî:** parmak  
**tim:** hep, daima  
**tirî:** üzüm  
**tirkî:** Türkçe  
**tirş:** ekşi  
**tirşik:** türlü yemeği  
**tişt:** eşya  
**tîm:** takım  
**tîpên bêdeng:** sessiz harfler  
**tîpên dengdêr:** sesli harfler  
**tîpên girdek:** büyük harfler  
**tîpên hûrdek:** küçük harfler  
**tîpên nêzdeng:** sesleri  
     yakın olan harfler  
**tîr:** 1.ok 2.sıvıdaki  
     yoğunluk  
**tîrmeh:** temmuz  
**to:** yoğurt ve süt kaymağı  
**tov:** tohum  
**tovavêtin:** tohum atmak  
**tu bi xêr hatî:** hoşgeldin  
**tune ye:** yoktur  
**tû:** dut  
**tûjkirin:** sivriltilmek  
**tûreşk:** böğürtlen

## Û

**û:** ve, ile

## V

**valahî:** boşluk  
**vebijêrk:** seçenek, şık  
**vebûn:** açılmak  
**veger:** geri dönüş  
**vegotin:** anlatmak  
**veguhestin:** nakletmek  
**vejîn:** dirilmek



**vekirin:** açmak  
**vemirandin:** söndürmek  
**veşartin:** saklamak  
**veşartok:** saklambaç  
**vexurek:** içecek  
**vexwarin:** içmek  
**vê carê:** bu sefer  
**vêca:** artık, bundan sonra  
**vikûvala:** bomboş  
**vir:** 1.bura 2.yalan

## W

**wanî:** öyle  
**wate:** anlam  
**wekî:** gibi  
**wekî din:** ayrıca  
**welat:** vatan, yurt  
**werziş:** spor  
**wesayît:** taşıt  
**weşandin:** 1.dökmek  
2.yayımlamak  
**wêne:** 1.resim 2.fotoğraf  
**wênegir:** fotoğraf makinesi  
**wênesazî:** ressamlık  
**wiha:** böyle  
**wilo:** öyle  
**winda:** kayıp  
**wir:** ora  
**visa:** öyle

## X

**xaçepirs:** bulmaca  
**xal:** 1.dayı 2.nokta  
**xaltî:** teyze  
**xar:** misket

**xebatkar:** çalışan  
**xeberoşk:** kısa masal  
**xebitîn:** çalışmak  
**xecxecok:** gelincik çiçeği  
**xemgîn:** üzgün  
**xemilandin:** süslemek  
**xeml:** süs  
**xew:** uyku  
**xewar:** uykucu  
**xewn:** rüya  
**xeyal:** hayal  
**xêzkirin:** çizmek  
**xistin:** koymak, sokmak  
**xizanî:** fakirlik  
**xizm:** akraba  
**xort:** delikanlı  
**xurandin:** kaşımak  
**xurek:** yiyecek  
**xuyakirin:** görünmek  
**xwarin:** yemek  
**xwaringeh:** lokanta  
**xwe:** kendi  
**xwê:** tuz  
**xwendekar:** öğrenci  
**xwendin:** okumak  
**xwendingeha navîn:**  
ortaokul  
**xwestin:** istemek  
**xweş:** güzel, hoş  
**xweşav:** hoşaf  
**xweştam:** tadı güzel  
**xweştir:** daha güzel  
**xwezî:** keşke  
**xwişk:** kızkardeş  
**xwînşîrîn:** sıcakkanlı

## Y

**yaranî:** dostluk  
**yarî:** şaka  
**yek bi yek:** teker teker  
**yekem:** birinci  
**yekşem:** pazar günü

## Z

**zana:** bilgili, bilgin  
**zanîn:** bilmek  
**zanist:** bilim  
**zargotin:** halk edebiyatı  
**zarok:** çocuk  
**zava:** damat  
**zebeş:** karpuz  
**zelal:** berrak, duru  
**zend:** el bileği  
**zengil:** zil  
**zer:** sarı  
**zerdalî:** kayısı  
**zergul:** sarı gül  
**zevî:** tarla  
**zêr:** altın  
**zêrîn:** altından olan, altın  
renkli  
**zik:** karın  
**zılam:** adam  
**zimanê zikmakî:** anadil  
**zirîn:** anırma  
**zivistan:** kış  
**ziwa:** kuru  
**zîrek:** zeki, çalışan  
**zozan:** yayla  
**zûbizû:** çabucak  
**zûgotinok:** tekerleme

# BERSIVÊN XAÇEPIRSAN

## UNÎTEYA 1.

1.Xwendîngeh 2.Name 3.Hejmar 4.Tîp  
5.Şaşîk 6.Kundîr 7.Ker 8.Rovî 9.Şêr 10.Karik

## UNÎTEYA 2.

1.Bejîndirêj 2.Derman 3.Karker 4.Bejînkurt 5.Bijîşk 6.Bizin  
7.Avahî 8.Hevaltî 9.Malbat 10. Xanî

## UNÎTEYA 3.

1.Perwerdehî 2.Kişîk 3.Beybûn 4.Mizgeft  
5.Berxîk 6.Nexweşxane 7.Kolan 8.Xwendîngeh

## UNÎTEYA 4.

1.Parza 2.Bijîşk 3.Birêkûpêk 4.Şeh 5.Alîkarîya bilez 6.Pêlav 7.Paqijî 8.Neynûkbir

## UNÎTEYA 5.

1.Xurek 2.Pêxwarin 3.Spî 4.Şopgerî 5.Serûpê 6.Xwaringeh 7.Vexurek 8.Stêrk

## UNÎTEYA 6.

1.Petîx 2.Behîvterk 3.Kaşûn 4.Baran 5.Ba 6.Berfemêr 7.Hejîr 8.Teyrok

## UNÎTEYA 7.

1.Peyabor 2.Pir 3.Nexşe 4.Mizgeft 5.Peyker 6.Ajovan 7.Girav 8.Keleh

## UNÎTEYA 8.

1.Fêrgeh 2.Xêzik 3.Genim 4.Lod 5.Cotkirin  
6.Pirtûkxane 7.Lat 8.Kîso 9.Hesin 10.Kompîtur

## UNÎTEYA 9.

1.Pêjgeh 2.Werziş 3.Kaxez 4.Ajel 5.Mast 6.Destnîşan 7.Wênegir 8.Xêzefilm

# BERSIVÊN MAMIKAN

## UNÎTEYA 1.

1.Mamoste 2.Tîpa “m”yê 3.Ziman

## UNÎTEYA 3.

1.Çente 2.Pirtûk 3.Nivîn

## UNÎTEYA 4.

1.Dev û Diran 2.Guh 3.Çav

## UNÎTEYA 5.

1.Hêk 2.Pîvaz 3.Bacana reş 4.Hejîr 5.Hinar

## UNÎTEYA 6.

1.Ba 2.Berf 3.Sal 4.Heft rojên hefteyê

## UNÎTEYA 7.

1.Erebe 2.Trên 3.Nexşe 4.Rê

## UNÎTEYA 8.

1.Kevjal 2.Gezik/melkes 3.Stêrk 4.Şevşevok 5.Kîso

## UNÎTEYA 9.

1.Masî 2.Televîzyon 3.Dahol 4.Bilûr 5.Radyo

# ÇAVKANÎ

Bîngol, Abdulkadîr, De Were Nekene!, Weşanxane J&J, Îstanbul, 2013.

Gazî, Mustafa, Gurzek ji Zargotina Zarokan, Çapxaneyê Wezareta Perwerdeyê, Hewlêr, 2006.

Subaşı, Kenan, Ji Bo Zarokan Di Fêrkirina Kurdî De Rola Mamikan, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.

<https://play.google.com/store/apps/details?id=com.osmanaslanoglu.obijew> (02/08/2017)

## ÇAVKANÎYA WÊNE û FOTOGRAFAN

Hemû wêne û fotografên vê berhemê ji aliyê Şemal Medyayê ve hatine temînkirin.